# Omitê Mistefê

# NIFIRA SEDSALÊ

## -hemû kurteçîrok-

**Kêzika Gûgerîn**

-Were keko em herin, çi ye tu kêzikeke gûgerîn dişopînî? Ihtimal e ku gur têkeve nava pêz an jî dizek wan bide pêşiya xwe û bibe. Jixwe di nava heys-beysa vî şerî de kes nizane kî kurê kê ye.

-Here, berê pêz bi ser aliyê me de bişkîne, bila li dora me biçêrin û em vê sosretê temaşe bikin.

Dûajoyî bêyî dilê xwe gurra serşivên kir, çû û pez zivirand, hate cem kekê xwe.

-Binêre, vê kêzika gûgerîn ji wê silepora rêxê ya han parçeyek rêx hilda û ber bi vê morîstanê anî. Li ser xweliya sax û taze ya li dora moristanê bir-anî, çiqasî mezin kir. Havînê wê topê rêx e; lê xweliyê eyba rêxê veşartiye. Mixabin cendekên gelek moriyan jî di nava vê topikê de bûne kereste.

-Kekê, di vir de tiştê sosret çi ye min fehm nekir. Jixwe navê wê jî wisa ye ku gû digerîne.

-Kek qurbana mêjiyê te be, hişê te bi kar û barê dewletê nabire. Te hê dibistan neqedandiye û leşkerî jî nekiriye. Binêre, kuna moriyan bi rastî jî dewleta moriyan e; lê ev kêzika qerase mineta xwe ji wan nagire. Wexta ku topa xwe li ser sînorên dewleta wan digerîne gelek ziyanê digihîne moriyên hûrik, ango zar û zêç di nava rêxa şil de gut dibin û di bin tetqalê heriyê de dimînin. Binêre ew moriyên ku ji topê filitîne çi zû dikevin hundir û agehiyê didine hundir. Niha di hundir de, yan hilbijartineke nû heye yan jî serokê hilbijartî yê berê dê mudaxeleyî rewşê bike.

-Wisan e şer dê dest pê bike!

-Na, beriya şer dê dîplomasiyeke xurt dest pê bike, heta ku hêza xetereyê bê hesabkirin. Meseleyên şer ji bo dewletê pir girîng in. Ew jiyan-mirinê, hebûn-nebûnê diyar dikin; loma hîç serokek nikare vê yekê îhmal bike.

-Gelo niha çi planê datînin? Dibe ku serokê wan gazî melayan bike û bibêje duayan ji Xwedê bikin ku vê belayê ji ser serê me rake.

-Biracan, morî xwedênas in; lê di xebata xwe de sosyalîst û komunîst in, bi komkî biryarê didin. Gava serok ji bo lêgerîneke kûr û berxwedaneke kêmziyan biryarê bide û dereng mudaxeleyî rewşê bike komeke şoreşger dikeve dewrê, ew bêyî serok jî dikarin peywira xwe bînin cih; lê divê mesrefa giyanî ya vê komê ji ya serokî erzantir be ku hêjayî pesnê bibin û alîkariyeke pêwist ji hevalan wergirin.

Dûajo ji van şîroveyên felsefî tiştek fêm nekir, bala xwe rind dayê ku bi rastî jî tevgereke sosret dest pê kiriye, hewldan û destpêşxêrî hene. Serşivanî wiha berdewam kir:

-Binêre, pêşiyê alarm dane hundirê welêt û serok pê hesandin. Serokî nûnerên xwe yên pispor şandin û hêza dujminî pîva. Êdî baweriya wan heye ku neyarekî xedar rûmeta welatê wan dişkêne; lê hewa alîkariya wan nake. Baran bibariya kêzikê nikaribû di nava heriyê de vê forsa xwe bike; dê zû biwestiya û li qulekê bigeriya ku serê bikê. Gava serê xwe şîşê kuna moriyan bikira, dê bi komasî êriş bibirina ser sêrî, heta ku qut bikirana yan jî biêşandana û bi paş ve bidana vekişandinê.

-Hewa di berjewendiya wan de nebe, wisan e baweriya wan jî pere nake.

-Na, ew dê dev ji têkoşînê bernedin. Ew dê li eraziyê dora morîstanê binêrin û çend ceribandinên bêfayde bikin. Di van ceribandinan de jî wê tûşî çend ziyanan werin.

-Ango nikarin heyfa bavo bistînin û namûsa dayîkê jî serbarê ser e.

-Ji bo şerekî serkeftî pênc hêman lazim in: bawerî, hewa, erazî, fermandar û rêxistin. Îcar du hêmanên şer ne di berjewendiya wan de ne; lê heke ew her siyên din baş bi kar bînin dê bi ser kevin. Zû here, wan bizinên ku ketine devê newalê derxe û lez were. Bila hûrgiliyên vê bûyera sosret ji ber çavên min winda nebin.

Piştî ku birayê biçûk ji cem kekê xwe çû û nêzikî bizinan bû tiştek hate bîrê. Ji xwe re got:

“Ez dikarim van bizinan bi hêsanî ji newalê derxim û bînim vê rastahiyê; ji ber ku hêza min a li ser erdê ji ya wan xurtir e. Lê her çiqas hebek be jî, hêza wê kêzikê çend qatî hêza reqîbê wê ye. Ji ber ku amûreke wê ya qerase heye û di her gindirandinekê de çend liv moriyên biçûk dipirçiqîne; tetqalek xwelî li ser direşîne û şopa cinayetên xwe vedişêre. Bi rastî komkujiyeke bê şûn û berate pêk tîne.”

Dema ku hate ba kekê xwe ev nêrîna xwe bi wî re jî pareve kir. Kekî serê birê mizda û got:

-A wisa, êdî te jî mijar fêm kiriye. Me qala pênc hêmanên şerekî serkeftî kiribû ne wisa? Bawerî ji bo fermandar û fermangir ne wekî hev e. Bawerî ji bo fermangiran ew e ku bi fermandêr re yekgirtî bin, ji bo wî bimirin, bijîn û ji xetereyê netirsin. Lê ji bo fermandaran bawerî zanyariya rast û tevgera durist e.

-Îcar di vir de mijareke tarî dimîne ku duristiya di navbera wan de çawa pêk tê? Rast e, gava tehlûke hatin zemanê fermangiran tuneye ku planan amade bikin û zemanê fermandêr jî tuneye ku duristiya fermanberên xwe azmûn bike.

-Tu mafdar î, divê fermandar bi pêşbîniya xwe amadehiya şerên derwext, pêşwext û awarte bike. Rastiyê bixwazî divê civak ji bo heyamên şer û aştiyê amadebaş be. Îcar mebest ji hewayê rewşa ronahî, serma, germahî û demsalê ye. Herwiha mebest ji eraziyê: mesafe, topografî û guhêrbarî ye. Lê divê ji bîr nekî ku şarezayî, bawerî, mirovdostî, wêrekî û cidiyeta fermandêr qedera vê cengê tayîn dikin.

-Wisan e rêxistin ewqasî ne girîng e; ji ber ku xislet û merîfeta fermandêr encamê diyar dikin. Fermandar hêjayî pîşeyê xwe be serkeftin heye; lê heke ne hêja be malwêranî çarenûsa teqez e.

-Nîvê gotinê rast e, lê nîvê din kêm e. Binêre, mebest ji rêxistinê avahiya hêzê û dabeşkirina peywiran e. Helbet peydakirin derçûnan û bikaranîna derhatan jî beşeke pîşeya fermandêr e.

Li vê derê peyva “fermandar” bi esmanê devê wî ve nûsiya û êdî zimanê wî negeriya. Mirovekî bi çekên leşkerî û tifinga di dêst de daxistî li ser wan re sekinîbû; carekê li wan carekê jî li morîstan û kêzikê dinihêrî.

-Kuro hûn li vir çi dinêrin, we ziravê me qetand. Heta ku ez gihiştim we min heft kiras qetandin. Min got qey we bombe-teqemeniyên neteqiyayî dîtine û pê dilizîn. Ez mîna dizan hatim û li ser we re sekinîm ku rastiya mijarê hîn bibim. Rabin, ez li ber pezê we me; li ser vî kêrtî kozika şervanan tê avakirin; fermandar bi dûrbînê li we temaşe kiriye. Bi lez herin û bersiva wî bidin. Ez ê hêdî hêdî pezê we ber bi biryargehê bînim.

Şerê li dijî DAIŞê, bi rastî li dijî dagirkerên xwecihî û biyanî teze dest pê kiribû; hêzeke kurdî ya hevbeş tunebû û berpirsiyarên kurd di nava lêgerînekê de bûn ku hebûna xwe biparêzin. Lewre li cihên girîng û stratejîk kozik, çeper û eniyên parastinê ava dikirin. Fermandêr, lingek li ser kêvir, bi dûrbîna xwe hawirdor dipa û carinan jî sexbêriya xebatê dikir. Dema ku her du şivan hatine hindê, lingê xwe ji ser kêvir danî û ew her du wekî tawanbaran li serê dane rûniştandin.

Şivanan serpêhatiya xwe bi kurtî jê re vegotin û fermandar beşeve hat. Paşê gazî hevalên xwe kir ku navberekê bidin xebatê, li van şivanan guhdariyê bikin û pirsan ji wan bikin. Şervan hatin, çarmêrkî rûniştin û di xeleqa xwe ya perwerdehiyê de rêz bûn. Bi işareta fermandêr re serşivên ango birayê mezin mijar dubare kir û carinan birayê biçûk, ango duajoyî kêmasiyên wî temam kirin.

Heta ku şervanê li ber pêz gihişte şûna rûniştinê êdî dawî li axaftinê hatibû; her şivanek sêvek di dêst de milçemilça devê wan bû. Fermandêr bi xemgînî gote fermanberê derengmayî:

-Te konferanseke gelekî watedar ji dest da; lê em ê te xelat bikin, celat nekin. Ji xwe re sêveke gumrah ji sindoqê bibijêre, vî keriyê pêz ji qadê dûr bixîne.

Paşê berê xwe da şivanan û got:

-We çi wate da vî şerî? Ka şîrove û pêşbîniyên we çi ne?

Birayê biçûk dengê xwe nekir û birayê mezin giran giran wiha bersiv da:

-Vî şerî û tedbîrên we yên ewlehiyê nehişt ku em fîlmê bi giştî temaşe bikin. Xwedê mala te camêrî ava bike, me tevahiya bûyerê bişopanda me yê bikaribûya vî şerê neheq jî şîrove bikira. Me mîna we akademî nexwendiye, em bûyerên xwezayê dixwînin û dersa xwe digirin.

Fermandarî ji nişkê ve pirsî:

-De rabin, bila heval we bibihurîne; lê divê hûn serpêhatî û şîroveya xwe ji wî re jî kurteve bikin. Axaftin sêbare dibe, lê hûn jî fermandarên siberojê ne; divê hûn ji carecarkirinê tengav nebin. De oxir be ji we re, li dora gund bin û dûrî qada şer bisekinin.

Her du aliyan jî bi rûyekî pirçî, bêmehde, dilmayî xatirê xwe ji hev xwestin. Her çiqas her du jî mafdar bûn, lê di dawiyê de mafê perwerdehiya xwezayî hatibû binpêkirin û çareseriya wê hema hema tunebû.

***

Beriya ku tarîban dakeve erdê karên xebat, xwarin, vexwarin û cixarekişandinê hatin qedandin. Fermandarî serpêhatiya kêzik, morîstan û şîroveya şivanan anî bîra fermanberan û wiha berdewamî da axaftina xwe:

-Gelî hevalan, DAIŞ ew topa li ber kêzikê ye, dijminên gelê me ew kêzika gûgerîn e û gelê me yê bindest jî koma moriyan e. Cîhan jî mîna van her du şivanan li ser şerê moriyan û wê kêzikê şîroveyan dike. Wekî ku şivanan destwerdan li rewşê nekir û bi zewqeke nedîtî ew şer temaşe kir, cîhan jî mudaxeleyî vî dijminê me yê xedar nake û naxwaze rewşê zelal bike. We jî dît ku gelek rêbazên leşkerî êdî ji aliyê şivanên me ve jî tê zanîn. Divê fermandarekî ev pênc faktor bihîstibin. Hînkirin û sepandina van hêmanan erka fermandêr e. Loma di dema plandanîn û diyarkirina rewşê de divê ev faktor bêne berawirdkirin.

Fermandarî piştî vê axaftinê çavên xwe li hevalên xwe gerandin û ji yekî pirsî:

-Ka ji min re bibêje: Kîjan fermandar xwedanbawerî ye? Kîjan xwedankapasîte ye? Kîjan ji rewşa xwezayê îstîfade dike? Kîjan rêxistin û dîsîplînê saz dike û kîjan dirûxîne? Asta çekdariyê ya kîjan artêşê baştir e? Di her du artêşan de asta perwerdehiyê ya kîjan yekîneyê baştir e? Kîjan alî di nava xwe de ahengdar û rêxistî ye? Di sazûmana artêşê de pergala xelat û celatê ji bo serketin û binketinan heye yan na?

Her endamekî yekîneyê li gorî zanyariyên xwe bersivek pêşkêş kir û fermandêr bersivên hatî wiha nirxandin:

-Bersivên we ji bo serfirazî û şkestinê agehdariyê didine min. Wisan e, heke fermanberek guh bide plana min serkeftin teqez e; divê ew li ser kar be. Heke fermanberek guh nede plana min wê hingê jî şkestin teqez e; divê ez wî ji kar biavêjim. Hevalno! Şerkarî dek û dolab e. Kapasîteya me hebe, tuneyî nîşan bidin. Derhata me hebe, tuneyî nîşan bidin.

Fermandar bi peroşiyeke leşkerî sermest bûbû, her carê tiliya xwe nişanî yekî dikir û şîretek lê dikir:

-Li nêzîk î, xwe li dûrê nîşan bide. Tu li dûrê yî, xwe li nêzîkê nîşan bide. Dijmin bi hewes e, wî kaşî nava heriyê bike. Gava ew ne birêkûpêk be, erîşî wî bike. Ew stabîl be, xwe ji bo wî amade bike. Ew hêzdar e, wisan e jê dûr bisekine. Ew hêrsbûyî ye, wî aciz bike. Ew lawaz e, biryarên xwe li ser ferz bike. Ew bêhna xwe dide, wî bêhuzûr bike. Ew xweragirtî ye, wî ji hev belav bike. Ji aliyê birîndar û ne li hêviyê de êrîşî wî bike. Şûna ku ew pê ve arxayîn e û nakeve şikê, a di wê tûşê de derkeve holê. Leşkerî raz e, raznivîs e, razaxaftin e, raztevger e. Raz, li hemberî dijmin e; lê em ji hev re û di nava xwe de mîna şîr spî û mîna avê zelal in.

***

Êdî tarîbanê erd-esman hingaftibû û ewqas axaftin bes bû; lewre fermandêr tevgera nobedariyê eşkere kir, parole hate diyarkirin û her kesek çû ser peywira xwe.

Lê wê şevê xewa serşivên û dûajoyê wî herimî; heta sibê geh li ser wê kêlekê geh li ser kêleka din wergeriyan. Piştî demeke xurt serşivan derkete hewşê, carekê li dora malê û hevşiyê pêz geriya û çû destavê. Beriya ku here nava nivînan, nihêrî ku bizina zerçal dewseke rind nedîtiye, erdê pêkol dike ku mexel were. Li ser vê bûyerê serê xwe hejand û bi xwe re got: “Xwedao, ji karê zatê te pirs şerm e. Hela li vê bizinê binêre; ji bo şevekê tenê be jî cihê mexela xwe durist dike. Em kurd çendî çend sal in ku li ser vî erdî ne, me hê jî cihê xwe durist nekiriye. Îcar wî camêrê fermandêr nehişt ku ez encama wî şerî û wî pêşbaziyê bibînim. Ax gidî!”

Bi berbangê re hêdî hêdî keriyên pêz ji gund raweşiyane dorhêlê û heta ku zerekiya tavê penc veda erdê çêriyan. Serşivên dûajoyê xwe hêvot ku li pêz miqate bibe; heta ku here destûrê ji fermandêr bixwaze û encama şerê duhî tesele bike. Dûajoyî bi lavakarî got:

-Keko, qismê leşkeran serhişk in û ji bo tivdîreke ewlehiyê zû dilan dişkênin. Hema dibêjim qe neçe û tehma devê xwe xera neke.

Serşivên gotinên wî maqûl dîtin; lê dîsa jî biryar da ku bi zimanekî nerm destûrê jê bixwaze. Fermandêr çayek ji xwe re vala dikir ku şivanê duhî li nava yekîneyê dît; bi dêst işaret kirê ku were hindê:

-Te xêr e, çi qewimî?

-Fermandarê rêzdar, bi Xwedê em gundî û rencber ji rewşa xwezayê tiştên wisa hîn dibin ku xwendina deh pirtûkan dewsa wê nagire. Heke destûra te hebe ez ê heta wê morîstanê herim û encamê hîn bibim.

Fermandarî bi niçeniç got:

-De here, lê çend wêneyên dorberê jî bikêşe û ji min re bîne. Heke tiştekî balkêş hebe vîdyoya wê bikêşe, bîne, ez jî mêze bikim.

Piştî çûyîna şivên, fermandarî di perwerdehiya leşkerî de xwendina xwezayê anî bîra xwe û wiha fikirî: “Kesê ku berî şer, xwezaya li dora xwe xwendibe dê alîkariyê jê wergire; kesê ku bi xemsarî serê xwe bike kozika xwe, ew kozik dê rojekê bi ser de bê tepkirin û dê nizanibe çima wisa bû jî.”

Piştî xêleke xurt, hema bibêjî piştî du-sê saetan şivan bi beşereke xweş vegeriya û telefona xwe dirêjî fermandêr kir. Fermandêr bê axaftin telefon ji dêst girt û temaşe kir. Kêzik li ser piştê ketibû û bûbû xurê moriyan; topa wê jî wekî elameta qiyameta duhî sekinîbû. Fermandêr hinekî hêvîşkestî li şivên nihêrî û pirsî:

-Ma te çima hilnegirte kamerayê, te hema ev wêne tenê anîn? Ev demeke dirêj e ku tu çûyî...

Şivên bi devekî ken got:

-Min girte vîdyoyê û bêyî şîrovekirina min mijar dê neyê fêmkirin; divê tevgera wan kêlî bi kêlî vebêjim.

-Baş e, ez ê êvarê digel çend hevalan werim gund û em ê li ser ekrana televîzyonê digel pêşkêşvaniya te temaşe bikin. Bi Xwedê nekevin mesrefê û xwarinê amade nekin; lê ji çayeke xweş û şirînahiyekê re tiştekî nabêjim. De bi ser çavan re hatî.

Êvarê şivên çayek û helaweke malê dane amadekirin; zêde nekişand ku fermandar û çend berpirsên payedar jî hatin. Piştî hevnasîna digel malbatê, vîdyoya telefonê bi flaşdîskekê avêtine ser televîzyonê û şivên dest bi şîroveyê kir:

-Bi texmîna min moriyan heta êvarê li ber xwe daye û bi tarîbanê re westiyayî daketine

morîstana xwe. Bi berbangê re plana xwe ya şevê sepandine. Gava ku ez gihiştim wir, êdî moriyan dev ji topê berdabû û fêmkiribû ku bêbextî ji vî neyarê zindî ye. Wekî bijîjkê ku kula nexweşiyê teşxîs kiribe dest bi neştergeriyê kirin. Ji serî dûr sekinîn û pêşiyê êriş birine ser her du pepikên paşîn. Hema hema heta navikê wisa lê civiyan û pêçiyan ku nehiştin bilipite. Kêzik wekî ku têkeve heriyekê patriyaj dikir, paşê hinekên hûrik ketine nav perikan û binçengan. Gelo ji êşa gestkirinê bû yan jî derziya jehrîn berdanê, êdî nizanim. Min hey lê nihêrî ku kêzik li ser piştê ket û bêhneke kirêt belav kir. Piştî vê bêhnberdanê hinek morî jê ketin û li erdê gevizîn, desteyek ji morîstanê derket û bêhnzede kaşî hundir kirin; hinek wekî sermestan jê veqetiyan, ber bi qulikê yan jî ber bi der û dorê gêjomêjo meşiyan. Vê carê desteyeke din ji kunê derket û êrişeke xurt û tund kirin, dîsa desteyek derket û asta êrişê bilindtir kir. Wisa bû ku êdî kêzik ji moriyan xuya nedibû û di dawiyê de xwe gihandin sêrî. Êpecekî wisa, kêzik wekî miriyê ber sekeratê xwe livand û di dawiyê de tevgera wê bi temamî sekinî. Morî hêdî hêdî jê vekişiyan û ewên li ser movikan li şûna xwe man. Îcar dest bi kelepîçekirina wê kirin û malê talanê kaşî morîstanê kirin.

Êdî derengiya şevê bû, mêvan û mazûvanan xatir ji hev xwestin û her kesek ber bi holika xwe çû. Dilê her du birayên şivan aram bû û bi kêfxweşî ketine nava nivînan û razan; lê dilê şervanan pirtepirt bû ku ji ber xewê peywira xwe baş bi cih neyînin.

**Nifira Sedsalê**

Navê wê Evîn bû; lê berateya evînê ji devê wê nedihate bihîstinê û bi rastî kûpê nifrînan bû. Kebaniya malê Evîna Tahirî îro dîsa bi nifirekê ji xewê hişyar bû. Dema ku alarma demjimêrê lêxist û mêrê wê ji nava nivînan bazda ew jî şiyar bû:

-Lanet li wî were ku ev alarm îcad kirine. Jiyana me bi van alarm û tûtetûtan jehrdadayî dikin, -got, bû mizemiza wê û dîsa noqî nava xewê bû-.

Mêrik bê taştê şandibû ser kar; lê zarokên ku diçûne dibistanê wê diya xwe bi awayekî rakirana û xwarinek lê bidana amadekirin. Wisa jî bû, dema ku çendika demjimêrê gihiştibû ser heftan fîlma zarokan jî qediyabû. Ev dihate wê wateyê ku divê birevine odeya diya xwe û gazî bikinê. Dayîkê:

-Wêrtasa fîlma we qediya? De çente-menteyên xwe amade bikin ez ê a niha ziqûmekê digel jehrê amade bikim, -got, ji nava nivînan derket û li fera şimika xwe geriya; dîsa-:

-Weyla hesret bûyê, bi ku de çû?, -got, fera dinê jî dît, bi ser piyê xwe yê çepê ve kir û ber bi mitbexê ve çû-.

Dest diavête çi bi nifirekê, dest ji çi berdida bi nifirekê...Nifir mîna mîza şeytên ketibûn pêsîra wê û nikaribû xwe ji wan xelas bikira. Her çend caran towbe kiribû jî, towbeyên wê ji yên mirîşkekê demkurttir bûn.

Rojekê bi pêşniyara mêrî, her du bi hev re çûbûn cem bijîjkekî derûnînas, sê-çar seansan jî bi xwe çûbû klînîkê; lê çûyîna wê bi kêrî pênc qurişan nehatibû. Carinan mêrê wê laqirdî lê dikir:

-Dibêjin merivekî kurê xwe biriye cem melayî û gotiyê ku seyda ev xulamokê te bêmehnî binê xwe şil dike, ka ji kerema xwe re duayekê jê re bike ku vî exlaqî biterikîne. Çendek bi ser re derbas dibe, mela rastî wî mêrikî tê û jê dipirse bê ka kurê wî pak bûye yan na. Mêrik bi hêrs dibêjê ku berê binê xwe şil dikir û piştî nivişta wî îcar binê xwe jî pîs dike.

Evînê li pey vê laqirdiyê jî nifirek kiribû û bi tîqetîq keniyabû.

***

Rojekê piştî ku zarok danîbûn dibistanê, bi otobûsê diçû serdana pîrejina diya xwe; lê cihê rûniştinê tunebû ku rûne. Nihêrî ku dildarê wê yê ciwaniyê digel xanimeke gelekî bedew a ducanî rûniştiye û serî di ber de noqî nava lîstikeke tabletê bûye, pirtûkeke bi navê “Salnameya Ehmedê Xanî    jî li ser çongan e. Herwiha xanima li teniştê pirtûkeke bi navê “Zargotina Kurdên Serhedê” dixwend û gava dît ku jineke navsere bi ser re sekiniye niçande mêrikî; bi serê xwe işaret kirê ku şûnê bide wê jinikê, wê li kêleka xwe bide rûniştandin; lê jinikê got ku ew dê piştî du rawestgehan peya be, hewce nake ku “mamoste” aciz bibe. Bi peyva “mamoste” û dengê qalind Dr. Dilawerê Keleşkî şik bire evîndara xwe ya ciwaniyê Evîna Tahirî û wekî ku veciniqe serê xwe ji ser lîstikê rakir:

-Evîn?

-Dilawer?

Ji bilî her du peyvan tu gilî-gotin ji devê wan derneket. Vê carê xanima Dr. Dîlawêr çimeke rûpelê bi ser de qat kir û ji jinikê pirsî:

-Hûn hev nas dikin?

-Belê, me dibistana amadehiyê tev xwend. Piştî dibistanê ev cara yekem e ku pê re diaxivim. Tu keça wî yî?

-Na lê, jina wî me, -got û bi devekî ken û bi du tiliyan işaret dayê ku ya diduyan e-.

Her du jin bi qasî panzde deqeyan axivîbûn û Evînê qe nifirek jî nekiribû. Li rawestgeha sêyemîn peya bû û riya mala bavê girt. Çawa ku gihişte cem dayîkê -piştî silav û halpirsînê- dest bi paqijiyê kir, dor-ber dane hev û xwarinek amade kir. Ji diya pîrejin re got ku divê bi lez derkeve û xwe bigihîne dibistanê da ku zarokan hilde. Bi xatirxwestinê re, wekî tîra ji kevanê firiyayî xwe

gihande rawestgehê û li ber dibistanê peya bû. Zarok hildan, anîn malê, xwarin da wan û bi ser wan re sekinî ku sipartekên xwe çêkin. Êvarê mêrê wê ji kar vegeriya, xwarina wî jî dayê û qala çûyîna xwe ya li mala bavê û rewşa pîrejina diya xwe kir.

Evînê wê rojê ji dîtina Dilawêr heta dema razanê qe nifirek jî nekir, bi ser de mêrê xwe jî şa kir û kire xewê; lê bi xwe raneza û piştî demeke kurt hate salonê, betaniyek li xwe aland, kete nava bîranîna xwe ya wê rojê.

Dilawêr lîstikeke stratejiyê ya çînî dilîst; dê bi hezar erebeyên cengî, hezar vagonên sergirtî û sedhezar çekdarî şerek li dar bixista. Lewre mesrefa vê artêşê ya rojane li gorî mesafeya seferê derxist, ji ta-derziyê bigire heta şûr-mertalan navên malzemeyên pêwist îşaret kir. Paşê bi tûşekê tevahiya mesrefê dît û gava nihêrî ku aboriya wî têrê dike dest bi şerekî kir. Wisa noqî nava lîstikê bibû ku hay ji hatî-çûyî, siwarbûyî-peyabûyiyan tunebû.

Dilawer bi Evînê re neaxivîbû, şîretek lê nekiribû, serî di nava lîstikê de li rûyê wê jî nenihêrîbû; lê çawa mîna êşkujekê nifirên wê dabûne sekinandin? Vî mamosteyê zanistên siyasî çawa bedexlaqiya wê bi carekê ve guhastibû aramiyeke exlaqî? Derûnînas û nivîştên melayan çawa bandor li xisletê wê yê tewş nekiribû?

Evîn ji nişkê ve bi riya telefona xwe ya destan kete înternetê û bi navê Dr. Dilawêr lêgerînek da destpêkirin û gelek gotarên wî yên li ser stratejiyê derketin pêşberî wê. Di vîdyoyeke belavkirî de li akademiyeke pêşmergeyan qala morala şervanan dikir: “Eger serfirazî dereng bikeve, morala serbaz û leşkeran dadikeve û bandora çekan kêmtir dibe. Êrîşa li dijî sûrên bajaran, cihên parastî û amûrên zirxdar hêzê zû qels dike. Herwiha demdirêjiya şeran aboriya dewletekê û carinan aboriya hevalbendan jî têk dibe. Gava morala serbaz û leşkeran dadikeve: çalakî û hewesa wan a bi çek û pûsatan jî pê re dadikeve, hêz qels dibe û derhat kêm dibin. Tam wê çaxê dewlemend ji vê lawazî û aloziyê keysê digirin û serî hildidin. Dijminên cîran û dereke bi destî xwefiroşên hundirîn dest bi parevekirina berjewendiyan dikin ku pêşeroja xwe ya li wî welatî garantî bikin. Êdî kesek nikare pêşiyê li bûyeran bibire û stratejiyên pêşketî jî fayde nakin.”

Evînê li vê derê vîdyo da rawestandin û ji xwe re digot û dibiland: “Ez qurban, wexta hatina te dereng ket bandora hezkirina te qels bû; hewesa min nema û îradeya min sist bû. Lewre bîranînên me vegeriyan neyaran û çavnebariya min ez radestî nenasekî kirim. Bibexşîne.” Kir ku vîdyoyê bidomîne; lê bi dengekî nizm ji xwe re got: “Di wê de here, dêla heram te sê mehan sebr nekir ku di betlaneyê de vegere!”

Evînê êdî dest ji nifiran berdabû û fêrî dijûnên qerfî dibû. Wekî ku bixwaze şûna nifiran bi dijûnan dagire, çêr û sixêfên zaroktiya xwe, devjeniyên jinan û bedgotinên pîrejinan dianîn bîra xwe. Carinan derdikete balkonê û demeke dirêj li pevçûna zarokên kurîn temaşe dikir; bi baldarî guh dida dijûnên wan û ji nava wan çend hebên munasibî devê jineke mêrkirî dibijart; bi vî awayî çanda xwe ya dijûnan berfireh dikir. Wê jî zanibû ku nifir û dijûn xwişk û birayên hev in; maka wan şer û bavê wan neheqî ye. Wê jî bihîstibû ku di çarçoveya minasebetên şeran de lezkariyeke dînane heye; ji nişkê ve rû didin û ji nişkê ve radiwestin da ku ji nişkê ve dîsa dest pê bikin. Herwiha tu carî nebihîstibû ku faydeyeke şerên demdirêj çêbûye; heta ku hinek dewlet ji ber demdirêjiya şeran têk çûne; di nava pêvajoya dîrokê de winda bûne, qe nav û berateyên wan jî nemane.

Evînê carekê hêza xwe ya hezkirinê bi hêza serdestiyê re guherandibû, qismetê hêsan û dewlemend hilbijartibû, hezkirina dijwarî û stûxwariyê terikandibû. Lê gava Dr. Dilawer dihate bîrê, şarezatiya wî di ber hişê wê re derbas dibû, sed carî lanet li bîr û hişê xwe dianî û dikire piçepiç: “Dema ku wî dest bi xwendina siyasetê kir min jî minexetî lê kir; ez êdî bûbûm qada wî ya têkoşînê, wî hemû stratejiyên xwe li ser vê xiyaneta min ava kirin. Heke min kemînek jê re danîbe, niha wî sêsed kemîn danîne ber min û ez nizanim ez ê di kîjanê de bême girtin. Heke min riyeke bêexlaqiyê jibartibe; niha wî sêsed riyên exlaqê bilind ji xwe re kirine rêbazên jiyanê. Weyla li min dêranê.”

***

Dr. Dilawer, hîndekarê zanistên siyasî qe Evîna Tahirî nedianî bîra xwe û wekî stratejîstekî jîr tenê carekê bangî sebrê, danexwarin û berxwedanê kiribû. Herwiha du caran ji evîndara xwe re erzaqê eşqê şandibû ku bikaribe têkoşîna xwe bidomîne. Carekê bi eşqa xwe ya nepen helbest nivîsandibûn û bi wan bûbû yekemînê pêşbirkekê. Her kesî mereq kiribû bê ka li piştt vê evîndariyê kê heye û derketibû holê ku hevala wî ya dibistanê ye; lewre serê Evînê gihiştibû esmanan û perbaskên wê tunebûn ku bifire. Carekê jî Evîn di qezayeke trafîkê de ji mirinê filitîbû ku serdanên wî dîsa ew li jiyanê vegerandibûn. Mixabin, piştî ku Evînê xiyanetî lê kiribû êdî bûbû dijmin û muxalif; lewre dildara xwe ya bi salan ji xwe re kiribû hedefa lêxistinê, talankirinê û tarûmarkirinê. Ew eşqa dilê xwe vegerandibû hêzeke atomî, bi gef û gura vê hêzê erzaqê xwe ji dijminê xwe bi dest dixist. Lewre êdî qala eşqê nedikir, helbestên xwe yên xortaniyê gişt li malê, di çaviyeke taybet de hiştibûn. Êdî li meydana siyasetê bi rênîşandaniya xwe kariyera xwe têkûz dikir, li ser sifreya rêvebiriya qenc zikê xwe têr dikir û xêr digihande nas-dostên xwe.

Dr. Dilawer sazûmana xwe ya ramanî ava kiribû, zanyarî û dost-nasên xwe vegerandibûn sermayeyeke xurt, ji wan hêz werdigirt û kariyera xwe bilindtir dikir. Lê Evîna Tahirî wekî dewleteke ji ber şerê demdirêj lawaz ketî, êdî nikaribû li ber xwe bida, her carê pîşeyekî nebaş diceriband; derûniya wê carekê dengeya xwe şaş kiribû. Lewre nikaribû valahiya dûrahiyê, dûrahiya ji Dr. Dilawêr dagire. Ji ber ku mesafeya di navbera eniyên şer de çiqasî dûr be mezaxtinên veguhastinê jî ewqasî zêde dibin, bi kurt û kurmancî mesafeya neqliyatê xelqê welêt feqîr dike û dûrahiya di nabera her du giyanan de Dr. xurt dikir û Evîn lawaz dikir.

Navenda eşqê dil û mêjî ne û gava mirov eşqa xwe ya ji bo kesekî yan jî tiştekî winda bike alozî û cirnexweşî dest pê dikin. Gava mirov bi dil û mêjiyê xwe re têkeve şerekî bêdawî di encamê de bihayê tiştan zêde dibe. Ev şerê bêdawî û bêencam, ev bihayê zêde derhatên xelqê dimiçiqîne, gola aboriyê ziwa dike. Gava derhat têne miçiqandin, ji bo komkirina bacê û seferberiyê lezkariyeke dînane dest pê dike. Gel cure bi cureyî tê şêlandin, bêedaletî dibe nirxê çarşî û bazarê.

Roja ku Evîna Tahirî li dewlemendekî hate nikahkirin, êdî xwendekarê pola yekem a zanîngehê Dilawerê Keleşkî ne desthilatdarê wê hêza evîndarî û dildariyê bû. Ji ber ku her du lingên vê hêzê, ango rastî û duristî hatibûn şkandin. Êdî wî ciwanê bêgav divê ji xwe re evîn û dildariyeke ditir ava bikira; bi destên xwe yên tazî, li ser bingehê rastî û duristiyê ji xwe re jiyanake din damezranda. Lewre jiyana xwe ya akademîk şopand, hezkirina xwe ya ji bo rastî û duristiyê bi nefreta li dijî derew û sextekariyê re berawird kir û gihişte vê encamê: “Heke hêzek ji min hatibe standin, heke derhat û derfetên min hatibin îsrafkirin, mala min a li deştê hatibe valakirin, heke ji desteka xezûrgelanan hatibim mehrûmkirin, heke tevahiya wî welatê ku ez xwedî û mîrê wî bûm hatibe dagirkirin ez ê danexwim, ez ê dev ji berxwedanê bernedim. Rast e, xisara dewleta min zêde ye: erebeyên şikestî, hespên birîndar, kumzirx, tîr û kevan, rim û mertal, guleparêzên seyar, heywanên barkêş û vagonên veguhastinê ketine destê dijminê min; lêbelê ez ê danexwim, ez ê dev ji berxwedanê bernedim.”

***

Piştî wê hevdîtinê êdî Dr. Dilawer ne ew kesayetê berê bû. Divê kalîteya kesayeta xwe kêmekê bilindtir bikira da ku bejna Evîna Tahirî negihêjê. Divê leza xwe ya pêşveçûnê jî derxista asteke çalaktir da ku Evîna Tahirî li paş xwe bihêle. Divê karîzmaya xwe berbelavtir bikira ku dijmina xwe zêdetir tar û mar bike. Divê êdî li siwareyên gelemperî siwar nebûya, bibûya xwediyê siwareyeke baş ku lez û fermana wê di destê xwe de bigirta.

Wî ji lîstikên stratejiyê dizanibû ku fermandarê biaqil ji mexzenên dijminî têr dixwe. Carekê têrxwarina ji mexzena dijminî bergindî bîst carî ji bêrîka xwe ye, carekê ji depoya dijminî alifkirina heywanan bergindî bîst carî ji depoya xwe ye. Herwiha ji derûnînasiya siyasî dizanibû: “Ya ku mirovan vedijîne jan e; jan mirovî bi laş û tenduristiya wî dihesîne. Ya ku mêran dike kujerê dijminî

hêrs e; ya ku wan dike talanker garantiya xenîmeta şeran e.”

Divê Dr. Dilawer sermayeya xwe ya akademîk veguhesta cihekî ewle; divê dest bi damezrandina partiya xwe ya siyasî bikira yan jî di nava partiyeke ecibandî de cih bigirta. Divê xwe bida cihekî wisa ku tenê mirovên rast û durist lê biêwiriyana, bisitiriyana. Divê sextekar û xwefiroş nikaribûna bi mêvanî jî werinê. Divê muxalif û dijminê wî tenê wekî bersûc bihatana pêşberî wî. Herwiha divê mêvanên wî kesên di hempayê wî de bûna.

Herî dawîn biryar da ku ji bilî jiyana xwe ya rojane û akademîk lîstika xwe ya stratejiyê jî biguherîne. Di vê lîstika nû de divê ligel şervanên peyar şervanê siwareyan jî hebûna. Di şerê bi siwareyan de heke deh siware bi dest bixistana, divê ji bo şervanê ku siwareya yekem bi dest xistiye diyarî hebûya. Pişt re divê ala û perçemên radestkirî bihatana guhertin û siware li gorî formata xwe danîna. Divê miameleya digel êsîrên şerî baş bibûya û baş bihatana xwedîkirin. Heke di vê lîstika nû de navgînên hewayî û fezayî jî hebûna, desteka hêzên deryayî jî hebûya dê baştir bibûya.

Dr. Dilawerê Keleşkî ji vê stratejiya xwe re navê “bihêzbûna bi rêya serkeftinê” terxan kiribû. Loma plana xwe ji bo serkeftinê amade dikir, ne ku ji bo şerekî demdirêj. Ji ber ku fermandar û serwerê jîr ew e ku çerx û qedera xelqê ber bi bextewariyê ve digerîne; dibe mîrê aramî û ewlehiya wî. Sermayeya wî feraset û zanyariyên wî bû; lê CEOyê vê sermayê zimanê wî bû ku tevahiya sazûmana hişmendiya wî bi rê ve dibir.

Ev çareserî bi Dr. Dilawerê Keleşkî gelekî xweş dihat. Li gorî wî meş û tevgera li ser xeta rastî û duristiyê nifira sedsalê bû li dijî derew û sextekariyê.

**Baz**

Gernas Bazîdiyê xwendekarê Beşa Ziman û Wêjeya Kurdî wisa bawer dikir ku navê bajarê Bazîdê ji peyva “baz” hatiye dariştin û tê wateya “hêlîna bazan”; loma jî Gernas Bazîdî bêfila xwe ya dirêj û kevankî jî hertim bi vê serbilindî û quretiyê dişibihande nikulê bazan. Gernas Bazîdî bi alîkariya hevalên xwe yên Beşa Jînnasiyê, Beşa Medyaya Pêşketî û Beşa Endazyariya Kombersan slaydek amade kiribû û dê wekî teza qedandina beşê pêşkêş bikira. Dema ku hîndekar li rêza pêşîn û xwendekar jî li pişt wan rûniştin Gernas Bazîdî bi quretiyeke bazane dest bi vegotina rewş, nêçîrvanî û taybetiyên bazan kir: “Baz perindeyên balkêş in. Li esmanên jorîn baskên xwe li ba dikin û bi ser xwe re tenê Xwedê nas dikin. Refên wan ji çend livan derbas nabin. Her yekî wan xwe wekî dewleteke serbixwe dihesibîne. Ji bo wan nêçîr welatê dijminî ye. Lewre êrişê dibin ser ajalên ku bi wan dikarin. Nêçîrê bi giştî û bi silametî digirin. Lêbelê kelepîçekirin û hanzûka daqurtandina wê ewqasî ne bikêrhatî ye. Divê zewqekê jê hildin û bibînin ku bi ber zehmetê wan ketiye. Loma jî dîl û qurbaniyên xwe derdixine cihekî bilind ku bi dilekî rihet bixwin; wawîk, çeqel, rovî, mêş-moz û hemû mêvanên nexwestî neyên ser sifreyê, çêja devê wan xera nekin. Herwiha seba bazan ji dêla kuştina nêçîrê ve, ya baş dîlgirtina wê ya giştî ye. Ji aliyekî din ve dîlgirtina nêçîrekê yan jî qutkirina endamekî wê yê nermegoşt ji windakirina wê çêtir e. Lê çima gotine baz? Li meqamên bilind biryarên lezgîn û tund didin; noqteya lêxistinê şaş nakin û kêm caran nikilvala an jî pencikvala vedigerin.

Piştî vê kurteagehiyê Gernas Bazîdiyê bêfila xwe ya dirêj û kevankî hertim bi serbilindî û quretiyê dişibihîne nikulê bazan hewl da ku stratejiyên nêçîrvaniyê yên bazekî rave bike: “-Ji bo bazan êriş û serkeftin her dem lûtkeya jîrtiyê nîşan nade. Ji ber ku serkeftina hera hêja şikandina giyanê berxwedanê yê nêçîrê ye. Li gorî feraseta bazan pileya hera berz, feşkilandina planên revê yên nêçîrê ye ku divê bi êrîşeke dijraber bersiv bê dayîn. Di pileya duyem de divê derfetê nede nêçîrê ku ji bin sehma têkçûnê derkeve û nehêle ku bi ser hişê xwe de were û biryaran bide. Di pileya sêyem de jî divê li cihê munasib nêçîrê bigire, derfeta xweveşartinê nedê û nehêlê bipirpite. Lewre divê bi çavên xwe yên dûrbînkî tevgera nêçîrê bişopîne û mehdeyê xwe xera neke, laqirdî û lîstika vî karî tuneye. Ji ber ku di nêçîrvaniyê de tevgera hera çors serdagirtina nêçîreke parastî ye; heta ku ji destê nêçîrvanî were, divê rêbaza rast bi kar bîne û êrişê nebe ser nêçîreke parastî.”

Gernas Bazîdî wekî bazekî ku bi çavên xwe yên dûrbînkî tevgera nêçîrê bişopîne li guhdarvanên xwe mêze kir û ji bo berawirdkirina karê nêçîrê û tevgera şerî hinek agehiyên dîrokî, siyasî û leşkerî digel wêneyan pêşkêş kir: “Ji bo bazekî bijartina nêçîrê, dem û dewsa êrişê dişibihe dagirkirina welatekî. Ji ber ku baz bi xwe dewletek e, hêza wî ya esmanî bêhevta ye û teknolojiya ku bi kar tîne gelekî pêşketî ye. Wekî ku Îsrayîlê pêşiyê serbazên misrî dane serxweşkirin û hêza wê ya hewayî bi carekê ve rûxand, şert û mercên xwe pê dane pejirandin. Baz jî sehmeke nedîtî li ser nêçîrê ferz dike û li gorî mercên xwe dîplomasiyê pê re dike. Divê baz xûjbûna xwe ya ji esmanê heftan, vê enerjiya xwe badilhewa bi kar neyîne, destevala û birçî venegere ku careke din bikaribe êrişekê bike. Çawa ku amadekirina birc, kelehên seyar û amrazên cengî yên curecureyî sê mehan dikşîne, herwisa payîna bazekî jî wisa dirêj dikşîne. Çawa ku tijîkirina berê sûr û bedenên bajarekî parastî bi xwelî û keresteyan sê mehên din jî bikêşe, eynî bi wê hedûr û baldariyê amadehiyan dike.”

Gernas Bazîdî bêhnek stand û yek berda, devê şûşeyeke avê vekir, çend qurt lê xistin û dîsa devgirtî danî ser tabûreyê; mişkoka kombersê danî kêlekê û êdî bi bişkokên hevraz-berjêrkirinê, paş-pêşvebirinê wêne rêz kirin û wiha berdewamî da axaftina xwe: “Ji aliyê xebata cidî de her kes moriyan wekî mînak nîşan dide. Rast e, morî wekî japoniyan jîr in, an jî japonî mîna moriyan dixebitin; lêbelê di tevgera her duyan de jî bêsebrî û bêaramiyek heye. Lewre serfermandarê ku nikare bêaramiya xwe aşt bike, dê leşkerên xwe wekî komeke moriyan raweşîne nava cengê û encama vê êrîşê jî qirbûna ji sê paran pareke leşkeran e. Ev lezgîniya dînane ji bilî sizadanên giran û gemaroyên nemirovî tiştekî bi xwe re nayne. Vê bêsebrî û bêaramiya japonan ew ajotine êrişeke hewayî ya li Pearl Harboura amerîkî; lê hovîtî, cidiyet û jîrahiya amerîkiyan sosreteke wisa anî serê

wan ku hê hê jî japonî faîza deynên wê êrişa xwe didin. Jiyana ajalên çolê, jiyaneke bêmerhemet û bêpiyarî ye; hov e, şerekî rastîn e. Baz şervan in, nêçîrvan in û di karê wan de çewtî nayê qebûlkirin. Dema ku ji jor de bi sernişîvî tê xwarê dibe ku roviyekî birçî bifikire ku Xwedê lê hatiye rehmê û mirîşkên hazir jê re dişîne; lê ne wisa ye. Hişmendî û biryarên bazekî ji qanûn û burokrasiya meclisekê cidîtir in; ji ber ku tekolojiya wî ya pêşketî hemû gendeliyan tesbît dike; laqirdî û pertaf, rişwet û kurtêlxurî bi tu awayî di welatê bazekî de nayên pejirandin; ji ber ku hebûna van nexweşiyên siyasî û rêvebiriyê ji bo bazekî xwekuştin e, harakîro ye. Dibe ku hinek bibêjin bê 'ka harakîro çi ye û gelo argoyeke kurdî ye yan na?'. Nexêr, navê cureyekî xwekuştina japoniyan e.”

Dema ku xwendekarê pêşkêşvan Gernas Bazîdî ev beşa slaydê qedand hilma xwe xurt berda, soromoro bû û ji nêrînên hîndekar û xwendekaran têgihişt ku gelekî ji mijarê dûr ketiye. Lê çend xwendekarên heval bi sloganên wekî “helal be ji te re!”, “çi xweş şîrove ye”, “destxweş” û “sihetxweş” rewş kontrol kiribûn. Herwiha diyar bû ku hevoka wî ya *“dema ku baz ji jor de bi sernişîvî tê xwarê dibe ku roviyekî birçî bifikire ku Xwedê lê hatiye rehmê û mirîşkên hazir jê re dişîne”* kêfa hemûyan aniye; lewre beşera wan xweş bûye û beşeve hatine. Hinekî bi vê kenê morala xwe teze kir; hinekî jî bi pesna ji aliyê hevalan ve çêkirî piçek giyan pê de hat û mijara xwe wiha kudand: “Baz pêşengekî jêhatî ye, leşkerên dijminî bêyî şerkirinê sernişîv dike; bajarên wî bêyî danîna gemaroyê bi dest dixîne û pergala desthilatdariya wî bêyî raperînên meydanî yên dûvedirêj rûdixîne. Baz qure ye, ji bo berjewendiyên biçûk ewqas mesafeyî nade ber xwe û nayê xwarê. Mîna qijikan li pey kêzik, mêş, moz, morî, beq û mişkekî nakeve; ew çav berdide kerguhekê, roviyekî, çeqelekî, têjikeke gur û hirçan. Carinan çav berdide karxezalekê, pitikeke dergûşê, zarokekî çar-pênc salî; carinan piştî lêgerîneke dûr û dirêj ji bilî nêçîreke laşbiçûk tiştekî nabîne û tenezulî pariyekî jî dike ku ev ne eyba wî bi xwe ye, eyba xelayê ye, tunebûnê ye. Lewre gava koçber malên xwe barî zozanekê dikin û dergûşekê didine ser pişta hespê, îlam pîneyekî di rengê zîn û hespê de diavêjine ser dergûşê.”

Li vê derê divê Gernas Bazîdî êdî navek li stratejiya nêçîrvaniyê ya bazan bikira. Ji ber ku êdî slayda pêşîn diqediya û hejmara wêneyan kêm dibû divê zor bida peyivîn û şîroveyê: “Gava baz bi saxî û silametî ji nêçîrê vedigere, nêçîra xwe derdixe lûtkeyekê û dadipele ber xwarinê, a wê hingê nîqaşeke germ di hundirê nêçîrê de dest pê dike, ew teze planeke revê datîne û manevrayên hîç û pûç nîşan dide, bi rastî ew sekerata xwe nêzîktir dike, hêza xwe ya heyî jî îsraf dike. Îcar kengê baz pêşengê jêhatî ye? Helbet gava ku demeke munasib nêçîrê dişopîne, dem û dewsa qurbaniyê baş tesbît dike, bêyî windakirina dengeya xwe xûjî ser objeyê dibe, wê xirp digire, bi teleferîkekê radike esmanan, di vê êrişê de ziyan û zedeyê li pergala xwe naxîne, ango bêyî windakirina leşkerekî û xwînbûna bêfila karmendekî xwe serkeftinê dike para xwe, bi rêbaza "*êrîşbirina digel stratejiyê"* tevdigere...”

Êdî dem hatibû ku Gernas Bazîdî slaydê biguherîne û wêneyên nû pêşkêş bike; herwiha mijara vê slaydê bi ya çûyî ve girêde: “Gelî beşdaran divê vê yekê jî bibêjim ku di nêçîrvaniya bazan de rêbaza serdest ev e: Gava rêjeya hêza wan deh qatî hêza nêçîrê be, êriş nakinê bi qîqeqîq û perwaza xwe gemaroyê daydine ser; li benda şaşiyeke wê û keyseke dîlgirtinê dimînin. Gava pênc qatî wê be, demildest êrîşê dibine ser. Gava hêza wan negihêjê dikarin qijikekê jî teqlîd bikin; wekî mînak li ser hêtên paşîn ên fîl û kerkedanekê datînin, saxî saxî zikê xwe jê têr dikin. Heta ku ew nêçîr di bin dareke nizm re derbas nebe û baz bi darê ve nealiqe, yan jî nekeve nava aveke kûr nikare xwe jê rizgar bike; lê di vê rewşê de tehlûkeyeke din jî heye: dibe ku nêçîr bi xwe bi daran ve bialiqe û bibe rûnê helandî ji bo bazî, yan jî di nava avê de laşê xwe xelas bike û ser-çavên xwe bibexşîne nikulên bazî. Di vê êrişa ku ne bi qaydê bazan e de, baz hêza xwe li ser du paran leva dike; bi perwazeke qijikane dadikeve xwarê û nîvê enerjiya xwe bi kar tîne; car heye ev derfeta bidestxistî nêçîra hera baş e. Gava rêjeya hêza bazî hevtayî ya nêçîrê be, wê hingê dikare şer jî bike. Lê gava ji nêçîrê lawaztir be, rasterast berê xwe nadê. Me got ku baz biaqil e û bi awayekî leşkerî li nêçîra xwe dinihêre. Ji ber ku nêçîr gotî, dijmin gotî. Lewre dikare bi awayekî leşkerî wiha jî

bifikire: *"Heke hêzên me ji her aliyî ve ne hevtayî hêzên dijminî bin, wê hingê divê em ji çapa dijminî derkevin û birevin. Ji ber ku hêzeke biçûk dikare bi serhişkî têkeve şerekî, lêbelê di dawiyê de ji aliyê hêza mezin ve tê pirçiqandin."*

Îcar diviyabû Gernasî qala anatomiya bazan jî bikira; lê divê şîroveya wî ji agehiyên jînnasiyê zêdetir bişibihiya şêweyê wêjeyî; divê wate bida endaman û çarçoveyeke berbiçav jê re derxista. Jixwe ev agehiyên zanistî ji hevalên xwe yên Beşa Jînnasiyê bi dest xistibûn; lê raveya wî divê cuda bûya: "Serê bazekî navenda biryargeha laşê wî ye; bi gotineke din Koşka Spî, FBA, CIA û Pentagon, hemû wezaret û rêvebiriyên kar û barên parastin û êrişkirinê di vê qadê û di vê navendê de hatine çikilandin. Ji bo bazekî çav kamerayên Mobeseyê ne û mêjî jûra kozmîk e; nikul û pencik jî hêza sepandinê ne. Lê di vir de diyar e ku hêza sepandinê ji du astan pêk tê; nikul nêzikî sêrî ye ku operasyonê ji jorê ve dişopîne, ew civat û komîteya serbazan e, di nava xwe de ji du beşan pêk tê; lê pêwist bike bi xwe jî noqî nava kar dibin. Heçî ku pencik in, ew jî berbaz, serleşker û leşker in. Wisan e em dikarin serê bazekî wekî sererkaniya giştî ya dewleta bazekî bihesibînin. Gava sererkaniya bazî ji her aliyî ve berk û parastî bibe, dewleta wî jî xurt û karîger dibe. Qelîşteke biçûk, agehiyeke şaş û nekemilî, biryareke beravêtî û pêşwext vê sererkaniyê lawaz dike, nav-nûçikan bi ser dixe û dike qeşmerokê çeqel-çûqelan; li pey re dewleta wî -ya ku laşê wî ye- tûşî gelek aloziyên navxweyî tê; ji ber ku wize, ango enerjiya xwe ji bo netutiştekî xebitandiye û dagirtina dewsa wê êdî dijwar e."

Ji ber ku mijar bi lîteratûra leşkerî şîrove dikir divê Gernasî mijara "nêçîra şaş" û "êrişa badilhewa" baş bida serwextkirin. Lewre Gernasî gotinên xwe wiha rêz kirin: "Çawa ku desthilatdarek ji ber sê egeran artêşa xwe kaşî nava bobelatekê dike û bi vê tevgerê artêşa xwe qels dibe: rakirina fermanên êrişê, belavkirina pêwistiya vekişînê, nezanîna rewşa artêşê. Baz jî ji ber sê sedeman hêza xwe badilhewa bi kar tîne û qels dibe: Heke biryar dabe ku êrişî nêçîrê bike, lê agehiyên ji kamera û jûra kozmîk hatî şêlî bin; an jî biryar dabe ku dev ji nêçîrê berde, lê tecrubeyên wî yên kevn nîşan bidin ku tevgera nêçîrê asayî ye û tam jî malê xwarinê ye; an jî di serkeftina xwe de têkeve şikê û nizanibe bê ka çi bîne serê nêçîrê. Baz li gorî fermanên serê xwe endamên xwe yên nêçîrvan bi kar tîne. Hevahengiyek di navbera serî, penc û baskan de heye; lê gava hevahengî tunebe wisan e artêşê derveyî qanûnên dewletê derdixe operasyonê; an jî wekî Enwer û Palat Paşa artêşê dişîne şerekî, bêyî ku bizanibe bê ka artêş di çi rewşê de ye. Çawa ku ev tevger di hişên leşkeran de bêaramiyê pêk tîne; herwisa di liv û tevgera nikul û pencikan de jî bêteşeyî dest pê dike; biryarên ji seriyî hatî tên rexnekirin."

Li vê derê Gernas Bazîdî zivirî ser beşdaran, xwest ku çend rexneyên xwe yên rapêşîne; bûyerên dîrokê û lehengên heyamekê di nava şîroveya xwe binirxîne: "Guhdarên hêja, şandina serbazên artêşê bi awayekî keteber, bêyî ku bizanibe bê ka di kîjan rewşê de ye û li gorî kîjan rêbaza leşkerî tê hereketkirin, baweriya leşkeran a bi desthilatdariyê lawaz dike. Dema ku artêş nearam û bêbawerî be, wê hingê teqez mîr-axayên kevneparêz, cehş-sîxurên hundirîn dê helwestên neyînî nîşan bidin. Ev rewşa han dê bi asanî aloziyan têxe nava artêşê û serkeftinê bi ro de bibe. Nizanim Harpagus tê bîra we? Ev fermandar ji aliyê Serokê Giştî yê dewleta xwe ve bi awayekî hovane hatibû sizakirin. We giştan bihîstiye bê ka çi hatiye serê dewleta wî. Ji ber ku fermana serokî bi cih nayîne, serok kurê Harpagus dikuje, dike kebab û dide ber wî. Bi merasîmekê goştê kurê wî pê dide xwarin; lê... Harpagus pê dihese ku daye dû bîna kebabê û rastî daxkirina keran hatiye..."

Gernasî hewl da ku axaftina xwe bidomîne; lê hevalekî wî yê ku li ser hesabê xwe yê medyaya civakî rexneyên civakî dinivîse gotina wî birî û wiha got:

-Hevalê Gernas dibêjin Harpagus kurd bûye û semantîka navê wî jî Xer Bego ango "cehşo" ye. Gelo têkiliyeke giyanî di navbera wî û cehşên hevdem de...

Gernasî nehişt ku gotina xwe temam bike, ji ber ku wî hevalî bêdestûr ramana xwe pêşkêş kiribû û sizaya tevgera wî jî destgîrkirina mafê axaftinê bû, wekî ku wekî dizekî ketibû malê divê

miameleya dizan bidîta. Lê diz rastî xwediyê axaftinê hatibû û dixwest ku bibêje “mal avayo va ye ez im, hevalê te me, tu çima gotina min dibirî, ez dixwazim peroşiyekê bidim axaftinê”. Gernas jî dixwest ku bibêje “diz hene ku ji dizan didizin, erd û esmanan dilerizînin”. Nihêrî ku êdî heval canbêzarî bûne û dixwazin bi laqirdî û qerfan ji mijara nêçîrvaniyê, baz û têkiliya tevgera wî ya leşkerî dûr bikevin. Lewre dixwest ku babeta xwe bi ser hev de bîne û tevgera ibretî ya bazan biqedîne; lêbelê divê hinek şîretên xwe jî pêşkêş bikirana: “Hîndekarên hêja û gelî guhdaran! Mebest ji vê babetê helbet ne baz e. Ji xwe hûn bajarvan in, dibe ku hûn ê di jiyana xwe de tu carî bazekî zindî bi çavên serê xwe nebînin; lê piraniya we dê rojekê perwerdehiya leşkerî bibîne, wihareng e rojekê pêwist bike ku hûn van agehiyên min bînin bîra xwe, di wê dem û dewsa teng de bi kar bînin. Divê em bizanibin ku serkeftin li ser pênc xîman ava dibe: Kesê ku dizane kengê şer bike û kengê jî ji şerî vekişe, dê bi ser bikeve. Kesê ku dizane him hêzên giran him jî hêzên sivik çawa bi kar bîne, dê bi ser bikeve. Kesê ku hemû endamên artêşa wî bi heman giyanî tev digerin, dê bi ser bikeve. Kesê ku hêzên xwe amade dike û firsenda pêşamadehiyên cengê nade dijminî, dê bi ser bikeve. Kesê ku him ji aliyê leşkerî ve him jî ji aliyê desthilatdariyê ve hêzdar e, dê bi ser bikeve.

Lewre mirov dikare wiha bibêje: Gava tu him dijminî him jî xwe nas bikî, êdî tu dê ji encama sed cengî jî netirsî. Gava tu xwe nas bikî lêbelê dijminî nas nekî, wê hingê tu dê çend serkeftinan bi dest bixînî; lêbelê tu dê ewqasî tûşî sernişiviyan jî werî. Gava tu ne dijminî ne jî xwe nas bikî, wê hingê tu dê xwe li ber tu cengê ranegirî. Sipasî ji bo hîndekarên min ku e derfeta axaftinê dane min; herwiha sipasî ji bo hevalan ku ev axaftina min a dirêj bi hewes û baldarî tehemul kir.”

**Di Bin Siya Raperînê De**

Ciwanmerd li nava nevî û nevîçirkên xwe rûniştibû. Dîsa cejneke ji welêt û heval-hogiran dûr derbas dikir. Wî jî nizanibû bê ka ev cejna çendan bû ku ne li welatê xwe bû, bi kes û karên xwe yên zaroktiyê re rûneniştibû. Xwarin, vexwarin û mêwe di nava civatê de diçûn û dihatin; lê guh û çavên wî li bernameyeke televîzyonî bû. Rewşenbîrekî kurd li ser înkara mafên zimanî diaxivî. Bi axaftina rewşenbîrî re birînên Mam Ciwanmerdî jî diaxivîn; di bîra xwe ya tijî de numûneyên kevn û teze berawird dikirin. Di bernameyê de cih dabûne çend hevokên rayedarekî ku digot: “di rastiyê de ji sedî nodê xelqên welêt ji heman rehê ne; lewma divê em kurdan qewmeke serbixwe nehesibînin”. Lêbelê Mam dizanibû ku ev rayedar derewan dike; ji ber ku siyaseta fermî ya dewletê hebûna kurdan wekî qewm yan jî kêmjimareke etnîk pênase dikir. Êdî fêm kiribû ku siyaseta fermî ya dewletê ber bi siyaseteke nijadperest ve dimeşe; her çiqas ev tevger li ser navê neteweyekê bê meşandin jî, di dawiya dawiyê de ji bo berjewendiyên neteweya serdest xizmetê dike. Li gorî wî neteweya serwer milkê welêt derbasî zimeta xwe kiribû; bi rastî wan serwerî ji bo garantîkirina berjewendiyên xwe li dijî xelqên din bi kar anîbû.

Ciwanmerdî gopalê xwe hilda, ji hêwanê derkete baxçeyê pêşiya malê ku komeke dost-nasên wî digel çend diyariyên cejnane hatibûn malê. Êdî ji pêlekanê peya nebû û li ber şêmîkê sekinî û beşeve hat, li hêviya gihiştina mêvanan sekinî. Piştî ku yeko yeko cejna wan pîroz kir, ew vexwendine hundir. Ji aliyekî kêfxweş bû ku mêvanên wî yên ezîz hatine û ji aliyekî ve jî bêhnvedana wî ya li bin siya daran ji dêst çûbû. Xwedê bizanibe mêvan dê kengê rabûna, gelo heta rabûna wan hinekên din jî dê nehatana û dê bikaribûya piçekê li bin daran rûne? Çareya vê jî rûniştandina mêvanan li derve bû ku êdî kî bihata û biçûya ne xema wî bû. Gazî neviyekî xwe kir, ew hêvot ku xalîçeyekê li bêxçe raxin û hinek mînderan lê rêz bikin ku mêvanên xwe derxe derve. Ji xwe havînên germ mirov difetisandin, îcar dûmana cixareyan û bêhna xwihdan û xurekan jî serbarê ser bû. Bi vê çareseriya beraqil xwe avête binê siha daran û balgiyek da ber pala xwe. Mêvanên ciwan bi rêzdarî û heweskarî li rûyê wî dinêrîn ku qala rojên xwe yên berê bike; lê wî mafê axaftinê dabû hevalekî xwe yî ji pêşmergeyên dêrîn:

-Rizacan, ka hinekî qala şervaniya me ya rojên bihurî bike ku bila ciwanên me wekî diyariya cejnê bi xwe re bibin. De diyariya şivanî helekok e û diyariya kalekî jî serpêhatî ne.

-Bi Xwedê te rast got, lê heke tu devê tûrik vekî ez ê jî li cimaetê belav bikim.

Ciwanmerdî balgiyê xwe rind kire bin binçenga xwe û axaftina destpêkê vekir:

-Şervanên jîr ên berê, xwe ji îhtimalên sernişîviyê didane aliyekî û li benda firsendeke sernişîvkirina dijminî disekinîn. Li hemberî êrişên dijminî, em berpirsiyariyên ewlehiya xwe bûn. Lêbelê derfeta sernişîvkirina dijminî, di xeletiyên dijminî bi xwe de veşartî bûn. Şervanê jîr dikare li hemberî êrişên dijminî berevaniya xwe bike. Lêbelê nikare sernişîviya dijminî misoger bike.

Wekî du dengbêjên ku stranekê li hev werdigerînin Rizayî gotina wî wiha domand:

-Dibe ku mirov bizanibe bê ka çawa li hemberî dijminê xwe serkeftinê bi dest bixîne. Lêbelê mirov her car nikare serederiyê bi mercên heyî re derxe. Ewlehî di bin siya bergiriyên parastinê de ye û derfeta sernişîviya dijminî jî di rêbazên êrişê de veşartî ye. Sekna di rewşa berevaniyê de kêmasiya hêzê nîşan dide û ji bo êrişê jî hêza xurt pêwist e.

-Mamên hêja, ev nifşa nû, bi gotina rasttir, ev nifşa ku tevî rojên we yên şer nebûye ji rêziknameyên leşkerî û berxwedanê zêdetir bêriya dîrokê, leheng û bûyerên wê dike, -got ciwanekî ku cil û bergên kurdî li xwe nekiribûn-.

Her du kalemêran qe xwe li wan erdan daynena û govenda gotinê dîsa gerand:

-Serfermandarê ku di xweparastinê de jîr e, xwe di qatê nehan ê erdê de vedişêre.

-Serfermandarê ku di êrişbirinê de jîr e jî mînanî berqa birûskê ji barekê nehan ê esmên dadikeve xwarê.

-Wisan e ji aliyekî ve divê em bikaribin xwe biparêzin û ji aliyekî ve jî divê em bikaribin serkeftineke bêkêmasî bi dest bixînin, -got û dîsa tevî axaftinê bû, ew ciwanê ku gavek berê daxwazek kiribû-. Serkeftina ku mirovekî ji rêzê jî tê digihêje ku êdî bi dest ketiye ne lûtkeya serbilindiyê ye.

Kalemêran bi devekî ken û bêyî xeyidîn çav kire hev; lewre Ciwanmerdî wekî ku gotina ciwanê devbelaş temam bike got:

-Heke tu şer bikî, bi ser bikevî û hemû endamên tevgerê ji te re bibêjin *'aferîn'* jî ne lûtkeya serbilindiyê ye, -di peyva dawîn de devê xwe nêzikî guhê Rizayî kir û bêjeya /ye/yê wekî /yaaa/yeke dirêj bi lêv kir; lewre Rizayî jî bi mînakekê piştgirî da hevalê xwe-:

-Ji erdê bilindkirina belçikekî payîzê ne nîşaneya xurtiyê ye; dîtina tav û hîvê ne nîşaneya jîrçaviyê ye û bihîstina dengê birûskê jî ne nîşaneya guhsivikiyê ye.

Ev ciwan xwendekarekî kurd ê li Ewropayê bû, piştî Raperînê dê-bavên wî koçî wir kiribû û zarokên xwe di zanîngehên baş de dabûne xwendin; lê kêmasiyeke wan hebû ku ji urf-edet û çanda gelê xwe dûr jiyabûn. Govendên berê yên ku ji aliyê du stranbêjan ve dihatin gerandin nedîtibûn; li dîwaneke dengbêjan rûneniştibûn ku heman stranê ji aliyê çend dengbêjan ve bibihîzin. Herwiha beşdarî hevdîtineke pêşmergeyên dêrîn nebûbû ku ew jî rêziknameyên leşkerî bi şêweyê dengbêjan li hev werdigerînin û civata xwe agehdar dikin. Ciwanmerdî dizanibû ku ev xortê ter û can mîna caniyekî ye: ne zîn li piştê ketiye ne jî gem li dêv; ne qemçikê siwarekî lê ketiye ne jî bi hespên bezê re rabûye çargaviyan; şîrê maka xwe tenê mêtiye û tenê ligel maka xwe çêriyaye. Lewre gotina xwe domand:

-Mirovê ku pêşiyan jê re digotin *şervanê kone* ne ew kes e ku cengê tenê qezenc dike, lêbelê ew kes e ku bi lezgînî û asanî serkeftinê bi dest dixîne. Her wiha serkeftinên şervanê kone kûrahiya zanatiya wî diçespînin û wêrekiya wî xar dikin.

-Şervanê kone bêyî ku di şerên xwe de xeletiyê bike bi ser dikeve; herwiha di şeran de bêxeletî, duristkarî û tivdîr teqeziya serkeftinê rave dike. Ji ber ku bêxeletî tê wateya dîlgirtina dijminekî jihevdeketî. Herwiha şervanê jîr baregeha xwe di cihekî wisan asê de datîne ku sernişîvkirina wî ne pêkan be û ji bo sernişîvkirina dijminî jî ew tu firsendê ji destê xwe nake.

Mam Ciwanmerd wekî ku ji teşeyê rûniştina xwe aciz bibe, balgî guhaste aliyê xwe yê din û gotina xwe domand:

-Di şeran de, fermandarê rênas pêşiyê serkeftinê garantî dike û paşê dikeve cengê. Ji ber ku mebesta wî ew e ku di şerê pêşîn de dijminî sernişîv bike û paşê jî berê xwe bide serkeftinê.

-Serokê jîr li gorî zagona exlaqî tev digere, pergala giştî baş diparêze û bi vî awayî derfetên serkeftinê dixe bin fermana xwe.

-Di feraseta leşkerî de pênc hêmanên hunera cengê hene:

-Yek, xêzkirina nexşeyan e.

-Yek payîna derfetên dijminî ye.

-Yek jimartina hêzên dijminî ye.

-Yek, berawirdkirina her du hêzan e.

-Ya dawîn jî encama cengê û îhtimalên serkeftinê ne.

Ciwanê devbelaş êdî ne gotin dibirî ne jî tevî axaftinan dibû. Tenê li rû û tevgerên her du pêşmergeyên dêrîn dinêrî. Diyar bû ku her du camêran jiyana kurdewariyê ya govend û dîlanan ji xwe re mînak girtine; bi wê uslûbê tekstên xwe yên leşkerî ji ber kirine. Dibe ku beriya êriş û raperînan, dibe ku di amadehiyên rojane de, dibe ku piştî serkeftinekê bi vî qaydeyî ezberên xwe zindî kiribin. Lewre divê sebr bikira, rêz ji civatê re bigirta û bi pirsê biçûya Xursê. Ew di nava van nirxandinên derûnî de noq bûbû ku Mam Ciwanmerdî dîsa dest pê kiribû, bi rastî wisa xuya dikir ku westiyabû û dê gotinên xwe bigihanda encamekê:

-Xêzkirina nexşeyan li gorî rewşa erdnîgariyê teşe digire; payîna derfetên dijminî girêdayî xêzkirina nexşeyan e; jimartina hêzên dijminî bi riya payîna derfetên dijminî tê bidestxistin; hevrûkirina her du hêzan li gorî jimartina hêzên dijminî tê amadekirin û encama cengê jî piştî hevrûkirina her du hêzan diyar dibe.

-Mînaka artêşeke serkeftî ya ku derdikeve pêşberî artêşeke belawela dişibihe terazûyeke ku di tayekî de kîloyeke mengiranî heye û di tayê din de jî livek genim hatiye danîn. Bizava hêzeke serkeftî dişibihe ava şîpekî ku ji çavkaniyeke pir bilind bilq vedide û di kendalekî pir kûr de tê

xwarê.

Her du yan jî rahiştine şûşeyên avê yên li ber xwe û çend gulmên xurt lêxistin. Mam Ciwanmerd hinekî westiyayî, lê wekî werzişvanekî serkeftî bi kel-bîn axivî û pirsa vî ciwanî kir. Çend kesên ku wî ji nêzik ve nas dikin navê ciwên, dê-bavê, êl-eşîrê pênase kirin. Mam Ciwanmerd qe bi ciwên re neaxivî û zivirî ser Mam Rizayî û got:

-Keko, me cara dawîn kengê ev metnê leşkerî xwendibû? Tê bîra te gelo?

-Çawa neyê bîra min? Rojên raperînê nêzîk dibûn û me amadehiya xwe ya şerekî berwext dikir. Çek û posat hatin belavkirin, her kesî barê xwe hilda û ber bi kozika yekîneya xwe çû. Êvarekê me agirekî xurt pêxistibû û li dorê rûniştibûn, me çay vedixwar. Fermandarê me ji nişkê ve ferman da ku çend heval rabin, li deh-panzdeh cihan agirên ji hev dûr û ji vî agirî geştir pêxin û vegerin kozikê.

-Belê, me bi lez agir dadan û em vegeriyane çeperê. Fermandêr pêşiyê ev metnê leşkerî xwendibû û paşê bi me dabû nivîsandinê. Tevgera me li gorî vê nivîsê teşe digirt, me gelek êvaran nîqaş li ser bendên wê kirin.

-Carinan me hilperke dilîst û stranên gelêrî digotin. Rojekê fermandêr pêşniyar kiribû ku stranên gelêrî cil û nivînan tînin bîra me û divê em li ber sirûdên leşkerî govend bigirin. Piştî çend ceribandinan, me nihêrî ku wisa jî dibe.

-Îcar pêşmergeyê rehmetî Mela Bişar jî pêşniyar kiribû ku bi rêbaza feqîh û melayan metnên xwe ji ber bikin. Me ew jî ceriband û êdî metnên xwe yên leşkerî bi meqamkî ji ber kirin.

Ciwanê ku gotina her du kalemêran birîbû ji şerman soromoro bûbû. Mam Ciwanmerd li saetê nihêrî û gote mêvanan:

-Gelî hevalan, em pêşmergeyên melayekî ne û ew mela jî pêşmergeyê qaziyekî bû. Her duyan jî nimêj dikir û nimêja li pey wan zewqek bû. Îcar hema hema dike ku banga nimêja nîvro bixwîne, destnimêja kê tuneye kerem bikin, destşok li milê çepê ne.

Ciwanê xwenda xwarî li ser guhê ciwanekî li kêleka xwe bû û di guhan de tiştek got. Wekî ku telefonek jê re hatibe, amûr da ber guhê xwe û ber bi dergehê bêxçe çû û piştî çend kêliyan ciwanê din jî da pey wî. Dengê siwareyekê hate bihîstin, hinek rabûne destnimêjê û hinekan ji xwe re mijareke axaftinê dît. Bi banga melayî re hêdî hêdî sefên nimêjê hatin girtin û bi hevoka paşîn a bangê re Mam Ciwanmerdî li pêş cimaetê tekbîra nimêja nîvro anî.

***

Piştî nimêja nîvro destexana xwarinê hatibû danîn û xurekekî goştî digel birinc û seleteyê hatibû danîn. Mêvan rêz bûne ser destexanê, geh dengê kevçiyan û milçemilça devan dihate bihîstinê geh kurtepistên wan. Hê ku piraniya mêvanan li ser destexanê bûn ciwanê zimandirêj digel hevalê xwe bi cil û bergên kurdî di dergeh de kete hundir, bi gavên şermoke li kêlekekê rûnişt, jê re xwarin hate danîn û her duyan bêdeng xwarinên li pêşiya xwe xwarin. Piştî xwarinê mêvan vekişiyan ser mînderan û balgî danîn ber parxanên xwe. Her du ciwanan jî berê xwe dane her du pêşmergeyên dêrîn, hem lêborîn xwestin hem jî xwe dane naskirin. Ciwanê ku gotin birîbû, devbelaşî kiribû wiha dest pê kir:

-Gelî hêjayan, ez Salarê Hikmekê Sindî me ev jî kurmamê min ê Rizgar e. Em her du jî ji bo betlaneyê hatine şûnwarê bav-kalên xwe. Bi salan e em li Ewropayê ne û me gelek aliyên xwe yên kurdeweriyê ji dest dane. Ji destpêkê de me cil û bergên xwe danîne dolaban û tenê di rojên taybet de li xwe dikin. Me zimanê xwe daniye malê, em pirî caran li derveyî malê dimînin û gava vedigerin nav malbatê bi kar tînin. Me mezinên xwe li vir hiştine, her sal yek an jî çend hebên wan diçin rehmetê û dîroka me jî pê re diçe binê xweliya sax.

Mam Ciwanmerd hinekî di ber dilê wî de hat û xwest ku mijara lêborîn û gilî-gazinan biguherîne:

-Biraziya beriya ku hûn werin, min bernameyeke televîzyonî temaşe dikir. Di hinek dîmenan de rayedarên dewletê dest bi înkarkirina qanûnên xwe kiribûn, wekî ji gelê xwe re bibêjin: dema qanûnê qediya; dem dema eşkerekirina armanca rastîn a desthilatdariyê ye, bila ji bilî me kesek li

welatî nejî.

-Bi Xwedê, min jî derbarê vê yekê de du meqaleyên rewşenbîrekî xwendin ku hişê min tev li hev bû. Li gorî gotina rewşenbîrî kurdan hertim xwe wekî neteweyekê pênase kiriye û desthilatdaran jî pêşiyê kurd wekî qewmeke cihêreng bi nav kirine; lê niha dest pê kiriye ku kurdan wekî bin-neteweyeke nenas nîşan bidin. Serê we neêşînim, mijar bi rastî jî xeternak e.

-Biraziya tu gotina xwe berdewam bike û ez ê rojnivîska xwe ji malê bixwazim.

-Belê, wekî ku min got mijar xeternak e. Alîkarê taybet ê serokê dewletê wan rojên han kurd û qewmên din wekî ji yek rehê hesibandine û gotin aniye ser wê yekê ku meşrûiyeta zimanî-etnîkî ya van neteweyan tuneye.

-Tu encama gotara wî rewşenbîrî ji min re bibêje heta ku rojnivîska min hat.

-Belê, rewşenbîrê kurd dibêje ku navendîkirin û asîmîlekirina rêveberiya dewletê ji zû ve dest pê kiriye.

-Biraziya min ji bîr kir ku bipirsim, xwendina te çi ye?

-Min beşa dîrokê qedandiye û niha jî mastera xwe li ser kurdan amade dikim. Piraniya çavkaniyên erebî yên klasîk kurdan qewmeke cuda dihesibînin û hinek çavkaniyên rûsî û ewropî jî wisa dibêjin.

-Were vir, li kêleka min rûne û dîroka van rojnivîskên min binêre.

Salar bi kêf û şahiyeke nedîtî ji cihê xwe çik rabû ser xwe, bi lez hate cem Mam Ciwanmerdî, li rûpelên rojnivîskê çavên xwe gerandin û bi xemgînî got:

-Min bizanibûya ev berhema te heye, min ê mastera xwe li ser wê amade bikira.

Mam Ciwanmerdî berê xwe da Mam Rizayî û jê pirsî:

-Kekocan temenê min û te çend e?

-Ez heştê û çar salî me, lê tu du salan ji min biçûktir î?

Vê carê berê xwe da Salêr û jê pirsî:

-Îsal kîjan sal e û rojbûna min rastî kîjan salê tê?

-Îsal 2018 e û rojbûna cenabê te 1936 e.

Mam Ciwanmerdî tiliyeke xwe kire nava rûpelên rojnivîskê, carekê li beşdaran û carekê jî li Salêr nihêrî û bi hemdê xwe pêşniyar kir:

-Biraziya madem ku tu dîroknas î derheqa damezrandina vê dewletê de çi dibêjî? Dîroknas gotî, stratejîst gotî. Îcar piştî axaftina te camêrî ez ê jî rê bidime rûpelên vê rojnivîskê û bila ramanên min wê çaxê ji te re bibêje. Binêre, şerm û tirs tuneye. Ji bilî min kesî ev rojnivîsk nexwendiye û ev cara yekem e ku nîşanî mirovan dikim.

Salêr serê xwe kire ber xwe, hinekî lêvên xwe cûtin û diranên xwe çirikandin; paşê serê xwe bilind kir, rast li navçava Mam Ciwanmerdî nihêrî û dest bi axaftinê kir:

-Mamê hêja, tu bawer bike ev gotinên ku ez ê niha bibêjim jî teze ne û cara yekem li cimaetekê dibêjim. Îcar, dema ku dewleta kevn carekê hejiya û serhildanên biçûk dest pê kir desthilatdar tirsiya û derkete derve. Dema muxalif hatine ser kar lîsteyeke dijberên dewletê dane serokê nû; pêşniyar kirin ku li dijî wan şer bike. Di vê navberê de merivên xwe yên sûcdar di bin siyê de hiştin û ji neteweyên din sûcdar kifş kirin. Di lîsteyê de piranî giregirekên kurd û çend xasmirovên desthilatdarê kevn hebûn ku planên wan xera dikirin. Lewre divê paqijiya riyê ji kurdan û herêmên kurdan dest pê bikira. Wisa jî kirin û îsal sala 2018an e. Êdî dewlet bi tevahî di destê neteweyekê de ye û hemû neteweyên din kişkişî ser kurdan dikin.

Piştî vê axaftinê Mam Ciwanmerdî sipasiya wî kir, ji bo ramanên wî yên kûr niyazên serkeftinê jê re xwestin, tiliya xwe ji nava rûpelan derxist û wiha dest bi xwendina rojnivîska xwe kir:

-13.10.19... Îro min li kolanên bajêr dît ku bi xişmî êrişî ser xwepêşandanan nakin. Wekî ku hinekan ew şîret kiribin. Tu dibêjî ew dê bereya xwe biguherin û derbasî aliyê din bin. Bi vî awayî ew dê jiyan û meqamên xwe hildin garantiyê. Tiştê balkêş ew e ku têkiliyên xwe bi kurdan re baş dikin. Gelo ev tevgera wan ji bo sîxuriyê ye yan bi mafên kurdan bawer dikin? Bi texmîna min ev gurên devbixwîn dê têkevin nava gel, agehiyan kom bikin û wekî dosyeyên amade pêşkêşî rêveberiya nû bikin. Bi vî awayî dê agir berdine loda kurdan hêkerûna xwe li ser çêkin. Ka em binêrin dê çawa be.

Mam Ciwanmerdî li der û dora xwe nihêrî, kire niçeniç, kesî fehm nekir bê ka çima wisa kir; lê wiha axaftina xwe berdewam kir:

-Gelî mêvanan ez ê zêde dirêj nekim û tenê hebekê jî bixwînim: 17.04.19.... Îro sancûyeke xurt ketiye zikê kurdan ku di destê desthilatdariya nû de hinek lîste hene. Li gorî van lîsteyan li mirovan digerin. Ew mirovên ku tên girtin, ji aliyê dadgerekî dewletê ve tên darizandin. Piraniya kes û karên girtiyan dibêjin ku hinek merivên qaşo dostên malbatan li dadgehan şahidiyê dikin ku ev kes neyarên dewletê ne. Heta niha dewlet ewqasî neketibû nava kûrahiya civaka kurd. Ewên ku duh bi navê dostiyê nêzikî me dibûn, îro wekî dûvpişkan bi canê me ketine. Hawar Xwedêyo!

Çavên Ciwanmerdî tijî bûn, rojnivîsk girt, kir hundirê kîsekî dîsa şande malê. Êdî her kesê beşdar fehm kiribû ku şahidê bûyerê û rexnegirê dîrokî di cihekî digihiştine hev.

**Enerjiya Mêrê Dujinî**

Kevirê Siwaran zindarekî mezin ê li ketina gundê Zêrefşanê bû ku siwarên hespên beza li vê derê kom dibûn; paşê bi bezeke orxe heta Pireya Malîavayê hesp dibezandin û ji wê derê pêşbaziyê dest pê dikir. Piraniya pêşbaziyan di dawetan de çêdibû; lê carinan mêr diketin mercê û bêwext jî hespên xwe dibezandin.

Miraz li hinda Kevirê Siwaran digel komeke hevalên xwe rûniştibû û derbarê kar û barên gundîtiyê, cotyariyê û sexbêriya ajalan de diaxivîn. Demekê nihêrî ku kurê wî bi hilkehilk hat û xwe gihande bavê. Bavê û hevalan mereq dikir bê ka ev zarok dê piştî bêhnstandinê çi bibêje. Zarokê bêhnçikiyayî bi çend kêliyan rawestiya û ji bavê re got:

-Bavo kera cînarê me ketiye ser loda me?

-Ê, kurê min ker heywaneke bê zar û ziman e, ev tişt dibe û mumkin e. Îcar te çi kir? Ma te bernedayê?

-Na bavo, ez hatim ku ji te bipirsim bê ka çi bikim.

Mirazî carekê li kur û carekê li hevalan nihêrî; serê xwe berjêr kir û bi kulzikî gotê:

-Baş e, kurê min here berdê û ji zarokên cînaran re jî bibêje ku min gotiye bila xwedî li kerê xwe derkevin.

Kurikî bi heman reva ku ber bi bavê hatibû, herwisa ber bi bêderê reviya ku biçe û kerê ji ser loda gihayî derxe; ji cîranan re temeya bavê xwe ragihîne. Miraz serî di ber de hinekî hênijî, xatirê xwe ji hevalan xwest û berê xwe da malbavana xwe.

Bav li ser kevirê bêriyê rûniştibû, saqa destîtevrekî gurûs dikir ku bavêje ser tevrê li pêşberî xwe; kekê wî ji bi telefona destê xwe ketibû înternetê û carinan bersiv dida hinekan. Her du jî di alemeke cihê de bûn: yek î li gund bû, amûreke gundewariyê amade dikir û yê di din li aleme nîgaşî bi hinekan re galegaleke nivîskî dikir. Lê hevpariyeke her du camêran jî hebû ku nediaxivîn, ji bilî teqeteqa bavê û îskeîska kenê kekê wî tiştek nedihate bihîstin. Bi silava Mirazî re her du jî veciniqîn, ji alemên xwe derketin û hatine ser lisfê mirovan; lewre jî axivîn û silava wî wergirtin.

Qadir Çawişê bavê Mirêz -heweskarê xebat û xîretê- bêyî ku dev ji karê xwe berde diaxivî; lê kekê wî yê Emerî telefona xwe şîşî bêrîka xwe kir û bi birê re eleqedar bû. Piştî halpirsîn û xwestina îskaneke avê ji ehlê malê, biryar da ku zêde dirêj neke û sedema hatina xwe ji bav û birayî re bibêje. Hate bîrê ku bavê wî yê ku di leşkeriyê de çawiştî kiribû û gelek rêziknameyên leşkerî kiribûn stûna jiyana xwe carinan digot: “Ji aliyê rêbazan ve rêvebirina hêzeke giran û hêzeke sivik dişibihin hev. Ferqa di navberê de tenê dabeşkirina jimarên van hêzan e.” Lewre nekete şikê ku li pêşberî her duyan biaxive û pirsgirêka xwe vebêje; heke îdarekirina merivekî û diduyan mîna hev be wisan e: “Ew hêza ku di bin fermana te de tevî şeran dibe hindik be jî zêde be jî wekî hev in. Rêvebiriya her du hêzan jî bi riya bikaranîna raz û nîşaneyên leşkerî tê pêkanîn.” Li gorî rêbazên bavê xwe, divê yan bav hilda aliyê xwe yan jî kek. Pêşniyar û ramanên ku di hişê xwe de digerandin nêzikî jiyan û dîtinên bavê bûn; lewre li kêleka bavê rûnişt, tevşo ji dêst girt û karê wî berdewam kir; lê divê ew kurmê ku ketibû laşê wî derxista. Him serê destîtevrî tuj dikir him jî dipeyivî:

-Bavo, te qe nego kurê min “ne eyd e ne erefat e ev çi xêr-bereket e”?

-Tu kurê min î, hatiyî mala bavê xwe, te mijûliya bavê xwe dîtiye û alîkariya wî dikî. Ma min destê xwe bîn kiriye ku bizanibim di hişê te de kîjan rovî li pey kîjan nêçîrê ketiye? De ka bibêje ku em jî pê bihesin.

Mirêz nihêrî ku bavê wî rê dayê, li kekê xwe nihêrî û ji bavê pirsî:

-Bavo, em ji te re bêxêr bibûna tu dê li ser diya me bizewiciyayî?

-Îcar ev ji ku derket? Madem tiştekî wisan tuneye, serê ku neêşe divê meriv bi bendan girênede.

Kekê wî ji cihê xwe rabû, cixareyek sotand û got:

-Ez ji dîdara we têr nebûm, ez ê serîkî heta Kevirê Siwaran herim; binêrim ka gundî qe çi dikin.

-Ez ji wir têm, gava biraziyê te hat û pirsa min kir bibêjê “te karê xwe qedandibe hewce nake bavê xwe pê bihesînî, jixwe divê te bêşêwr wisa bikira”.

Kekê wî dîsa li cihê xwe rûnişt û fêm kir ku kuleke birayê wî heye. Piştî ku gumeke xurt li cixareyê xist û dûmana wê ji dev û pozê xwe re berda gote birayî:

-Tu dibêjî qey tu bi xeyd ji Kevirê Siwaran hatiyî û tatêlek ketiye dil û hinavên te. Ka bibêje çi qewimî?

Mirêz bûyera kera cînêr serdanpê ji her duyan re vedigot ku xwişkê îskana avê dirêj kirê û xêrhatiniya wî kir. Beriya ku avê vexwe îskan dirêjî bav û kekî kir; lê jê re noşîcanî xwestin. Piştî ku ava xwe di sê guman de vexwar, elhemdulillahek kişand û sipasiya xwişkê kir.

Li gorî rêbazên bavê yên ku hertim ji wan re digot “divê tu çend minawereyên rasterast û nerasterast pêk bînî û dijminî bixapînî da ku hêza te bikaribe xwe li ber dijwariya êrişa wî ragire û neşkê” diviyabû babeta xwe gav bi gav şîrove bikira. Herwiha diviyabû malbata wî wekî zinarê dijberî hêkekî xurt û bandorker bibûya ku bikariba li hemberî zext û fişaran xwe ragirta. Ev jî bi riya zanîna xalên lawaziyê û xurtiyê yên bav û birayî ve pêk dihat. Dibe ku gotina wî şer û pevçûnek derxista; bi rastî jî cengeke di navbera çend malbatan de dest pê bikira.

Mirêz ji fêrbazî, fêlbazî û şerbaziyên bavê xwe zehf tişt hildabûn; dizanibû ku di her pevçûnê de rêbaza rasterast ji bo ketina cengê tê bikaranîn û rêbazên nerasterast ji bo parastina serkeftinê pêwist dibin. Heke rêbazên nerasterast bi awayekî serkeftî bên bikaranîn vebijêrk zehf in û qet naqedin, wekî herka rûbar û lehiyan qet namiçiqin, wekî tav û hîva ku ji ber çavan winda dibin û cardin hiltên, wekî çar demsalên ku diçin û cardin vedigerin. Wî baş dizanibû pênc newayên mûsîqayî yên sereke hene, lê ji vî pênc hebî ewqas newa tên bidestxistin ku hinekên wan hê hê jî nehatine bihîstin. Pênc rengên sereke hene: “hêşîn, qîçik, sor, spî û reş”; lê ji van rengan ewqas reng tên bidestxistin ku hê hê jî çavan hinekên wan nedîtine. Tenê pênc çêjên bingehîn hene: “tirş, tûj, şor, şirîn û tehl”, ji van çêjan ewqas çêj tên bidestxistin ku hê hê jî hinekên wan nehatine tehmkirin.

Gelo çawa dê bikaribûya malbata xwe û malbata jina xwe razî bike ku li dijî pirzewaciya wî dernekevin, teşqeleyan dernexin, agirê fitneyekê pênexin û eşîrê ji hev de nexin. Jina wî keça xalê wî bû ku xal jî pismamê bavê wî bû. Pîrikên her du seriyan bi hev re berdêlkirî bûn û ji koka darekê bûn. Bi rastî ji malbata jinê û ji ya wî gelek kesan du-sê jin anîbûn; digel tehlî-tengasiyan jiyanên xwe bihurandibûn; zarokên wan li hev xwedî derdiketin û li pêşberî xelqê yekdest û yekgotin bûn. Her çiqas di nava hev de rikberê hev bûn jî di roja teng de kesî nedigot bê ka ew ji kîjan diyê ye, birayê ji diyê ye yan ji jinbavê ye; lê dîsa jî mijar çetin bû.

Mirêz biryar da ku dîtinên xwe yên îro bi kekê xwe re pareve bike û jê pirsî:

-Keko bihesibîne ku em hê zarok in û kera cîranê me ketiye ser loda me ya gihayî. Te dê çi bikira?

Kekê wî bi hemdê xwe û bi xwe ve arxayîn:

-Helbet min ê berdayê û bi ser de gazî mala cînêr bikira ku xwedî li kerê derkevin, -got û bi awayekî şaşmayî jê pirsî-: îcar ev ji ku derket? Pirsên te yên îro gelekî ecêb in, tu li ser hemdê xwe yî? Bibêje ka çi qewimiye? Çima gotinan bi ber me re diavêjî? Bizin li çolê avis dibe û li gomê dizê.

-Keko ez îro li nav hevalan bûm û me ji xwe re li hinda Kevirê Siwaran qala gund û gundewariyê dikir. Îcar biraziyê te bi kel-bîn xwe gihande min û bi wê pirsa ku min ji te kir hişê min çelqand. Got ku “bavo ker ketiye ser lodê ez çi bikim?” De îcar were nehele. Ma ev pirsa kirinê ye, ma ez kordunde me, warreş im?

Kela kekê wî jî tijî bû û bi ser de hat, destê xwe li sermila wî xist û got:

-Zarokên berê wisa bûn, ev nifşa nû hinekî mîna mirîşkên makîneyê ne; gava tu kiş dikêyî zûr dibin û li te dinihêrin. Heta ku fera solekê yan jî kotikeke gêziyê lê wernekî narevin û ber bi karekî ve naçin. Zarokên te yê li ber destê te mezin bin û şûna te bigirin. Bêhna xwe fireh bigire mal avayo?

Li gorî Mirêz divê qe ev nîqaş derneketena, tiştê di urf-edetên kurdan de heyî divê bêyî nîqaşan bihatana sepandin û muxalefet derneketa; lê dizanibû ku kekê wî heta astekê rast dibêje û ev nifşa nû ne tenê mirîşka makîneyê ye; ji hêkine makîneyan e ku dîsa ji mirîşkeke makîneyê hatiye bidestxistin. Ji xwe re got: “Mirazo, şerê te dest pê kir, ev xweşronekên lo loyê ne û hê zivistana lê lê jî maye.”

Êdî dizanibû ku divê rêbazên bavê xwe yên şer bi kar bîne. Bavê wî her car digot û dibiland: “Di şeran de tenê du rêbazên êrişbirinê hene -a rasterast û a nerasterast-, lê ji van her du rêbazan rêzeçalakiyên bêpayan derdikevin holê. Di dawiyê de her du rêbaz jî digihêjin heman encamê.

Bikaranîna her du rêbazan dişibihe meşa di hundirê çenberekê de û tu carî dawî li vê meşê nayê. Nexwe kî dikare ji bo van rêbazên lihevxistî jimareke misoger bide?”

Kekê wî mijar fêm kiribû; lê xwe li wan erdan daynedinî û bavê wî xwe kerr kiribû, bi kelbetanan gotin ji dêv nedihate kişandin. Giran giran Qadir Çawîş tevî qanîkirina kurê xwe bû û bi hêrs got:

-Kurê min, parsenga devê min xera neke, g*yê ku te duh kiriye hê hişk nebûye. Te çûye keça eqrebeyê xwestiye û doza dujiniyê dikî, Xwedê bizanibe çendjiniyê dikî.

Mirêz li vir derfeta nermkirina mijarê dît, dest bi laqirdî û asayîkirina mijarê kir:

-Welleh parsenga devê te taca serê me ye, ji kerema xwe tacê daynene û kersengekî kermeyan nede ser serê me. Gava baran li me bike kerseng dê şil bibe, bi ser me de birije û em ê nikaribin derkevine nav cimaeta misilmanan. Ka jina diduyan bi dest min ketiye ku çav berdime pirjiniyê Xwedê jê raziyo?

-A wisa were îmanê, dilê te bi zewacê heye û tu hatiyî me qanî bikî. Bi rastî tu dixwazî ji bo doxîna derpiyê xwe werîsê me bifroşî qereçiyan. Malxezûrana te mîna artêşekê ye û tiştê kambax hemû jî li dora mala te bi cih bûne. Îcar êrişa hêzên çekdar dişibihe herka lêkendeke ku keviran jî total dike û bi ro de dibe.

Mirêz hêviya xwe ji piştgiriya bavê xwe nebirî û armanca xwe li ser gotina wî ava kir:

-Hêjatiya biryarê dişibihe daqûlbûna bazê ku di demeke bikêrhatî de êrişê dibe ser nêçîra xwe û nahêle ku bipirpite. Ma mirov nikare mala xwe bar bike cihekî wisan ku minasibî pêwistiyê ye? Ma ez cîranê Keibeya Şerîf im ku ji cihguhastinê bitirsim. Ew mîna artêşekê bin jî ez ê bi qasî quweta xwe bibim şervanê jîr; di êrişa xwe de destsivik û di biryardana xwe de jî zêhnsivik bim.

-Ez nizanim te ev enerjî ji ku hildaye û berê xwe daye min belengazî. Ji bîr neke ku enerjiya zêde mîna kevanekê ye ku tîrê wê hatiye rakişandin; biryara bi lez û bez jî tîra ku berê xwe daye armanca xwe ya diyarkirî.

Ev axaftina bi ser şibihandinan re kêf û hêviya Mirêz sist nekir û dîsa bi zimanê bavê xwe got:

-Heke hêzên te perwerdekirî û amade bin her çiqas di nava geremol û heytehola cengê de belawela xuya bibin jî di rastiyê de ew belawela nebûne. Her çiqas di nava alozî û xirecirê de ser û berê hêzên te tev li hev bibin jî di rastiyê de ew dûrî sernişîviyê ne.

-Kurê min, heta ku dîsîplîna hêzên te berkemal nebe xwe li bêpergaliyê daynene, heta ku wêrekiya te tunebe xwe li tirsonekiyê daynene, heta ku tu hêzdar nebî xwe li lawaziyê daynene. Em ne zarokên duhî ne, me bi qasî porê serê xwe dinya dîtiye û em ji hatî-çûyiyan natirsin; lê divê pişta te bi gelek tiştan ve jî araxayîn be.

Hevoka bavê ya “divê pişta te bi gelek tiştan ve jî arxayîn be” wekî çakûçekî li sêrî ket; wekî ku li benda sivikbûna jana lêxistinê bisekine û xwe berhev bike hinekî rawestiya. Di dilê xwe de fikirî: “Bi rastî heke te hêza xwe ya birêxistinkirî di dilqê bêpergalan de veşartibe ev tê wê wateyê ku te hêza xwe baş dabeş kiriye. Lê heke te ji bo rojên reş enerjiyeke pêwist berhev kiribe êdî tu dikarî wêrekiya xwe di dilqê newêrekan de nîşan bidî. Her wiha divê hêzên te baş têgihiştibin ku veşartina xurtiyê ya di dilqê lawaziyê de tenê tevgereke taktîkî ye ewqas.”

Miraz hinekê bê deng û tevger rawestiya û paşê rabû piyan; wekî bibêje ku “îro ewqas nîqaş bes e”:

-Bavo, divê wexta Kek Emer got “ez ji dîdara we têr nebûm” û dê biçûya nava gund, ez jî pê re biçûma û min ewqasî acizî nedaya te. De dîsa jî heqê xwe helal bike, hema ez ber bi holika xwe herim baştir e.

-Kurê min, ez aciz nebûme; lê ji bîr neke ku di van karan de neyartî û teşqele çêdibin. Kesê ku di xapandina dijminî de hunerwer e, -ji ber ku dijmin li gorî helwestên wî dikeve tevgerê- divê vê temtêla xwe hetanî dawiyê berdewam bike û dijminî kaşî kemînê bike.

-Bavocan, min ji kesî re kemîn dayneniye; tenê pêwistiyeke min bi jineke jîr ku zarokên jîr jê bikevin heye.

-Divê tu berjewendiyên dijminî têxî bin destên xwe, da ku ber bi te ve bikudîne û bibizde. Wê hingê tu dê jî digel mirovên xwe yên bijartî li benda wan bisekînî da ku wan daqurtînî.

-Tu dîsa hatî eynê şûnê bavo. Ne şer derketiye ne jî ez şervan im; min tenê dixwest..

-Xem û tatêla şervanê jîr yekîtiya hêzên wî ye û zêde bi takekesan de nakeve. Bi vî awayî mirovê herî bikêrhartî datîne cihê ku heq dike û ji yekîtiya hêzên xwe sûdê werdigire.

-Welleh billeh, eybeke jina min tuneye. Her çi ku mijara zarokan e, hinekî nesîb û qismet e. Ji weliyan dikevin xwelî; ji xweliyê radibin welî.

-Dema ku ev şervan bikaribe yekîtiya hêzên xwe biparêze, wê hingê mirovên wî yên şerkar jî wekî zinarê ku berejêr digindire çalak dibin. Ji ber ku xwezaya zinaran wiha ye: Heke li erdekê rast bin bi dijwarî dileqin, lê heke li hevrazekî bin him zû dileqin him jî bi lez digindirin. Her wiha heke ev zinarê gindirandî çargoşeyî be dê zû bisekine, lê heke girover be jî her çiqas bixijike dê zêdetir ber bi pêş bipeke.

-Gava enerjiya komeke şervanên jîr derdikeve holê, dişibihe gindirîna zinarekî girover î ku ji çiyayekî pir berejêr û bilind tê berdan. Erka enerjiyê jî heman tişt e. Di vê babetê de gotina min a dawîn ev e û ez ê careke din vê mijarê venekim. Madem ku te şerek daye ber xwe, îcar ji te re quwet be; lê van gotinên min jî dîsa dîsa di hişê xwe de bigerîne. Dibe ku hinek niha û hinek jî paşê bi kêrî te werin.

Emer kete milê birayî û xwest ku hinekî bêhna Mirêz fireh bike û ji van gotinên bavê wî yên mînanî zinaran dûr bixîne. Ji baxçeyê malê derketin û ketine kolana ku rast diçe ser Kevirê Siwaran. Emerî hêdîka dest bi axafinekê kir:

-Rehmetiyê kaliko ji min re qala du birayan kiribû ku çîrokeke gelekî balkêş e.

-Rehma Xwedê lê be, nebû nesîbê min ku wî bibînim.

-Ez î deh-duwanzde salî bûm û dayê bi te hemle bû. Em li ser wan zinarên han ên li fêza gund rûniştibûn, -vegeriya ser rasta xwe, bi destê xwe cih nîşan da û gotin kudand-. Dibe ku hemla diya min texmîn kiribû, lewma ev çîrok ji min re got.

Mirêz nexwest ku herikîna kekê xwe bibire, çavkaniya peyivînê di dêv de bimiçiqîne û bêrêziyê jê re bike. Lewre ji bo teşwîqkirinê got:

-Girmegirma ewr û esmanan e; lê qe dêjnija barijê tuneye. Te ez ji mereqan kuştim, de ka bibêje çi çîrok bû ew?

-Go, merivekî heta ku bixwazî dewlemend û du kurên wî hebûne. Birayê mezin çeqelekî dera han bûye û bavê wî dizanibûye ku gava bimire ew dê zilmê li serê yê biçûk bike.

Mirêz gotina kekê xwe ya “dibe ku hemla diya min texmîn kiribû, lewma ev çîrok ji min re got” anî bîra xwe û xwest ku bibêje birayî “Xwedê neke ku em bibin du birayên çîronekan”:

-Keko, te qala birayê mezin û çeqeltiya wî kir; îcar vê bizanibe ku pîşeyê çeqeltiyê bi kubariya te nayê, bi ber xwe nekeve, -got û destê xwe li pişta wî xist, paşê jî dîsa kete milê wî-.

-Îcar, dema ku bav kete ber sekeratê gazî her du birayan kir û teme da yê mezin ku yê biçûk bide xwendinê, lê xwedî derkeve û bide zewicandinê; piştî wê êdî ew tiştekî jê naxwaze, hemî mal û milk jê re bin. Kurê mezin di bin simbêlan ve keniya û got:

-Ez benî, bi ber xwe nekeve! Înşaellah tu dê rabî ser xwe û zarokên wî jî bibînî, çima wisa bêyom diaxivî.

-Na lawo, ji wê yekê re riya min dûr e. Tu qe napirsî “bavo deynên te hene, yan jî deynê te li ser kesekî heye?” Diyar e ku piştî mirina min tu dê bikevî pey kêfa xwe; lê min ev serwet bi zehmetekî mezin da hev, wisa bike ku bila xenîmî çavên te nebe.

-Ez benî, Xwedê bisitirîne; tu nekeve tatêla malê ku te jê nexwariyê; dibe ku temenê me bi xwe jî têrê neke em dendikek şekir jê hildin.

-Kurê min, sê şîretên min li te, taybet ji bo te. Malê te zehf e, bila tava sibeh û êvaran li serê te nexe, hefteyê carekê bizewice, bila li her gundî maleke te hebe, heke tûşî tengasiyekê werî apekê te li filan bajarî ye û ber bi wî ve here, -got û devê wî kete hev-.

Kurê mezin li bavê nihêrî ku êdî ji axaftinê ketiye û bi çavan hinek tiştan dubare dike, êdî qinyat anî ku bav dimire. Welhasil bav dimire, şîn diqede. Kurê mezin destê birayê xwe digire, kûpek zêr bi xwe re hildide, berê xwe dide medreseya alimê herî navdar û wî teslîm dikê. Dema xatirxwestinê tê û birayê mezin vedigere ser melayî dibêjê:

-Seyda, vî kûpê zêran hilde, ez bi te û tu bi Xwedê! Bavê min ditirsiya ku ez para birayê xwe bixwim û zilmê lê bikim. Lewre teme da min ku wî bidime xwendinê. Îcar dibe ku gotina bavê min rast derkeve û ez bi çeqeltî heqê wî bixwim. Ez merivekî nexwendî me û te jî temenê xwe di riya

dîn de pûç kiriye. Heke yekî mîna te jî tenezulî malê vî belengazî bike, tu wisan bizanibî qulpa dinyayê qetiyaye û êdî qiyamet dê rabe. Ji kerema xwe lê mesref bike, bi qasî hewcetiyê jê bixwe jî. Roja ku xwendina xwe temam kir wî bizewicîne û pereyê mayî bidê ku ji xwe re bike sermaye û debar.

Bi vê wasêtê ji melayî û birayî vediqete û tê ser mal-halê xwe. Çendekê li cem jin û zaroyên xwe dimîne û jinik jê re dibêje:

-Mêrik rabe ser mal-milkê xwe, kanî jî dimiçiqin; heke tu dest bi ber halê xwe re nebî ev sermaye ji te re namîne.

Radibe, dest bi wasêta bavê xwe ya diduyan dike: “Malê te zehf e, bila tava sibeh û êvaran li serê te nexe, hefteyê carekê bizewice, bila li her gundî maleke te hebe.” Pêşiyê ji mala xwe heta dikana xwe sîwanan çêdike ku tav li serê wî nexe. Paşê her hefte bi jinekê re dizewice, kêfa xwe jê direvîne û di dawiya hefteyê de wê berdide; ji bo ku yeke din bixwaze. Paşiya paşîn dest pê dike li çend gundan ji xwe re xaniyên xweşik ava dike. Gava jineke nû tîne, her rojê li gundekî pê re kêfê dike. Paşê bavên keçên berdayî ewqasî zehf dibin ku zorê lê dikin; dest didin ser mal-milkê wî û wî ji bajêr diqewirînin. Rojekê bi dizîka tê mala jina xwe ya mezin ku bavê wî jê re xwestibûye; wê şevê ji jina xwe re dibêje:

-Pitê, Xwedê bela dayiyê bavê min şîreteke wisa li min kir ku şerefa min bû pênc qurişan; lê şîreta wî ya dawîn ew bû ku gava rastî teşeqeleyan werim, divê herime cem apê xwe yê li filan derê.

-Mêrik, divê tu di serê sêrî de biçûyayî cem apê xwe; lê tiştek nabe, ha ji te re vî bazinê min bifiroşe, ji xwe re bike rêpî û here cem apê xwe, -dibêje jina wî ya ku ewqasî hatiye îhmalkirin-.

Mêrik radibe, bazinî difiroşe, berê xwe dide mala apê xwe. Serê te neêşînim, di dawiyê de malê dibîne; lê ap ne li malê ye. Jinapa wî xêrhatiniyê lê dike û dibêjê:

-Kerem bike, li bin dara han westa xwe dayne, bila zarok ji te re nan-avê bînin, heta ku apê te berêvarê ji paletiyê hat.

Mêrik piştî xwarinê xwe hinekî dirêj dike, piştî roşkestinê hişyar dibe û dinêre ku kalemêrek li kêlekê rûniştiye cixareyê dikişîne:

-Bavê te mir, te bavê xwe çal kir, malê wî xwar û xelas kir, paşê çûyî cem jina xwe û rêpiya te da te ku bêyî cem min ne wisa? -dipirse kalê temendirêj.

Mêrik bazdide ser xwe, xwe diavêje piyan, lêborîna xwe dixwaze û dipirse:

-Li vî bajarê dûr, tu çawa hîn bûyî? Kî ev tişt gihandin te?

Dibe tîqetîqa apê wî û dikene, bêhnefişkekê li cixareyê dixe û dibêjê:

-Zehf mereq dikî bê ka kê ji min re gotiye? Were em herina mala wî.

Ap û birazî radibin, dikevin riyê û qederekê diçin ku digihêjine goristanekê. Ap di riyê de pirsa çend mezinên malbatê û gund dike; lê qe nabêje bi ku de diçin. Dema ku digihêjine wir, destê xwe radike, fatiheyekê dixwîne û dibêjê:

-Ev “goristana bêxîretan e”. Heft apên me yên bêxîret li vir çalkirî ne û qedera me hatiye serê giştan. Kalikê me yê pêşîn jî eynî bavê min û bavê te kiriye. Kurek daye xwendinê û ew ên din jî dane ser kar. Wan jî malê bavan xwarine û dema ku qediyaye jî hatine vir.

-Ecêb e, kalikê pêşîn çima ew şîret li kurê xwe kiriye û mala wî daye ber devê kulê! Şîreta bavê min wiha bû: “Malê te zehf e, bila tava sibeh û êvaran li serê te nexe, hefteyê carekê bizewice, bila her gundî maleke te hebe.”

-Dema ku bavê te gotiye ku malê te zehf e, ango ji paleyan zêdetir bixebite ku bikaribî lê xwedî derkevî. Dema ku gotiye bila tav li serê te nexe, ango ji berbangê heta rofirînê li ser karê xwe be. Dema ku gotiye hefteyê carekê bizewice, ango hefteyê carekê here cem jina xwe ku bila hevdîtina we wekî dawetekê be û zêde li cem jinê rûnene, nekeve kêfê. Dema ku gotiye bila li her gundî maleke te hebe, ango bila li her derê dostekî te hebe ku di roja teng de berê xwe bidêyî. Îcar te birayê xwe da xwendinê?

-Belê apo, a ku ez pê razî me hema ev tenê ye.

-Ew ê mezin bibe, bizewice û li zarokên te yên li wir miqate bibe. Îcar ew zêr-zeberên ku bavê te ji bûkê re standibûn têra wê û heft bavên wê dikin, xema wê nexwe. Tenê heqekê wê yê jinaniyê li ser te heye ku sê mehan carekê here cem û dîsa bizivire vê derê. Ev der meskena me ya dawîn e, ez ê keçeke evdan ji te re bixwazim û em ê ji xwe re paletiyê bikin, heta mirinê.

***

Piştî wê çîrokê Miraz ji kekê xwe yê Emer veqetiyabû, neçûbû ber Kevirê Siwaran û rast çûbû malê; lê gotina ku dikeve nava dev û diranan ji sînorê lêvan derbastir dike û belavî nava hewayê dibe; bayê çep û rast wî dengî bi kêfa dilê xwe digerîne, heta ku careke din vegere xwediyê xwe; lê wisa tê guhertin ku xwedî jî êdî lê xwedî dernakeve.

Rojekê dê û keça wê li ser vê babetê diaxivîn ku kulê lê nexista biçûka malê bi ser wan de hat û qismekî axaftinê bihîst. Îcar ew jî rojekê bi biraziyên xwe re dilîze û dilê wê ji wan dişkê û ji devê xwe dişehitîne ku bavê wan dê bizewice û ew dê ne bi wan re, lê bi biraziyên xwe yên nû re bilîze. Ev gotin bi ber guhê jinê dikeve ku pêşiyê ji hêrsan kef bi dêv dikeve, paşê bi ser hemdê xwe de tê û êvarekê dibêje Mirêz:

-Keça filankesê xwendiye û zana ye; wê ji xwe re naxwazî?

Miraz lalomalo û soromoro dibe, bersivê didê:

-Ev ji ku derket? Ew keç kurmancî jî nizane, diya wê ya biyanî xêncî nefreta li dijî kurdan tiştek hîn nekiriyê. Ka ew ê çi jintiyê ji min re bike? Towbe, towbe...

Jinik bi dûr û dirêjî pesna wê, jîrtiya wê dide û tayî bi derziyê re dike; lê mêrik qayîl nabe û dipirse:

-Tu bidî xatirê Xwedê, te ji hinekan tiştek bihîstiye ku tu vê pêşniyarê li min dikî?

Jinik wekî ku tevşoyekê di eniyê de bidê dibêje:

-Te li cihinan gotibe min bihîstiye, lê te negotibe jixwe virek e û ne hêjayî nîqaşê ye.

-Erê welleh min gotiye, îcar çawa gihişte te, kîjanî ew bêbextî li min kir ku li ser tiştekî nebûyî tu berdayî pêsîra min?

-Êdî tiştê çû, mede dû. Sibê ez ê keçikê bi bihaneyekê bînim malê û li ber te bixînim; lê rû nedê. Xwe giran bigire ku bila paşê bi xîreta te re nelîze.

Mirêz dengê xwe nekir, cixareyek pêxist û wateyek neda guherîna jina xwe. Bi rastî jî sibetirê bi destî cînarekê keçik anî malê û mijara zewicandina mêrê xwe jê re vekir; keçika xam hinekî enirî ku here ser jinekê; lê paşê qebûl kir. Jina Mirêz piyek li mala bavê û yek li mala xezûrî her du alî jî razî kirin; lê pirtepirta dilê mêrê wê bû.

Di dawiyê de keçik hate xwestin, dawet û govend hate lidarxistin û bûk gihişte zavayî. Piştî demeke kurt ku mehek jî derbas nebûbû, jina mezin gotê ku bila rojên wan bi edaletî belav bike û Miraz neçar ma ku xebera wê bike. Piştî ku zarokeke wan çêbû, jê xwest ku malekê jê re çêke û ji xwe veqetîne. Dema ku zarokên jina biçûk gihiştin ber xwendinê, zarokên jina mezin jî hatin ber zewacê û jina mezin jê xwest ku kêm here mala jina biçûk û li ser zarokên berzewac bisekine û wan li ser kar û barekî biedilîne. Êdî Mirêz ji daxwaz û mesrefan re nedigihand û ji bo xebatê çû bajarekî dereke.

Êvara roja ku dê here xebatê, li cem jina biçûk bû û piştî nimêja berbangê hate cem jina mezin jî; lê wexta ku wê xatir jê bixwesta kela wî tijî bû, qenciyên jinê hatine bîrê û kir ku bibêje: “Xwezila pizik di devê min de derketa û ew pêşniyar ji zimanê min neşehitiya”. Jinê ev rewşa wî fêm kir, bere bere paşstû-mastûyên wî sererast kirin û ji nişkê ve got:

-Te meseleya “qurbano sersoro, hem hekîmo hem doxtoro” bihîstiye?

Belê bihîstibû, lê xwe keriyê danî û wekî ku bibêje “ew çi ye” lê nihêrî. Jinikê got:

-Lo, li ber xwe nekeve û nebêje ku ez ji bo razîkirina jinan diçim xebatê. Em jin wisan in. Dibêjin merivekî dujinî ji xerîbiyê hat û her du jinan jî digot “ez nexweş im”. Yekê digot li filan derê hekîmekî wiha wiha heye, yekê digot li filan nexweşxaneyê doxtorekî wiha wiha heye. Mêrik wê şevê çû cem her du jinan jî. Sibehê gazî kir ku bilezînin herine ser hekîm û doxtoran; lê her duyan jî got ku eceleya wan tuneye û ew paşê jî dikarin herin. Welhasil neçûn tu derê û mêrikî ji xwe re got: “Qurbano sersoro, hem hekîmo hem doxtoro”.

-Te got mesele û ez jî yekê bibêjim: Melayî nihêrî ku merivek hertim berbangê beriya wî tê mizgeftê û hikmeta vê zû şiyarbûnê pirsî. Mêrikî got ku ew î dujinî ye, her jin di dora xwe de zû radibe, ava serê wî amade dike, heta ew serê xwe dişo taştiyê dide ber û wisa dişîne nimêjê. Wî jî dil avête dujiniyê, malika xwe kire pîneyê malan û zewicî. Mêrikî nihêrî ku êdî mela beriya wî tê

mizgeftê û jê pirsî: Te xêr e, jinên te gelekî jêhatî bûne? Melayî bi kulzikî got: “Mala te here devê kulê, te nedigot ku yek niftê direşîne ser û yek êgir berdidê; te digot yek avê amade dike û yek taştiyê!”

Her du jî bi hev keniyan û her duyan jî dizanibû ji hev re çi gotine. Jina ku dexesiya xwe danîbû bin lingan teselî didayê ku guh nede qirtevirtên jinan û riya xwe bidomîne; mêrê ku bi jina pêşîn qayîl nebûbû ketibû bin mineta wê û dizanibû ku ew nimeta Xwedê bûye; lê wî qedrê wê nizanibûye.

**Du Bira**

Zorava, gundekî li quntara her du çiyayên Agiriyê û çemekî bi navê Qerisî ji ber re derbas dibe; lê ava wê bi kêrî vexwarinê nayê. Di çavkaniya ava vî çemî de rêjeyeke bilind a camaxê heye. Camax pêkhateyeke kîmyewî ye ku diranan pêşiyê zer dike û di domana demê re jî dirizîne. Lewre diranên şêniyên wan gundên ku li ber vî çemî ne gişt zerbûyî û kurmîbûyî ne. Piraniya wan kesan piştî pênciyên xwe xatirê xwe ji diranan dixwazin.

Ji destpêka sedsala çûyî heta roja îroyîn li vî gundî tiştek neguheriye; pêşveçûne şaristaniyê neqewimiye. Belê, elektrîk hatiye gund; lê ji roja avabûna gund heta sala 2000î ava paqij nehatiyê û gundiyan ava vexwarinê li ser pişta ker û hespan ji gundên der û dorê peyda kirine.

Destpêka salên 1920î bi bihaneya qanûna cil û bergan eziyet li kurdan dibû; lê kurdan nedixwest urf-edet, çand-ziman û cil-bergên xwe biterikînin. Pêşengên kurdan hewl didan ku çareyekê bibînin; lê derman-çare tunebûn. Lewre ji bo ku kincên xwe yên kurdî dernexin nediçûne Bazîdê; diçûne aliyê Rewan û Makûyê, pêwistiyên xwe ji van deran peyda dikirin. Bazîda wê çaxê li hinda keleha Behlûl Paşayî bû û gundiyên doraliya Agiriyê bi Riya Şeytên diçûne Bazîda Jorîn. Riya Şeytên ji hinda gundê Kotîzê re, di nava zinar û tehtan re derdikete bajêr. Heçî ku Bazîda îroyîn e, deşteke riprast bû, heyama dagirkeriya Ûris wekî deşteke çandiniyê hatibû bikaranîn; hê hê jî av-herî, herîrêtik û ciqnaqa heriyê bû.

Di heyama şerê Agiriyê de Zoravayê piştgirî dabû tevgera kurdan a dewletxwaz û malbat ber bi çiyê hilkişiyabûn. Hesen û Rihan jî digel zarokên xwe gihiştibûn qada şer; ji gund û navgînên aboriyê, ji warê eşîrê veqetiyabûn. Dibêjin kesê ku pêşiyê xwe digihîne qada cengê û li benda hatina dijminî disekine ew kes ji bo şerkirinê çalak e, amade ye. Kesê ku piştî hevrikê xwe digihêje qada cengê û ji bilî şerkirinê tu çareyê nabîne jî westiyayî û bêtaqet e. Bi vî awayî şervanê jîr daxwaza xwe bi dijminî dide pejirandin; lêbelê nahêle ku dijmin daxwaza xwe bi wî bide sepandin. Dema ku şervanê jîr derfetan têxe bin destên xwe wê hingê dikare dijminî kaşî xwestekên xwe bike. Her wiha dema ku ziyanê bide dijminî jî êdî ne pêkan e ku dijmin xwe nêzikî wî bike.

Şervanên kurd li quntara Çiyayê Agiriyê ne tenê artêşa tirkan hemû sazî û karmendên wê ji xwe re dijmin dihesibandin. Dewleta Tirkiyayê ya ku teze ava bûbû du serhildanên dewletxwaz ên kurd tepeser kiribûn; di dorê de şervanên Agiriyê hebûn, divê ev dijmin jî bihatana tepeserkirin. Artêşa tirk wekî dêwekî li pêşberî kurdan sekinîbû; du pariyên mezin qurt kiribûn û li benda daqurtandina pariyê paşîn ê tijî dasî bû. Hesen jî dasiyek ji dasiyan bû û dijminê xwe di bêhnvedanê de tengezar dikir. Gava dijmin têr û kêfxweş bibûya, wî hewl dida ku hevrikê xwe ji nêz de bikuje. Gava dijminî baregeha xwe xurt bikira, Hesenî ew mecbûrî terikandina wê baregehê dikir. Li qadine wisan derdikete holê ku dijmin şaşwaz dibû û tatêla xweparastinê bi laş û mêjiyê wî digirt. Herwiha xwe zûtirkê digihande qadine wisan ku dijminê wî ne li bendê bû ku li wir derkeve holê.

Hesen ji wî girî bazdida girekî din, ji wî kêrtî derbasî kêrtekî dîtir dibû, ji wê newalê derdiket û dikete yeke din. Hinekî jî mecbûr bû ku guh nede êş û azarên laşê xwe. Baş dizanibû ku daketina deştê tê wateya guherandina cil û bergan û bi dehan heqaretên din. Qe nedixwest ku li deştê rastî leşkerî were. Êdî ew rê jê re qedexe bû, divê tê re derbas nebûya heta ku ji xwe û gelê xwe re riya rûmetê vekira. Xîreta wî qebûl nedikir ku digel jin û zarên xwe bi vê riyê here bajêr, du leşker derkevin pêşiya wan, wan bidin ber qamçiyan, li ber çavên zarokan şerefa wan bikin pênc pereyan.

Her artêş dikare bimeşe mesafeyên dûr û qet bertekên tengezariyê nîşan nede; her şervanê jîr dikare bi heft gurçikan ber bi xeyalên dûr bimeşe, ji kulê netirse; lê divê ji cihine wisa re derbas bibe ku dijmin lê peyde nebe. Heke warên ku êrişê dibe ser cihên neparastî bin, ew dikare ji serkeftina xwe bawer bike. Heke kesek şûnwarên ku rastî êrişan nayên di destê xwe de bigire, êdî dikare ewlehiya hêza xwe ya parastinê bîme bike. Hesen jî wekî her endamê şoreşê dabû pey

xeyaline dûr, pişta xwe dabû çiyayekî parastî, êriş dibire ser dijminê xwe yê li deşta req û rût. Heke serokfermandar di êrişbirinê de pispor be hevrikê wî dê nizanibe bê ka çawa xwe biparêze. Herwiha heke serokfermandar di xweparastinê de pispor be wê hingê hevrikê wî dê nizanibe bê ka çawa êrişê bîne ser wî. Fermandarên Hesen jî mêrxasên mîna Biroyê Heskê, Ferzende Beg û Hese Sersist bûn. Serfermandarê giştan Meraşal Ihsan Nûrî bû ku tevî şerê cîhanê yî yekemîn bûbû; li Balkanê şer kiribû û pisporê xebatên leşkerî bû.

Hey gidî surişta ku nîgara wê bi raz û bêqusûriyê ve hatiye kêşan! Bi destî wê Hesen û rêhevalên wî xwe ji çavan vedişartin, bi destî wê şoreşgeran dengên xwe dinixamtin û bi vî awayî çarenûsa hevrikên xwe di destên xwe de digirtin. Hesen carinan berêvaran li ser zinarekî rûdinişt û pesna rêhevalên xwe dida; Rihanê bi baldarî û zarokan jî wekî çîrokeke efsûnî guh didane vegotinên wî. Dema ku behsa şer diqediya, vê carê berê xwe dida Ûsivê ciwan û şîret lê dikirin:

-Gava ku tu dixwazî her tim gavekê li pêş bî û kesek nikaribe xwe li ber hêza te ragire, divê tu li lawaziyên dijminî bigerî û di tûşa wî ya qels de lê xî. Heke tevgerên te ji yên dijminî bileztir bin, tu dê bikaribî bi qasî têra xwe bêhna xwe vedî û ji payîna wî ewle bî. Gava dilê te bi şerkirinê hebe, heke te baregeha xwe li pişt çepereke bilind an jî di kortaleke kûr de danî be jî divê tu dijminî kaşî qada cengê bikî. Di vê rewşê de pêwistiya te tenê bi tiştekî heye: Divê tu di cihine wisan de êrişê bibî ser ku mecbûrî derketina derve bibe. Gava dilê te bi şerkirinê tunebe, -her çiqas şopandina riyên biryargeha te pêkan be jî- divê tu nehêlî ku di navbera te û hevrikê te de temas çêbe. Di vê rewşê de pêwistiya te tenê bi tiştekî heye: Divê tu tiştine wisan seyr û sosret biavêjî ser riya wî ku nizanibe bê ka çi bike.

Ûsivê nixurî carinan di bin bandora bavê xwe de gotinên mezinan dubare dikirin:

-Heke em tevgerên hevrikan bipên û wan baş nas bikin, her wiha xwe li ber çavên wan nexin da ku bêminet raweşe, wê hingê hêzên me dê yekpare bibin û hêza wan jî dê belawela be. Heke em wekî endamên cendekekî bi hev re tevbigerin û bikin ku hevrik jî parparî bibe, wê hingê koma wan a pizirî û riziyayî dê derkeve pêşberî yekîneyên me yên yekgirtî. Ev jî tê wê wateyê ku em dê kom bi kom herin ser komikên lawaz.

Wekî ku ji kurê xwe re bibêje "aferîn" wiha piştgirî dida gotinên wî yên ezberkirî:

-Û heke em bi hêzeke xurtir êrişê bibin ser hêzeke lawaz, wê hingê dijraberên me dê rastî teşqeleyên pir dijwar werin. Ew qada ku em dixwazin lê şer bikin divê ji aliyê wan ve neyê zanîn da ku ew li gorî ihtimalên êrişan ji çend aliyan ve amadehiyên xwe bigirin û hêzên xwe di çend şûnewaran de bi cih bikin. Heke her hêzeke wî li şûnewarekê hatibe bicihkirin em dê bi hêzine giran derkevin pêşiya hêzine biçûk û wan yekeyek bipirçiqînin.

Carinan te dinêrî Rihan jî tevî axaftinan dibû û zanyariyên xwe bi wan re pareve dikirin:

-Dema ku ew ji siwaran re destekê bişînin; divê tu bi peyaran şer bikî. Heke ew giraniya xwe bidin ser eniya xwe ya rastê divê eniya çepê bê hincirandin; lê gava giraniya xwe da ser eniya xwe ya çepê divê eniya rastê bê şerpezekirin. Bi vî awayî ew dê hêzên destekê bişîne her aliyî û dê ji her aliyî ve qels bimîne. Heke tu xwe ji çend êrişên pêkan re amade bikî, ji aliyê jimarê ve hêza te dê lawaz bikeve. Lêbelê heke tu wan mecbûrî van amadekariyan bikî û nekevî kemîna ku ji te re daniye, di hengameya cengê de tu dê ji aliyê rêjeyê ve ji hevrikên xwe xurtir bî.

***

Ûsiv ciwanekî 14-15 salî yê bejnbilind bû, li çil-çiyayên Agiriyê wisa digeriya ku te digot li besteke rast diçe û tê. Gelek caran heta quntarên Çiyayê Agiriyê yî Mezin çûbû, çend caran derketibû ser Çiyayê Agiriyê yî Biçûk, Çiyayê Bêçare û Girê Zikdiriyayî. Ev der wekî kefa destê xwe dizanibûn, ew bişandana kê derê bi lezgînî diçû û vedigeriya; lewre navê wî danîbûne Ûsiv Teyare. Ji ber ku ciwanekî serwext bû ji ciwanên hevtemenên xwe re pêşengî dikir, li ser rewşa cengê û tedbîrên ewlehiyê bi wan re diaxivî, ji ber ku çeka wî tunebû diheliya.

Rojekê Ûsiv Teyare digel hevalên xwe dilîst; lê bi rastî wan bi lîstika alîkariya leşkerî didane

şervanên mezin. Ûsiv hevalên xwe yên ku dikaribûn birevin, hilkişine çiyayan, bar-zexîreyan hildin, cebirxaneyên biçûk biguhêzin hildibijart û wiha teme dida alîgirên xwe:

-Beriya ku em derkevin riyên dûr divê em dews û dema qada cengê hê di pêş de diyar bikin da ku li gorî wê hesabê xwe bikin. Lê gava ku dews û dema cengê neyê diyarkirin, wê hingê ne baskê rastê dikare here alîkariya baskê çepê ne jî baskê çepê dikare here hewariya baskê rastê. Herwiha baskê pêşîn nikare barê baskê paşîn sivik bike û baskê paşîn jî nikare destekê bide baskê pêşîn. Her çiqas yekîneyên artêşê bi qasî çend sed mêtroyan nêzikî hev bin jî dê nikaribin vê lawaziya xwe perpût bikin.

Hevalekî wî yê ku malbata wî teze hatibû şîroveyên Ûsiv Teyare diecibandin; bi coş û peroşiya lîstika cengê wiha piştgirî didayê:

-Kekê Ûsiv rast dibêje, her çiqas rêjeya artêşê ji jimara artêşa me zêdetir be jî ev zêdehî ne sedemkareke serkeftinê ye. Ez dibêjim ku di vê rewşê de jî derfeta serkeftinê heye. Dibe ku jimara artêşa wan pir zêde be, lêbelê em dikarin astengiyan daynin pêşiyê da ku ji cengê vekişe. Wisan e divê em plan û bernameyan daynin da ku tu niyêta wanî hîn bibin. Bila Kekê Ûsiv plan û bernameyên wan hilsengîne, hilqefşîne û bêjing bike da ku em derfetên serkeftina wan têk bibin.

Piştî vê piştgiriyê Ûsiv hin peywir diyar dikirin, destê xwe dirêjî hevalekî xwe dikir:

-Wan sil bike û bitengijîne. Hînî rewişta wî bibe û bizanibe bê ka kengê çalak û kengê sersist dibe. Mîna şeteleyekê derkeve pêşiyê da ku rastiya tevgerên wî derkeve holê û tenişta wî ya tenik tazî bimîne. Artêşa xwe û artêşa hevrikê xwe bi baldarî bide ber hev. Wê hingê tu dê baş fêr bibî bê ka hêz û wizeya kîjan artêşê zêdebarî an jî kêmasiyan dihewîne.

Vê carê vedigerî ser hevalekî din û jê re bi fermankî digot:

-Dema ku tu dê derkevî raperînan bizava hera bikêrhatî ew e ku tu pêngavên xwe lap veşartî bigirî. Bi vî awayî tu dê xwe hem ji payîna sîxuran hem jî ji têkdana zanayê herî hişyar biparêzî. Ji bîr meke ku mirovê ji rêzê nizane bê ka tu dê çawa ger û tevgerên hevrikan nas bikî û ji gelê xwe re serkeftinekê bi dest bixînî.

Hevalê wî yê ku fermana Ûsivî hildabû dixwest bi qasî serê şûjinekê be jî alîkariya fermandarê xwe bike:

-Dema ku ez serkeftinekê bi dest bixînim her kes dikare vê yekê hilsengîne; lêbelê tu kes nizane bê ka serkeftin girêdayî kîjan rê û rêçikên cengê ye. Rêbaza cengî ya ku te carekê bi kar anî û tu bi wê gihiştî armanca xwe cardin dubare meke; lêbelê wisan bike ku bila her serkeftineke te bibe guhertoyeke bikaranîna derfetên heyî.

Ûsiv bi vê şîroveyê gelekî kêfxweş bûbû û gotina fermanberê xwe wiha piştrast dikir:

-Rê û rêçikên leşkerî pir dişibihin avê. Av di rewşa xwe ya suriştî de ji derine bilind bi lezgînî datê xwarê û berejêrkî diherike. Lewre di cengê de rêbaza hera bikêrhatî ew e ku tu xwe li hêza zexm daynenî û hêzên ji xwe biçûktir daqurtînî. Ji berê ve bav-kalan gotiye: “pariyê gir gewrîdir e”. Av li ser kîjan erdî bikişe li gorî xwezaya wê riya xwe diyar dike. Leşker jî bi kê re têkeve cengê li gorî ger û tevgerên wî ji xwe re riyeke serkeftinê vedike. Çawa ku av di qalibekî sabit û domdar de nasekine herwiha ceng jî hertim li gorî rewş û mercên diyarkirî û sabit berdewam nake.

Hevalên Ûsivî yên ku ew wekî fermandarekî hilbijartibûn gelekî kêfxweş bûn; peywirên xwe bi kêfxweşî dikirin û dizanibûn ku “av, agir, dar, maden, erd” bi awayekî sermedî serdest namînin. Her çar werz derfetê didin hev, da ku karê wan bi dorvegerî pêk were. Hinek roj kin in û hinekên wan jî dirêj in. Hilatin û firîna hîvê jî li gorî hin heyamên diyarkirî teşe digirin. Her çi hebe zarokan ji Ûsivê Teyare hez dikir, ji çalakiyên wî wane digirtin, ji kirinên wî yên camêrane sûd werdigirtin û ji sedî sed qebûl dikirin ku ew hêjayî hezkirinê ye. Fermandarê ku rêbazên xwe yên cengî li gorî liv û tevgerên hevrikê xwe sererast dike û bi vî awayî serkeftinê bi dest dixîne diyariyeke Xwedê ye.

***

Di nava vê keftelefta şer de Hesen şehîd ketibû û şoreşgeran ew li quntara Çiyayê Agiriyê spartibûn axê. Rihana belengaz digel çar zarokan bêxwedî mabû, divê tiştek bikira ku emanetên Hesenî bi silametî derxistana serfiraziyê. -Wekî Hacera ku bêyî Brahîm di navbera çiyayên Sefa û Merweyê de direve, diçe û tê- ji vî çiyayî xwe disparte çiyayekî din; ji vê şkeftê derdiket û dikete yeke din. Mîna maka ku têjikên xwe dide pey xwe û li stargeh-jîngeheke ewle digere li Kirê Agiriyê digeriya. Erê Ûsiv î mezin bû; le Eyşe, Elî û Ehmed hê biçûk bûn. Eyşeyê di wan rojên şer de Ehmed li piştê, hertim li pey diya xwe bû û pêşa wê bernedida; lê sur-seqema Agiriyê perat bû, ji bo zarokên rût-tazî eman nedida. Lewre Ehmedê bê kinc û qerpal li ser pişta Eyşeyê hişk bûbû û dereng pê hesiyabûn ku miriye jî. Piştî ku Ehmed mir û li gundê Silekosê hate çalkirin, êdî ruhê Rihanê ketibû gewriyê divê zarok derxistana cihekî ewle, nemaze jî divê ev zaroka keçîn bişanda cem apanên wê yên li Dambatê.

Romiyan li Erdîşê komkujiyeke sedsala bîstan pêk anîbûn û biryar dabûn ku heman karî li Agiriyê jî bikin. Lewre ji Ingilistanê çend heb teyareyên cengê kirê kiribûn û rakiribûn ser qada şer. Pêşiyê hinek belavok reşandibûn û di çapemeniya xwe de gotibûn ku hişyarî dane şoreşgeran da ku dev ji çekên xwe berdin û radestî wan bibin. Di gava duyem de mixên jehrkirî reşandibûn ser zomeyan û jîngeh jehrdadayî kiribûn. Li Zemyanê cengeke xurt hebû, malbat belav dibûn, jin-zar dimirin û seqet diman. Hinek ber bi aliyê Îranê ve direviyan, hinekan berê xwe dida Ermenistanê, hinekan bi riyekê xwe digihandin Tendûrekê û hinekan jî şer didomandin. Rihanê nihêrî ku şer giran bûye û Ûsiv şande cem apanê wî; Eliyê biçûk di hembêza xwe ve givaşt û li benda qedera xwe ma. Di dawiyê de şoreş hate belavkirin, qir-kuştineke nedîtî hate serê gel û Rihan digel zarokê xwe dîl ket. Bi rastî serbazek dest datîne ser Rihanê, dixwaze ku wekî xenîmeta şer ji xwe re bibe. Serbaz zorê didê ku Eliyî bihêle û bi wî re bizewice; lê Rihan kurê xwe navêje û serbaz di dawiyê de her duyan jî hildide ba xwe.

Êdî Serbaz ne tenê mêrê Rihanê û zirbavê Eliyî bû, herwiha xwediyê çil zêrên reşadî yên di paşila wê de jî bû. Pêşiyê navên wan guherandin: Rihan veguhaste Lutfiyeyê û navê Eliyî guherand û kir Ihsan Nûrî Bozkurt. Bi rastî jî serbêz ev jin -a ku di paşila xwe de çil zêr anîbûn- lutf û nimetek dihesiband; lewre ev nav lê danîbû. Îcar navê Eliyî divê bibûya versiyoneke bişaftinê, divê ew bida xwendinê û nifşeke nû jê derxista û ew bikira qiraskê serê kurmancan. Navê Mareşal Ihsan Nûrî lê kiribû, lê ew di dibistanên leşkerî de dabû xwendinê û serbazekî tirk jê derxistibû. Her çiqas navê serdarê kurdan lê kiribû jî paşnava Bozkurtê ya ku tê wateya “gurê boz” pê ve girêdabû. Her çiqas ew her du ji xwe re kiribûn malbat jî, ji bo serbêz ew jinik dulegurek bû û kurê wê jî têjikê guran bû. Ji vî serbazî du zarokên Rihanê çêbûbûn: kur û keçek. Navê kur Ûsiv danîbû û navê keçê Eyşê; Eliyî jî piştî akademiya leşkerî payeya serbaziyê wergirtibû û li gelek bajaran serbazî kiribû.

Rihan rojekê Eliyî dide pêşberî xwe û serpêhatiya xwe ya kambax jê re vedibêje; jiyana kurê wê serobino dibe. Elî êdî hîn dibe ku diya wî wekî sedan xenîmetên şer ketiye destê zirbavê wî, di rastiyê de ew xelqê Zoravayê ye, bavê wî di şer de hatiye kuştin û xwişk-birayên wî yên rastîn hene ku nizane çi hatiye serê wan. Di vê navberê de tayîna wî derdikeve Enqereyê; lê ew cihê peywira xwe bi hevalekî xwe re diguhere û tê Bazîdê. Elî êdî wekî Ihsan Nûrî Bozkurt di baregeha leşkerî ya Bazîdê de dest bi kar dike, di bin ronahiya vegotinên diya xwe de li serokên eşîra Sakî digere. Qijika Rihanê nizane ku Biroyê Heskê Têlî û Şêx Evdilqadir mirine; lê dîsa jî van navan dide Ihsan Nûrî û ew jî salixên wê qeyd dike. Dema ku Ihsan Nûrî tê Bazîdê gav bi gav şopa serekên eşîrê, binaşeya bav-kalên xwe û bûyerên li Çiyayê Agiriyê dişopîne.

Êdî sal derbas bûne, Ihsan Nûrî bûye serheng û gelek giregirekên eşîra Sakiyan nas kirine. Rojekê van gotinên xwe ji Şêx Hesenê kurê Şêx Evdilqadir re vedibêje, salixên diya xwe û gotinên wî dide ber hev ku rast in. Şêx Hesen jê re dibêje ku birayê wî yê Ûsiv, piştî efûyê hatiye û niha li Zoravayê ye.

Piştî van agehiyan Şêx Hesen rojekê Ûsiv Teyare digel komeke pismamên wî hildide û diçe nava leşkergehê, wan bi hev dide naskirin. Ûsiv û Elî hev nas dikin, bi hesreta salan xwe diavêjin hembêzên hev. Dema ku mêvan radibin, Ûsiv Teyare û Ihsan Nûrî Bozkurt, her du kurên Hesen Ûsiv û Elî bîranînên xwe ji hev re vedibêjin û dîsa hişên wan serobino dibe. Ûsiv ji aliyekî ve xemgîn e ku ew qas bela û mûsibet hatine serê dayîkê û birayî; lê dîsa jî kêfxweş e ku diya wî sax e, ew ji bîr nekiriye; tiştê herî girîng xîreta xwe neşkandiye û di dawiya temenê xwe de be jî întiqama xwe standiye. Ji ber ku diya wî -wekî şahideke bûyerê- rastiya şerê kurdan derxistiye holê.

Elî piştî vê hevdîtinê diçe serdana gundê xwe yê Zoravayê, Keleha Behlûl Paşayî û gora Ehmedê Xaniyî ku diya wî hertim qala wan kirine. Herwiha Reşîd Axayê kurê Brahîmê Silo jî li Îranê dibîne û gelek serpêhatiyan dibihîze. Di vê navberê de Rihan ji Enqereyê tê nav eqrebeyê û dibîne ku Ûsivê wê bûye xwedanê mal û halî; tika dike ku keça wê ya Eyşeyê jî bînin û ew jî digel zarokên xwe tê Bazîdê. Kon û çadir tên vekirin, qelî û birinc tên amadekirin, endamên malbata belavbûyî bi ser hev de tên komkirin; lê Rihan naaxive, bêdeng dimîne û ji êş-janên xwe napeyive ku vê roja cejnê vegerîne şînê.

Elî 3-4 salan li Bazîdê dimîne, paşê tayîna xwe derdixe bajarê Îskenderûnê û Rihan li wê derê dimire, li bajarokê Arsuzê tê çalkirin. Sal derbas dibin û Elî malnişîn dibe, êdî jiyana xwe li wê derê didomîne. Piştî ku diya wî dimire, zirxwişk û zirbirayê wî jî li bajarên din jiyanên xwe dibihurînin. Rojekê tatêl dikeve zikê Eliyî û lêgerînekê di nav malzemeyên diya xwe de dike û bigihêje belgeyên zirbavê xwe. Gelek wêne, bîranîn û yadigariyan dibîne; lê di nav wan de belgeya hera girîng belavokeke Komîteya Serxwebûn û Rizgariya Kurdistanê (Kurdistan Istiklal ve Istihlas Komitesi) ye. Belavoka ku rengê wê zerbûyî li ber rizînê ye; lê hê tê xwendin. Elî bi baldariyeke mezin hêdîka rûpelê vedike û dixwîne:

"Bi navê Xwedayê Rehman û Rehîm. Gelî miletê kurd ê wêrek! Giyanên pîroz ên bav-kalên me li me dinihêrin. Ew bav û kalên ku di riya dîn de, ji bo namûsê û şerefa eşîrê giyanên xwe feda kirine. Wan ji me re pirtûka Xwedê ya pîroz û şerîeta Mihemed (silavên Xwedê li ser bin) emanet hiştine. Lêbelê îro ew giyanên kal-bavan li benda me ne; bê ka em ê çi bersivê bidin murtedên Enqereyê û karmendên hikumeta wê yên ku ew emanet şewitandine û binpê kirine. Ew giyan dixwazin fêm bikin bê ka hûn sadiqî dab û nêrîtên xwe yên neteweyî ne ku di rojeke wiha de mirina li nava nivînan şerma mezin dihesibîne. Ew giyan kesên ku ji bo namûsa neteweyî û pîroziyên dînî çekan hildigirin teqdîr dikin; herwiha li wan kesî lanetê dibarînin ku ji bo parastina jiyana xwe fîşengdanka xwe ji pişta xwe vedike, çeka xwe radestî tirko dike, jina xwe bi darê zorê berdide, razî dibe ku keçên eşîrê û jinên milet biavêjin kerxaneyan, li derveyî sînoran sekiniye û destê xwe dirêjî hevnijadên xwe nake.

Ew giyan ji wan bênamûsan re wiha dibêjin: Xencerên ku we ji piştên xwe vekirine bidin jinên xwe yên berdayî; tifingên ku we ji destên xwe danîne bidin keçên xwe yên ku sewqî kerxaneyan kirine. Ji ber ku we mîna mêran nikaribûye namûsa wan biparêzin, hûn li şûna wan dezmalan girêdin û bigirîn; bila ew jî li ber we ve dîn û namûsa xwe bi qehremanî biparêzin.

Faydeya tirsê ji ecelê mirinê re tuneye. Heta ku ecel temam nebe kesek namire. Hikumeta Enqereyê biryar daye ku kî yekîtiya Xwedê û pêxemberiya Mihemed (silavên Xwedê li ser bin) nas bike, kî ji avê re "su" û ji nên re "ekmek" nebêje wê bên qirkirin.

Bela û felaket mîna siha mirovî ne; didine pey mirovan û ji mirovan direvin gava ku mirov bidine pey wan. Heta ku di destên we de tifing û di çokên we de derman hebin mîna pezê ku kaşî serjêkirinê dibe li hêviya ecelê xwe nesekinin, wekaleta xwe nedine kesî. Ev ne hêjayî şan û şerefa miletê we ye. Ew miameleya ku ji xwişk û birayên we yên dîn û miletî re rewa tê dîtinê li ber çavên we ye. Îro dora wan e û sibehê jî dora we ye. Heyama şoreşa şehîdê gewre cenabê Şêx Seîd Efendî -Xwedê raza wî pîroz bike- hinek serok û giregirên wekî Cemîlê Çeto, Emînê Ramanî, Hacoyê Midyatî, Resûl Axayê Zîlanî û gelek kesên din nebaşî kirin; lê di dawiyê de çi hate serê wan eyan-beyan e. Ji vê yekê ibretê wergirin. Hûn nikarin bi bêdengiyê, taetkariyê û alîkariyê bibin hevalbendên hikumeta tirkan; hûn nikarin xwe ji zilm û şopandina wan biparêzin. Çareya rizgariya

we ew e ku hûn merd merdane çeka xwe hilgirin. Li çep û rastê şer û pevçûnên xwîndar berdewam in; lê hikumet wan vedişêre. Qet nesekinin, pêwendiyên xwe xurt bikin û wan leşkerên li der û dora xwe desteser bikin; herine hawariya wan birayên xwe yên ku şêrane şer dikin. Ev çend meh in ku Lazistan di nava xwîn û êgir de ye. Bizanibin ku tirkên dîndar guleyê bernadin birayên xwe yên dîndar û teslîm dibin. Miletê tirk ê dîndar bi raman û ji dil digel we ye. Ew miletê dîndar nizane ku rêvebirên Enqereyê yên hiş-belengaz biryar li ser rakirina nav û nîşanên kurdîtî û gelê kurd dane. Ew mêjîsivik nav û nûçikan li têkoşîna we dikin, bi tehrekî berevajî radigihînin û miletê Anatolyayê dixapînin. Neviyên Cengiz nikarin fêm bikin ku miletek bi tu awayî û bi hîç şêwazî ji holê nayê rakirin. Ew top û tifingên tirkan, ew cebilxaneya tirkan a ku hûn ê desteser bikin têra we dikin. Rêberê we Mihemed (silavên Xwedê li ser bin) e û alîkarê we Xwedayê payebilind e. Hêza we qat bi qat ji hêza hikumetê zêdetir e û wêrekiya we li tevahiya cîhanê naskirî ye. Ji xewa xefletê rabin, dest bidin destên hev û pîroziyên xwe biparêzin. Gava ku hûn bi awayekî gelemperî rabine şoreşê hûn ê gelek xwişk û birayên xurt û binamûs bibînin. Gava hûn pîroziyên îslamê û mafên xwe yên neteweyî bi dest bixînin, hûn ê ruhê pêxemberî şa bikin; herwiha gava Kurdistan taca serkeftinê bide serê xwe hûn ê ruhên bav û kalên xwe jî şa bikin û îsbat bikin ku hûn neviyên wan in.

*Komîteya Yekîtî û Rizgariya Kurdistan û Anatolyayê*

Bi hevahengiya biryara jorîn, Komîteya Yekîtî û Rizgariya Kurdistanê dide zanîn ku:

1. Komîteya Kurdistanê ne amûra destê tu dewletê ye. Armanca wê bidestxistina mafên neteweyî yên rewa ne. Ew maf jî:
a. Sînorên neteweyî yên kurdan dê bên diyarkirin û ji hev bêne veqetandin; xizmet û peywirên navxweyî dê ji aliyê navendeke serbixwe ve werin rêvebirin û desteyeke rêveberiya wan a serbixwe dê hebe.
b. Divê di nava sînorên neteweyî yê kurdan de zimanê fermî “kurdî” be.
c. Karmendên kurdan dê ji kurdan bên bijartin.
d. Saziya leşkerî ya kurdan dê hebe û bi fermana wan kar bike.
e. Serbaz û leşkerên kurdan ên ku di artêşa hevpar de cih digirin dê wekî yekîneyên taybet kar bikin û bi zimanê kurdî perwerdehiya xwe bibînin.
2. Heta ku armancên neteweyî werin bidestxistin şer dê berdewam bike. Hemû berpirsiyariya madî û manewî ya xwîna birayan a rijiyayî aydî hikumeta Enqereyê ye.
3. Komîte amade ye ku vê dozê bi riya aştiyê çareser bike; herwiha amade ye ku li cihekî munasib desteya çareseriyê saz bike.
4. Li gorî rêjeya xwîna rijandî daxwazên kurdan dê girantir bibin.

*Navenda Giştî ya  Komîteya Serxwebûn û Rizgariya Kurdistanê*

Elîyê Hesen belgeya kurdan dîsa bi baldarî qat kir, bêhn kir û ramûsa. Piştî ku belge danîn nav kel-melên diya ji xwe re wiha got: “Hey Xwedao, tu çiqasî mezin î! Te bavê min di riya xwe de şehîd xist, navê serfermandarê wî Ihsan Nûrî li min kir û ez di mala firewnî de mezin kirim û rastiya gelê min li min nîşan da. Te heyfa Xwe stand; lê hê heyfa min maye. Tu ji me re deyndar î dinyayê!”

**Dawiya Birakujiyê**

Feqiyên medreseyê daxwaz ji seydayê xwe dikirin ku pirtûkeke dîrokê bixwînin û seydayî bersiv dida ku ew dê ji wan re pirtûkeke minasib hilbijêre. Piştî çend rojan Seyda Mela Ihsan pirtûka dîrokê ya Ebulfida Smayîlê Eyûbî anî û li feqiyan nîşan da:

-Gelî camêran, wan rojên han we ji min pirtûkeke dîrokê xwestibû. Îcar min "El-Muxteser fî Tarîx'il-Beşer" a Ebulfida ji we re minasib dît.

Feqiyekî xwest ku sedema vê bijartinê hîn bibe û pêşniyar kir:

-Seyda, ez xulam, gelo me Muqedimeya Ibn Xeldûn digel dîroka Ibn Xelikan bixwenda çêtir nedibû?

Seyda bi zanatiya feqiyê xwe şa bûbû ku felsefeya dîrokê û berhema dîroknasekî kurd pêşniyareke baş e; lê wiha bersiv da pêşniyarê:

-Feqîcan, dîrok ilmekî kûr û dirêj e. Jixwe Ebulfida jî kurd e û ez ê çend beşên pêwist ji vê pirtûkê hînî we bikim; paşê hûn ê ferhenga xwe bidine kêleka xwe, di her demeke xwe ya vala de dîrokê bixwînin, bixwînin, bixwînin. Şîreta min li we ev e.

Feqiyan bijartina seydayê xwe bi ser çavan pejirandin û dest bi peydakirina pirtûkên xwe kirin. Mela Ihsan dil hebû ku mijarên pêşîn ên pirtûkê nede xwendin û rasterast ji dîroka gelên aryayî dest bi fêrkirinê bike. Ji ber ku mijarên pêşîn dîroka pêxemberan bûn û ev babet di hinek pirtûkên din de hatibû xwendin.

Feqiyan di navbera hefteyek-deh rojan de pirtûkên xwe amade kirin, seydayê wan duaya destpêkê xwend û dersa pêşîn dest pê kir: Di dîroka gelên aryayî de tebeqeya pêşîn aydî Pêşdadiyan e ku tê wateya "heyama dadweriyê ya pêşîn". Serokê pêşîn ê pêşdadiyan Hoşeng e ku cara pêşîn pergalek ji bo kar û barên dewletê daniye, bac li ser welatiyan ferz kiriye û bi dadweriyê tevgeriyaye; lewre bi nasnavê "pêşdad", ango "damezrînerê pergala dadweriyê" hatiye naskirin. Hoşengî bajarên Babil û Sûsê ava kirine, bi kesayet û siyaseteke baş welat rê ve biriye, taca keyaniyê li xwe kiriye. Piştî wî gelek kur, nevî û nevîçirkên wî serwerî kirine; lê bi qasî Tahmewers navdar nebûne. Tahmewers wekî kalikê xwe yê Hoşeng hinek karên qenc kirine ku yek ji wan nivîsandina bi zimanê parsî ye. Piştî wî birayê wî yê Cimşîd bûye serwerê xanedanê. Di parsiyê de wateya "cim"ê hîv e û "şîd" jî tîrêj û ronahî ye, ango "ronahiya hîvê" û "hîveron". Herwekî vî navî "xurşîd" jî tê wateya "ronahiya rojê". Cimşîdî heft welat bi rê ve birine û gelek karên qenc pêk anîne.

Mela Ihsan li vê derê sekinî, berê xwe da feqiyan û li rûyan nihêrî û dît ku kêfa wan bi vî ilmê balkêş re hatiye. Lewre got:

-Li vê beşê baş guhdarî bikin: Cara pêşîn Cimşîdî fermanberên xwe dabeş kirine û di nava rêveberiya xwe de du erk diyar kirine: Erka nivîskaran a zagonsaz û erka peywirdaran a ku ev zagon sepandine. Tiştê balkêş her erkdarekî karê xwe kiriye û destwerdan li karê erkeke din nekiriye. Herwiha cara pêşîn Cimşîdî Newroz wekî cejneke cemawerî daye pîrozkirin. Dîsa wî morên taybet ên rêveberiyê dane çêkirin: Li ser mora cengê "merhemet û siyaseta baş", li ser mora bacê "dadwerî û avadanî", li ser mora ragihandinê û peyamnêran "rastî û duristî", li ser mora dozgeriyê "însaf" daye nivîsandin û ev mor heta desthilatdariya mislimanan jî hebûne, misilmanan ev mor betal kirine.

Mela Ihsan li feqiya nihêrî û dît ku êdî westiyane, pirtûka di destê xwe de girt û got:

-Heta vê derê qala tiştên xweş û baş hate kirin; lê ji sibehê re xwe amade bikin ku destpêka nebaşiyê ye. Hûn ê wê çaxê qedrê qenciyê bizanibin. Ji ber ku heta mirov tiştekî winda neke qedrê wî nizane. Feqî ji hucreyê derketine nava mizgeftê; hinekan dersên şagirdan dan, hinekan dersa hildayî muzakere kirin, hinekan destnimêjên xwe teze kirin û hinek jî li derfeteke cixarekêşanê geriyan. Di medreseyên Kurdistanê de piştî hînbûna alfabeya erebî Quran û tecwîd tê xwendin; paşê di rêzê "Mewlûd"a Melayê Bateyî, "Nehc'ul-Enam"a Mela Xelîlê Sêrtî, "Nûbihar" û "Eqîde"ya Ehmedê Xanî tê xwendin. Di vê astê de navê xwendekaran şagird an jî suxte ye û bi xwendina "Xayet'ul-Ixtisar" digel şerha wê ya "Ibn'ul-Qasim"ê dawî dibe. Di asta duyem de navê wan dibe "feqî" û dest bi xwendina pirtûkên rêzê yên ziman, tefsîr, hadîs, fiqih, usûl û dîrokê dikin. Piştî vê asta sêyem û dawîn xwendekar dibin "mela" û ji xwe re mizgeftekê an jî medreseyekê hildibijêrin û dest bi

dersdariyê dikin. Şagird li nava mizgeftê an jî medreseyê dersan werdigirin û dubare dikin; lê feqî û mela di hucreyê de dersan hildigirin, di derveyî hucreyê muzakere dikin.

Dîtira rojê feqî ketin hucreyê û Mela Ihsan ji wan pirsî:

-We çi ji dersa duhîn fêm kir?

Mîrê medreseyê ber hevalên xwe ve bersiv da:

-Seyda, ez benî! Me hew dizanibû ku dîrok qala bûyeran dike; lê piştî xwendin û muzakereyê em hatin ser wê qinyatê ku dîrok pileya yekem a siyasetê ye.

Dêmên Seydayî ji şabûnê geş bûn û pêwistî bi şîroveyeke kurt dît:

-Belê, tesbîta we di cih de ye. Îcar divê hûn bizanibin ku dîrok hinekî jî bûyerên cengan e; lê ew qala cengên reşekurmancî, pevçûnên li tax, gund, bajar û herêman nake. Bi rastî qala cengên xanedan, mîrekî, dûgel û împaratoriyan  dike; ji bo şeran pergaleke têkûz heye: Di cengê de serfermandar fermanan ji serokî werdigire. Êdî ev serok mîrek be, serokdewletek be an jî împaratorek be ferq nake; serok serok e û ew biryara dawîn a wê sazûmanê eşkere dike, berpirsiyarê giştî ye. Çi dema ku artêş têkûz dibe û hêza xwe xurt dike -beriya ku wargeha xwe li cihekî dayne- divê serfermandar hêmanên cihêreng bigihîne hev û wan di qalibekî de ro bike. Piştî vê jî dor tê minawereya taktîkî û ev jî pêngava hera dijwar e. Dijwariya minawereya taktîkî jî ev e: Divê tiştê dûredest bikî berdest û neyîniyê jî vegerînî erêniyê. Her wiha heke tu bikaribî riyeke dirêj û çemberkî bidî ber xwe, dijminî bixapînî û wî ji riya xwe dûr bixînî; -lêbelê her çiqas piştî wî bi rê ketibî jî- heke tu bikaribî beriya wî xwe bigihînî cihê armanckirî; ev tevgera te nîşaneya dehaya te ya xapandinê ye.

Dema ku Seyda bi cînavkên “tu” û “te”yê peyivî hinek feqî û mela beşeve hatin; li ser vê yekê Mela Ihsan got:

-Gelî xortan, di ilmê niha de du peyv hene ku hûn jî dixebitînin; lê dibe ku wateyên wan baş nizanibin. Ev peyv “empatî” û “sempatî” ne ku di “empatî”yê de mirov xwe dike şûna muxatabê xwe û di “sempatî”yê de mirov piştgiriyê dide muxatabê xwe. Dema ku mirov dîrokê dixwîne rola van her du peyvan baş xuya dibe. Di mijareke dîrokî de mirov carinan xwe dike şûna qehremanê baş û piştgiriyê dide tevgerên wî; lê bibêjin dijwateyên empatî û sempatiyê çi ne?

Dema ku feqî û Melayan diyar kir ku “antîpatî” û “dijayetî” ne, Mela Ihsan berdewamî da axaftina xwe û bi çend hevokan pêşgotin qedand:

-Minawereya ligel artêşekê kêrhatî ye û minawereya digel coleke bêserûber pir xeternak e. Heke tu ji bo serkeftineke mezin artêşekê bi hemû çek, posat û amûran ve derxî raperînê, teqez tu dê pir dereng bimînî. Ji aliyekî din ve heke tu ji bo heman armancê amûreke leşkerî ya sivik piştguh bikî, ji bo anîna vê amûrê jî tu dê mecbûr bimînî ku bikevî bin barê gelek mesrefên hûr û gir. Baş e, bila pêşaxaftina me ya îro evqas be û em ê sibehê bidomînin; herwiha em ê qala “antîpatî” û “dijayetî”yê jî bikin; lê niha pirtûkên xwe vekin ku em ji cihê mayî berdewam bikin.

Piştî vê şîroveyê feqî û Melayan bi peroşî û mereqeke mezin dest bi dersa dîrokê ya duyem kir: “Paşê Cimşîdî exlaqê xwe yê qenc guherî; quretî û pozbilindî kir; zorbetî li ser wezîr, kizî û fermanberên sepand; jiyana kêf û şahiyê bijart; gelek kar û barên siyasî yên ku berê bi xwe dikirin siparte bêehliyetan. Pîrhesp nihêrî ku milet ji kiryarên Cimşîdî tengezar e û dorhêla wî ji tevgerên wî ne razî ne. Lewre planek danî û milet li hemberî Cimşîdî rakir. Cimşîdî textê xwe hişt û reviya; lê Pîrhespî ew da şopandin û di dawiyê de gihişte mebesta xwe. Dema ku Pîrhespî Cimşîd girt ew bi birekan da parçekirin û bi xwe bû desthilatdar. Nasnavê Pîrhespî Dehak e ku tê wateya “deh ahîk” ango deh bela. Dema ku bû desthilatdar zilm, sitem û nebaşiyên mezin pêk anîn; di dawiyê de axa welêt gişt xiste bin serweriya xwe. Dest bi neheqî û kuştinan kir, bacên giran li ser miletî ferz kir, jiyaneke kêf û şahiyê bijart. Dehakî du amûrên ku dişibihin marên mezin dane çêkirin; ew li ser milên xwe dane bicihkirin, di bin cil û bergên xwe de veşartin û kengê bixwesta ew  amûr wekî maran didane livandin. Pîrhespî bi vî awayî merivên hiş-sivik didane tirsê. Dema ku zilm û sitema wî derkete ber perê esmanan, ji aliyê Espehanê mirovekî bi navê Kawa serî hilda ku Dehakî berê du kurên wî jî kuştibûn. De bila di vir de bimîne em ê sibehê derbarê Kawa de biaxivin.

Feqî û mela dîsa ji hucreyê derketin û her kesek bi karekî re mijûl bû; lê her yekî mijara sibehê gelekî mereq dikir bê ka Kawa kî ye, nijada wî çi ye û rola wî ya berî û piştî serhildanê çawa bûye. Hinekên zana hê di pêş de li çendek çavkaniyên dîtir nihêrîn û dizanibûn ku sibehê

nirxandinek dê li ser mijarê çêbe.

Sibetirê her kesî cihê xwe girt û li benda axaftina Seydayî sekinîn. Mela Ihsanî jî tê derxist ku feqî û mela amade ne û li benda pirsên wî ne:

-Hêvîdar im ku we mijar li ser hev û bin hev xist, nirxand, ji çavkaniyên dîtir xwend û li benda pirsa min in; lê ez pirsên we texmîn dikim û lewre ez ê bi agehiyeke kurt dest pê bikim: Ji gelek navên erdnîgariyê diyar e ku Espehan berê herêmeke welatê kurdan bûye, gundê Şapûr ê li nêzikî Espehanê hê hê jî kurdî diaxivin û dibêjin em kurd in. Ji aliyekî din ve, berê gelên aryayî di nava hev de bûne û wekî yek nijadî welat bi rê ve dibirin; piştî ku welatê wan berfireh bû û li welatên dereke belav bûn, têkilî bi gelên din re danîn, welatê wan rastî dagirkeriyan hat û ji hev qut bûn zimanê wan ê hevpar jî guherî. Îcar me duhî gotibû ku em ê qala “antîpatî” û “dijayetî”yê jî bikin. Antîpatî ew e ku tu muxatabê xwe dijmin bihesibînî û wekî ku dijmin e miaMelaya wî bikî. “Dijayetî” jî ew e ku tu hertim li dijî muxatabê xwe tevbigerî û derheqa wî de dijminane bifikirî.

Mela Ihsan li rûyê xwendekaran nihêrî bê ka qanî bûne yan na; wisa xuya bû ku ev agehiya kurt têra îro dikir. Lewre bi pirsekê amadehiya dersa îroyîn kir:

-Li gorî we di vê rewşê de divê Kawa çi bike û çi neke? A rast, divê Kawa artêşa xwe ya nû û bêtecrube çawa derxe pêşberî hêzeke giran a perwerdekirî û bitecrube? Neyîniyên vî şerî çi ne?

Mîrê medreseyê pêşiya giştan axivî:

-Heke tu fermanî mirovên xwe bikî da ku zend û bendên xwe girêdin; bi şev û rojan bimeşin; ji bo serkeftineke mezin duqatî riyeke asayî zêdetir wan bidî meşandin; wê hingê sê par fermandarên artêşa te dê bikevin destê dijminî. Bi vî awayî mirovên xurt dê bidin pêşiyê û yên jihêzketî jî dê bidin dû wan. Wê hingê ji deh paran pareke artêşa te dê bigihêje cihê xwe yî armanckirî.

-Belê rast e, “Meşa Deh Hezaran” jî wisa bû, -got seydayî; lê ji rûyên ecêbmayî tê derxist ku haya wan ji Anabasîsê tunene, lewre lê zêde kir:- Artêşa Romayê ya giran êriş bire ser Kardoxiyên ku bav-kalên kurdan e, di dawiyê de tenê bi deh hezar şervanî ve vegeriyan welatê xwe. Îcar ji bo ku êrişekê bibî ser dijminî, heke tu artêşa xwe 50 fersaxî bidî meşandin tu dê fermandarê hêza xwe ya yekem ji dest bikî û tenê nîvê hêza te dê bigihêje armancê. Gava tu bi heman armancê 30 fersaxî bimeşî, ji sê paran du parên artêşa te dê bigihêje cihê xwestî. Em dikarin vê riyê bidin ber xwe; lêbelê divê em ne siwareyên kel û pelên xwe dêrz bikin ne jî çavkaniyên ciriya xwe ji dest bikin.

Di vê navberê de du camêran destûr xwest ku ji bo karekî aştiyê yî lezgîn bi Mela Ihsan re biaxivin; lê seydayî Mîrê Medreseyê hêvot ku bila mêvan dersê nebirin û heta nîv-saetekê sebr bikin:

-Melacan we pir dixwest ku dîrokê hîn bibin û hûn bi xwe jî tê gihiştin ku dîrok baxçeyê siyasetê ye. Îcar bi van mêvanan re rûne, mijarê hîn be û were bi kurtî ji min re vebêje paşê em herine sulhê. Heta ku em suriştа mêvan û cînarên xwe baş nas nekin, divê em bi wan ewle nebin, bi wan re nebin hevpeyman û li gorî gotina wan miaMelaya rikberê wan nekin.

Seydayî ji xwendekaran re got ku bila dersa dîrokê bimîne piştî esrê; lê bila ji hucreyê dernekevin û muzakereya xwe li wê derê bikin. Piştî bîst deqeyekî Mîrê Medreseyê vegeriya û mijar bi kurt û kurmancî şîrove kir. Mela Ihsan piştî guhdarîkirinê berê xwe da haziran û got:

-Madem ku me got dîrok baxçeyê siyasetê ye, divê heta ku em çiya û daristanên erdekî; şîp, gelî û xetereyên wî erdî; hezge û avheriyên wî erdî baş nas nekin; ne guncan e ku em artêşekê biajonê. Heta ku em rênîşandêrên herêmî baş bi kar neyînin, em ê nikaribin sûdeke baş ji xwezayê wergirin.

Îcar Seydayî mêvan hildane hundir, wekî ku nebîhistiye guhdarî kir, vegotinên Mîr û mêvanan berawird kirin. Di bin bandora dersa dîrokê de ji xwe re got: “Beriya cengê divê xwe perwerde bikî Ihsano, divê bikaribî têkevî nava dîmenên xapînok, bikaribî her du aliyan baş mêze bikî, heqî-neheqiyê ji hev beşe bikî. Heke xapandin û xweveşartinê nizanibî tu dê li ser gotina yekî zilmê li aliyê din bikî. Dibe ku tu bi ser bikevî, lê her serkeftin nayê wateya rastbûn û duristbûnê. Rast û durist bibe ku Xwedê beşera te kor neke”

Mêvanan qala mijareke balkêş û ehmeqane dikirin: Qaşo li gundekî kera yekî dikeve nav mêrga cînêr. Xwediyê mêrgê derdikeve û dide çêran; cînar ji şerman zarokeke keçînê ya biçûk dişînin ku neyê lêxistin û şerm bike; lêbelê ji dêla ku şerm bike zaroka biçûk şeqam, kol û pînan

dişîne malê û kerê jî tîne di tewleyê de girê dide. Bavê keçikê ne ji bo kera beredayî; lê ji bo lêdana keçikê gazî pismamên xwe dike ku li cînêr bixin. Xwediyê mêrgê jî gazî pismamên xwe dike ku ji bo girêdana kerê êrişê dibine ser mala wî. Di dawiyê de pevçûnek çêdibe û xwediyê mêrgê tê kuştin. Îcar xwediyên xwînê bi qasî sê-çar mehan nahêlin ku xwînrijandî ji malên xwe derkevin, dikanên xwe vekin û bi serbestî bigerin. Di dawiya dawîn de pereyê xwînê tê dayîn û li hev tên. Ji bo ku sulh têkeve fermiyetê jî gazî Seydayî dikin ku têkeve navberê, destên aliyan bide ser Quranê û sondê bide xwarinê ku careke din teşqele dernekeve.

Herwiha ji Seydayî re dibêjin ku filan rojê danê nîvro konê sulhê tê vegirtin û ji kerema xwe re bila beşdar be. Mela Ihsan ji bo rakirina vê belayê derfet dibîne ku çend şîretan jî li wan bike û wisa bişîne.

Piştî ku mêvan diçin Mela Ihsan vedigere ser xwendekaran dibêje:

-We dît, ha ji we re şer ha ji we re dîroka mirovê xwînrij. Bila ji bîra we neçe, -rojekê Xwedê hez bike hûn ê jî bibin seyda- divê hûn li gorî mercên cengê yekîneyên xwe komî ser hev bikin an jî ji hev biqetînin. Bila lezgîniya we bişibihe bayî û hevgirtina we mîna daristanê bibe. Gava aliyên şer berê xwe dane we û hatin, bizanibin ku êrişkar û talanker mîna êgir in; lê hûn wekî çiyayekî ji cihê xwe neleqin, sabit bisekinin. Bila planên we wekî şevereşê tarî û razdar bin; dema ku hûn ji cihê xwe dileqin wekî birûskê bipekin.

Wekî ku biryar hatibû eşkerekirin, piştî esrê berdewamiya dersa dîrokê hebû. Mela Ihsan vê carê bêyî ku axaftinekê bike ders da destpêkirin: Kawa hesinger bû û destmaleke wî ya çermîn hebû ku bi wê hesinên germ digirtin. Roja ku bangî serhildanê kir ew destmala xwe ya çermîn bi serê rimekî ve daliqand û wekî ala û sembola serhildanê bi kar anî. Gelek kesan bersiva erênî da gazî û hawara wî; bangeşeya wî di nava gelên aryayî de berbelav bû. Dema ku hêza Kawa xurt êrişî dijminê xwe kir û Pîrhesp reviya. Gelên aryayî jê xwestin ku bibe mîrê wan; lê Kawayî ev pêşniyar nepejirand û got ku divê mîr ji malbateke mîran be. Ji nav xanedana Cimşîdî, Ferîdûnê kurê Esfan pêşniyarî gel kir û daxwaza wî hate bicihanîn. Gel bi vê çareseriyê razî û kêfxweş bû û meqama şêwirmendiya Ferîdûnî jî dane wî. Li ser vê yekê gelên aryayî hurmeteke mezin nîşanî wî dan, alaya wî bi gewheran xemilandin û navê wê danîn “Direfşa Kawiyanî ya Pîroz”.

Li vê derê Mela Ihsanî ders qedand û berdewamiya wê ji rojeke din re hişt. Di vê navberê de çay hate danîn û suhbeteke nirxandina metnê xwendî dest pê kir. Seydayî pirsî:

-Hûn şûna Kawa û şêwirmendê Ferîdûn bûna we dê çawa şîret bidana wî? Li gorî wê heyamê bersivên xwe bidin.

Feqiyan li çavên hev nihêrîn ku bila kesek bersiv nede heta ku Mîrê Medreseyê biaxive. Mîrî got:

-Seyda ez xulam, ez şêwirmend bûma min ê wiha şîret bikira: Dema ku tu gundan talan dikî, talanê di navbera mirovên xwe de pareve bike. Dema tu erdekî nû bi ser tixûbên xwe ve berdidî, wî erdî ji bo kar û barên leşkerên xwe parparî bike. Beriya ku tu gava xwe biavêjî biponije û bipokine. Kesê ku dek û dolabên xapandinê dizane, ew kes bi ser dikeve. Hunera minawereyê jî ev e.

Melayekî din destûr xwest û ramaneke xwe ya alîkar bi ser numûneyekê re wiha bi lêv kir:

-Seyda ez xulam, ez gelek caran fîlmên dîrokî temaşe dikim û dinêrim: Di meydana cengê de axaftin bi qasî ahenga çeng û daholê ne bandorker e. Her wiha qe nîşaneyeke rêxistinê jî bi qasî ahenga fors û alayan ne berbiçav e. Bi vî awayî çeng û dahol ji bo kesê ku nabihîze û ber bi cihekî ve dimeşe mînanî çav û guhan e. Kesê ku nabihîze bi yekîtiyeke bedenî ve tevdigere. Gelo wêrekek jî nikare bi tena serê xwe bi vî awayî karê xwe bibe serî an jî gelo newêrekek nikare bi tena serê xwe vê yekê biceribîne? Jixwe rêvebirina girseyan jî ev e.

Feqiyekî jîr jî di dawiyê de derfeta axaftinê bi dest xist û fikra xwe wiha derbirî:

-Seyda ez benî, heke mirov her du pêşniyaran nêzikî hev bike tiştekî wiha derdikeve holê: Di şerê şevê de -ji bo ku bandoreke bêtir li ser çav û guhên artêşa xwe bihêlî- divê tu gelek nîşaneyên rewneqdar û daholan bi kar bînî; di şerê rojê de jî gelek fors û alayan.

Mela Ihsan xwest ku bi axaftineke kurt beşa çayvexwarin û suhbetê jî biqedîne, her kesî bişîne ser karê wî; lewre gotinên pêşkêşkirî wiha bi ser hev de anîn:

-Pêkan e ku derûniya tevahiya artêşekê bê talankirin; her wiha pêkan e ku hişmendiya serleşkerekî jî bê talankirin. Danê sibehê derûniya leşkerekî xurt û çalaktir e; xwediyê vê derûnî ber

bi nîvro alaya xwe diçikilîne û ber bi êvarê jî hişê wî tenê bi vegera wargehê re mijûl e. Fermandarê kone rû bi rûyî artêşeke giyanxurt nabe; lê gava ew artêş laşgiran be û bala wê li ser vegerê be divê êrişê bibî serê. Ev jî başnirxandina rewşa derûnî ye. Bi rastî ez şêwirmendê Cimşîdî bûma min ê jê re şîreteke wiha bikira: Bidisîplîn û aram be, heta ku tevlihevî û alozî têkeve navîna refên dijminî. Ev jî hunera rêvebirina xweparastinê ye. Hîn ku dijmin ji hedefê dûr e, tu nêzikî wê bibe. Hîn ku dijmin di nava xebat û cengê de ye, tu amade bisekine. Hîn ku dijmin birçî û zibilî ye, tu têr û givirî be. Ev jî hunera bidestxistina hêza kesekî ye. Gava alayên artêşekê baş rêzakirî bin, xwe li rawestandin û eglekirina wê daynene; gava artêşekê teletel amadekariyên cengê kiribin û yekîneyên xwe pisporane rêza kiribin, xwe li êrişkirina wê daynene. Ji vê hunerê re mercnasî tê gotin. -Wekî rêbazeke leşkerî- yekîneyên xwe ber bi jor neşîne ser dijminê li jorê bicihbûyî; her wiha yekîneyên xwe ber bi jêr neajo ser dijminê li jêrê bicihbûyî. Dijminê ku fêlbaziya revê dike neşopîne û nede peyê; êrişê nebe ser leşkerên ku derûniya wan xurt e. Xwarina ku di kemîna dijminî de ye çav bernedê; artêşa ku vedigere malê pê re nekeve pevçûnê. Gava te artêşek dorpêç kir, jê re riyeke revê bihêle; bi tundî neçe ser dijminekî bêhêvî. Ji vê hunerê re Hunera Cengê tê gotin.

***

Îro merasima îcazetê ya Mîrê Medreseyê bû û dê piştî dersa dîrokê biçûya welatê xwe. Lewre hilbijartina mîrekî nû pêwist bû ku feqî û melayan giştan Mela Celîl pêşniyar dikirin. Mela Celîlî kêmek berê pirtûkên rêza duyem a perwerdehiyê qedandibûn. Êdî dikaribû dersên “Tesrîf”, “Zurûf” û “Terkîb”ê yên kurmancî bide; herwiha dikaribû dersên “Bacûrî”, “Şerh'ul-Muxnî” “Seidullaha Sexîr”, “Wereqat” û “Tefsîra Celaleyn” jî digel hevalên asta xwe muzakere bike. Mela Ihsan sedema vê pêşniyarê pirsî bû û bersiva “bi xwendekarên her astê re heval e û ji aliyê her kesî ve tê hezkirin” wergirtibû. Lewre pêşniyara wan pejirand û wekî Mîrê Medreseyê hate nasandin, jê re duayên serkeftinê hatine kirin û dest bi karê xwe kir.

Di vê dersa xwe ya paşîn de mîrê kevn dilşkestî bû ku wê ji dersa dîrokê bêpar bimîne; lê meha remezanê hatibû û li gundê wî derfeta melatiyê hebû. Lewre divê biçûya ser mal-halê xwe, dest bi karekî bikira ku ji xwe re hêlînekê çêke. Mela Celîl da pêşiya feqî û melayan, ketine hucreyê û di amadebaşiyê de sekinîn; lê ji bo hurmeta mîrê kevn her kes dîsa bêdeng bû ku dersa dawîn jî bi rê ve bibe. Bi destûra seydayî dersê dest pê kir: “Ferîdûnî bi alîkariya Kawayî Dehak têk bir, ew dîl girt û li çiyayê Demawendê ew kuşt. Piştî serkeftinê Ferîdûnî dest danî ser hemû mal-milkên Dehakî, bi liv û tevgereke baş rêvebirî meşand û hemû tiştên ku bi zilmê ji milet hatibû standin li xwediyan vegerand. Ferîdûnî welat li ser sê eyaletan pareve kir û sê kurên xwe wekî walî tayîn kirin: Eyaleta Iraq, Hindistan û Hicazê da kurê xwe yê bi navê Îreg; herwiha ew wekî mîrnişînê xwe da naskirin û ew li ser her du birayên din re girtin. Eyaleta Roma, Misir û Afrîqayê da kurê xwe yê bi navê Şerm. Eyaleta Tirkistan, Çîn û Maçîn jî tê de tevahiya Asyayê jî da kurê xwe yê bi navê Tûg. Lêbelê piştî mirina Ferîdûnî, Tûg û Şermî gotina xwe kirine yek; êriş birine ser Îregê ku dê li şûna bavê xwe rûnişta û ew kuştin. Piştî kuştina Îregî, Şerm û Tûgî welat di navbera xwe de pareve kir û wekî du desthilatdarên serbixwe li rûkalê cîhanê serweriyên xwe meşandin. Paşê kurekî Îreg ê bi navê Menûçehr ji bo tolhildanê serhildanek li dar xist; artêşa xwe damezirand û milkê bavê xwe rizgar. Paşê berê xwe Tirkistanê, doza xwîna bavê xwe kir û apê xwe yê Tûg kuşt. Pişt re berê xwe da Şermî, apê xwe yê li Romayê û ew jî kuşt. Ji nav kurên Tûgî kesekî bi navê Efrasyabê Tûg rabû, bi Menûçehr re şer kir û li Taberistanê ew dorpêç kir. Lêbelê her duyan li ser peymaneke aştiyê li hev kirin û çemê Yelxê wekî tixûbê her du welatan diyar kirin.”

Piştî vê dersa dawîn a mîrê kevn çayê hate vexwarin; nîqaşeke hûr û kûr li ser peymanên Qesra Şîrîn, Sykes-Picot û Pîrozeyê dest pê kir. Dema ku berê nîqaşê vegeriya ser Kurdistana Sor, Komara Agirî û Mehabadê, damezrandina Herêma Kurdistanê û Rojavayê wext êdî teng bû û mîrê kevn destûra çûyînê xwest.

**Şevbihurkek Li Laçînê**

Ji sala 1920î heta 1930î li Yekîtiya Sovyetê polîtîkaya “xîmavêtin”ê hate meşandin û di vê heyamê de xîmê dewletê li ser herêmên nijadî hate avakirin; lêbelê sala 1945an beşeke kurdên Kafkasê ber bi Asyaya Navîn ve hatin sirgûnkirin û ev pêvajo sala 1956an hate bidawîkirin. Di destpêka xîmavêtinê de para kurdan jî Kurdistana Sor bû ku paytextê wê Laçîn hatibû hilbijartin. Li gorî serjimariya sala 1926an gelheya kurdan derdora 70 hezarî bû û perwerdehiya wan bi kurdî hebû. Lê Stalînê gurcî serokê Sovyetê yê duyem bû; ji bin ve biryar dabû ku pêşerojekê ji gurciyan amade bike. Lewre tirkên axiskayî, kurd û hemşînên laz ji derdora herêma gurciyan dûr dixist ku di pêvajoya dewranê re welat tenê ji wan re bimîne.

Skenderê Fazilê Siwaro jî welatiyekî herêma Kurdistana Sor bû û sala 1896an li Laçînê hatibû cîhanê. Dema ku 21 salî bû şoreşa bolşevîkan pêk hatibû û ew jî tevî partîzanan beşdarî bûyerên şoreşgeriyê bibû. Sal derbas bibûn, di nava Partiya Komunîst de cih girtibû û di dawiyê de li akademiyeke leşkerî jî xwendibû. Dema ku Kurdistana Sor ava bûbû jî wekî serhengekî artêşê karê xwe domandibû.

Laçîn paytextê bûbû paytextê Kurdistana Sor a xweser ku rûberê wê ji Genceyê dest pê dikir û digihişte çemê Erez. Parêzgehên wê yên sereke Kalbajar, Qubadî, Zengilan, Cebrayîl, Zengezûr, Muradxan, Qotur û Kurd Hecî bûn. Serokê wê yê pêşîn Hisênê Hacî yê ji bajarê Şûşayê bû; artêşeke wê ya topavêj û siwarî hebû. Rojnameya wê ya Kurdistana Sovyetê bi kurdî diweşiya, bi alfabeya wê ya latînî pirtûk dihatin amadekirin û li dibistanan perwerdehî bi kurdî bû. Îstgeha radyoyê û dibistaneke perwerdekirina mamosteyên kurd li Şûşayê hatibûn avakirin. Lê mixabin ev geşedan gişt wekî şevbihurkekê derbas bûbûn û bi komkujiya Xocaliyê re vegeriyabûn şîneke neteweyî.

Siwaro di cenga cîhanî ya duyem de ferman ji serfermandar Stalînî wergirtibû ku artêşa xwe rêza bike û hêzên xwe bigihîne hev.

Siwaro li ser vê fermanê serbaz û leşkerên xwe yên herî bijarte veqetandibûn, perwerdehiyeke taybet dida wan, bi minawere û taktîkên nû meşqa cengê derbas dikir. Piştî perwerdehiyê yekîneya wî ber bi Moskovayê bi rê ketibû û riya bi rojan dest pê kiribû. Lêbelê beriya ku li trênê siwar bibe telgrafek jê re hatibû: “Gava tu li welatekî dijwar bî wargeha xwe daynene; gava li welatekî bisekinî ku makerê hev dibirin û tu nizanî rûgeha te çawa ye, tu mil bide hevpaymanên xwe. Li şûnwarên xewle bi tu tiştî egle nebe. Di rewşa gemaroyê de stratejî û xapê bi kar bîne.”

Siwaro telgraf qat kir, kire bêrîka xwe û cixareyek sotand. Ajovanê leşkergehê ew û çend fermandarên din danîne rawestgeha trênan ku leşkerên wî jî li bendê bûn. Siwaro piştî kêf-hal pirsînê fermanberên xwe hêvotin:

-Binêrin, hinek rê hene ku divê mirov tê re neçe; hinek artêş hene ku divê mirov êriş nekê; hinek bajar hene ku divê neyên dorpêçkirin; hinek şûnwar hene ku ji bo wan şerkirin pêwist nake; hinek fermanên serokî hene ku nayên daxwarin.

Hevoka paşîn a serheng Sîwaro ku got “hinek fermanên serokî hene ku nayên daxwarin” baş nehate fêmkirin; lewre leşkerekî xelqê Zengezûrê şîroveya hevokê xwest; lê wî bersiv neda û bi ser de zêde kir:

-Serfermandarê ku tê digihêje -bê ka berjewendî di bikaranîna kîjan stratejiyê de ye- dizane bê ka ew dê çawa hêzên xwe bi rê ve bibe. Serfermandarê ku bi van tiştan nagihêje her çiqas wî welatî qul bi qul bizanibe jî nikare vê zanîna xwe wergerîne berjewendiyeke berbiçav.

Leşkerê zengezûrî fêm kiribû ku li meydana cengê ferman di destê wijdana mirovî de ye; her çiyê ku ji bo berjewendiya dewlet pêwist e divê bê kirinê. Ji ber ku serfermandar hertim li qada şer nasekine; lewre divê şervan bi xwe jî hinek taktîkan biafirîne.

Fîqa nobedarê rawestgehê lê xist, hêdî hêdî rêwî ber bi vagonan meşiyan û piştî xatirxastina dost-nasan siwar bûn. Tûtetûta trênê mîna oreora dewareke zêriyayî bêdengiya Laçînê qelaşt û di nava mij û moranê de winda bû.

***

Siwaro di dêst de pirtûkeke operasyonan, ji paceyê re li derve dinihêrî. Trên mîna marekî ku ji nava çêreyê re bixijike di nava daristan, çiya û geliyan re derbas dibû; beriya her rawestgehê dioriya, hûfehûf dikir û dîsa bi heman awayî dikişiya. Pirtûka destê xwe şîşî bin balgiyê xwe kir, bi korîdorê re ber bi destşokê çû. Berî ku têkeve destşokê baş li leşkerekî nihêrî û jê re:

-Ji cihê xwe neleqe, heta ku derketim, -got û bêyî ku li benda bersiva wî bisekine derî bi ser xwe de girt.

Dema ku ji destşokê derket, ew leşkerê zengezûrî berferman amade bû û bersiv da:

-Amade me, hevalê serheng!

Siwaro destekî xwe da ser milan û jê pirsî:

-Tu ji ku yî?

-Ji Zengezûrê me, hevalê serheng!

-Ji kîjan berekê yî?

-Birûkî me, hevalê serheng!

-Li karê Xwedê binêre, ez jî birûkî me û em çawa birbrî bûne ku birek hay ji birê din tuneye.

-Hevalê serheng, ez endazyar im û teze beşdarî artêşê dibim. Dema ez hatime paytext Laçînê hîn bûm ku cenabê te birûkî ye; lê min xwe ranegirt ku nasiya xwe bidim we.

-Wisan e ji vê saetê şun de gava em her du tenê bin navê min bikşîne, a baş kurt-kurmancî bibêje Siwaro.

-Îcar temenê cenabê te ji min zêdetir e, xîreta min qebûl nake. Ez ê hema bibêjim hevalê Siwaro.

-Baş e, şagirdê şeran ê ku di hunerên cengê de li ser guhertina planan perwerde nebûye her çiqas ew pênc xalên ku min li rawestgehê gotî zanibe jî ew dê nikaribe sûdeke baş ji mirovên xwe wergire. Pêşengê zana divê sûd û xetereyan li ber çavan bigire û paşê teşeyekê bide planên xwe. Roja ku me piyê xwe avête akademiyê me wisa hesiband ku em bi rastî jî di nava cengê de ne; her çiqas cenga li ber dêrî nedihate bîra me jî me dizanibû ku her gav cengek pêkan e.

-Hevalê Siwaro, wisan e roja ku me fermana şer wergirt, her çiqas em ji eniya şer dûr bin jî divê hişê bi planan werzişê bike.

Serheng Siwaro bi serê xwe işaret dayê ku "erê"; paşê hinekî bêdeng sekinî, pişt re got ku ew ê li ser şîvê berfirehî biaxivin û pêşniyar kirê ku hinekê bêhna xwe bistîne.

***

Li xwaringeha trênê Serheng Siwaro digel hin serbazan rûniştibû; xuya bû ku xwarina xwe xwariye, lewre cixareyê dikêşe; lêbelê maseya wî dagirtî bû û cihê rûniştinê ji bo leşkerekî bêpaye tunebû. Bi çavpêketinê re Siwaro destê xwe jê re ba kir ku were. Leşkerê zengezûrî silaveke leşkerî da û li piyan li ber fermanê amade bû. Serbazekî ku li ser maseyê berê wî di Siwaro de wiha digot:
-Di vî şerî de Xwedê bizanibe em dê çiqasî li gorî zanyariyên xwe yên leşkerî tevbigerin. Waneyên ku me dan an jî wergirtin wê niha bi kêrî me werin. Pisporiya me divê bi kêrî berjewendiya giştî be. Heke planên me serfermandaran li ser vê bingehê hatibin avakirin em dê bikaribin beşa bingehîn a pêşnumaya xwe bi awayekî serkeftî bigihînin encamê.

Serbazekî din ku piştgirî dida ramanên wî çavek li hevalê xwe û yek li Siwaro wiha digot:

-Ji aliyekî din ve heke em -digel dijwariyên heyî- her tim amade bin ku berjewendiyan bi dest bixin wê hingê em ê bikaribin xwe ji çewtiyan jî rizgar bikin.

Siwaro wekî ku gotina her du hevalên xwe yên serbaz biçespîne nirxandineke wiha kir:

-Ji bo daxistina rêjeya dijminan divê em rêjeya ziyanê zêde bikin; her tim wan di hev de bixînin; balkêşiyên xapînok derxine pêşiya wan; wisa bikin ku ew ji bo van xapxapokan birevin her kuncê nîşankirî.

Piştî vê gotina xwe Serheng rabû piyan, ji hevalên xwe re got ku ew dê bi kurê nasekî xwe re hinekî derbarê êl-eşîrê de biaxive. Heval li hev keniyan û Siwaro destek li ser navmila leşkerê zengezûrî çavê xwe li maseyeke vala gerand; lê mase tijî bûn û hinek leşker li piyan sekinîbûn ku kî rabe li şûnê rûnin. Lewre ji leşkêr re got ku ber bi korîdorê herin:

-Hevalo, min ji te nepirsî navê te çi ye? Te şîv xwariye yan na?

-Hevalê Siwaro navê min Lezgîn e û min şîv zû xwar ku ji fermana cenabê te re amade bim.

Ji korîdora vala re derbasî aliyê destşokan bûn ku paceyeke biçûk hertim vekirî ye. Siwaro cixareya xwe derxist, yek sotand û yek jî dirêjî Lezgînî kir. Lezgînî cixareya xwe bi ber guhê xwe re kir; lê Siwaro jê xwest ku pêxe. Her duyan bêdeng cixare dikişandin ku Lezgînî bi pirsekê axaftin da destpêkirin:

-Hevalê Siwaro, wekî ku min got pîşeyê min endazyarî ye. Îcar hûn rozgara vî şerî çawa dibînin? Em ê sax-silamet dîsa vegerin nava êl-eşîrê yan na?

-Lezgîncan, hunera cengê wisa hînî me kiriye ku em li gorî ihtimala nehatina dijminî amadekariyên xwe nakin; lêbelê li gorî bersivdana êrişa dijminî amadekariyên me hene. Herwiha em rewşa xwe li ser vê rastiyê ava dikin: Top li hêza me bikeve jî divê belav nebe. Divê em herin, ziyanê bidine dijminî û vegerin.

-Hevalê fermandar, hûn ji vî şerî natirsin, ji ber ku pîşeyê we ye; lê ez ditirsim ku seqet vegerim an jî dîl bikevim û qe venegerim. Ez nizanim ev çewtiya kesayeta min e, yan çewtiya ramanên min e.

-Lezgînê bira, em ne perî û milyaket in. Em jî çewtiyan dikin; lê divê em çewtiyên xwe zû sererast bikin ku ziyan hindik be. Îcar pênc çewtiyên xeternak hene ku bandorê li ser serfermandarekî dikin:  Xemsariya ku mirovî kaşî helakê dike, newêrektiya ku mirovî dike dîl, zû tengijîna ku bi riya tehn û niçan disincire, hestyariya ku bi rewşeke şermezariyê rûmeta wî bişkê, tatêla ji bo fermanberan ku mirovî diajo xem û tengezariyê. Hinekî dirêj bû, nizanim te fêm kir?

-Belê hevalê fermandar, fehmdarî ye. Îcar kîjan çewtî zêdetir bandorê li ser me dikin?

-Di çar çewtiyên pêşîn de em hevpar in; lê çewtiya paşîn ji bo leşkerekî wiha ye: tatêla ji bo fermandaran ku mirovî diajo xem û tengezariyê. Heke ev pênc çewtî ji pêsîra serfermandarek an jî leşkerekî nekevin, bandoreke wan a wisa wêranker heye ku encama cengê jî diguherîne. Heke artêşek têk here û pêşengê wê bê kuştin teqez sedemkarê encamê di nava van pênc çewtiyan de veşartî ye. Li ser vê mijarê hûr û kûr biponije û bipokine.

Piştî vê axaftinê Serheng Siwaro hewl da ku bi Lezgînî re zêde derbarê dijminî û taktîkên cengê de neaxive û hişê wî tev li hev neke. Ji xwe re got: “Ev belengaz leşkerek e û evqas agehiyên leşkerî jê re ne pêwist in. Tiştê ku jê re pêwist e amadebaşî û pêkanîna fermanan e.” Leşker û serbazan xwarin xwaribû, hinek ji bo cixareyê, hinek ji bo destşokê û hinek ji bo galegalê derketibûn korîdorê; lewre vegera wan a li odeyan baştir bû û ji ber vê egerê xatir ji hev xwestin.

Piştî çend rojan trêna wan gihişte rawestgeha Moskovayê; serheng Siwaro digel hêza xwe derbasî biryargeha navendî bû û ewraqên xwe pêşkêş kirin. Wê şevê tevahiya hêzê dê li razanxaneyekê bima û sibetirê li gorî pêwistiyên navendî dê bihata belavkirin. Piştî şîvê û çayvexwarinê serheng Siwaro hêza xwe li razanxaneyê civand û bi dengekî nizm gote wan:

-Gelî kurmancan, sibê riya me ji hev vediqete; em dê bêne belavkirin û dibe ku em careke din hev nebînin. Dibêjin “çûyîn heye hatin tuneye; hatin heye dîtin tuneye”. Min di akademiyê de gelek pirtûkên li ser Rojhilata Navîn û bi taybetî jî derbarê kurdan de xwendine. Binêrin, tevahiya pirtûkan qala lehengî û wêrekiya me dikin. Rast e, em wisan in; lê çima xelq hertim vê taybetiya me dide pêş? Ji bo ku em bidine pêşiyê, mîna ardefa devê sobeyê bişewitin û ew jî bi me xwe germ bikin. Ez nabêjim we newêrek bin û xwe biavêjin pişt mirovan; lê divê hûn nebine kuştiyên ber xelqê de, her kes çawa hûn jî wisa, ne kêm ne zêde. Hêvîdar im ku hûn ê gişt sax-silamet vegerin Laçînê û em ê bi şevbihurkekê vegera xwe pîroz bikin.

***

Bi têkçûna Almanyaya Hîtlerî re leşkerên ku ji komarên sovyetî hatibûn şandin dîsa vedigeriyan gund û bajarên xwe. Êdî her kes dê vegeriya ser kar û barê xwe yê beriya cengê û jiyana xwe ya asayî bidomanda; lê ji bo kurdan wisa nebûbû.

Serheng Siwaro jî vegeriyabû Laçînê û roja xwe ya pêşîn li biryargehê amade bû. Piştî silavkirina hevalan derbasî nivîsgeha xwe bibû, lîsteyeke hêza xwe hildabû destê xwe û li navan

dinihêrî; paşê li zengilê xist ku yawerê wî bikeve hundir. Dema ku leşkerê ciwan kete hundir jê xwest ku navên lîsteya wî bi navên leşker û serbazên ji şer vegeriyayî re bide ber hev; raportekê ber bi êvarê pêşkêş bikê.

Ber bi êvarê yawerê Siwaroyî li dêrî xist, bi silaveke leşkerî lîste radest kirê, bi bîra wî xist ku ji bo işaretên li ber nava şîroveyek nivîsiye û derket. Serhengî li işaretên li ber navan nihêrî, li ber hinekan kêmek, zêdek, çeperast û pirsnişan hene. Li şîroveyê nihêrî ku kêmek tê wateya mirinê, zêdek tê wateya jiyîn û wergirtina nîşanên serkeftinê; lê işaretên çeperast û pirsnişanê di wateyên dîlketin û windabûnê de bûn. Li gorî lîsteyê ji yekîneya wî ya 68 kesî, jê 12 hatibûn kuştin; 25 kes sax bûn, nîşan wergirtibûn û vegeriyabûn malên xwe; 6 kes dîl ketibûn û 35 kesên din aqubetên wan ne diyar bûn ku windabûyî hatibûn hesibandin. Siwaro dîsa li zengilê xist û yawer kete hundir; jê pirsî bê ka kesên windabûyî li gorî çi windabûyî hatine hesibandin. Yawerî bersiv da:

-Cenabê serheng, ew kes venegeriyane malên xwe û heta çend mehan berê jî name şandine. Îcar kes nizane gelo sax in an mirî ne.

-Baş e, xwe bi bigihîne vî kesê ku navê wî Lezgîn e; bila demildest were cem min.

-Ser çavan, fehmdarî ye cenabê serheng.

Yawer piştî nîv saetê vegeriya û agehî dayê ku li gorî fermana giştî ya artêşê leşkerên sivîl hatine terxîskirin; lewre kesê bi navê Lezgîn vegeriyaye mala xwe. Siwaro hîn bû ku ew leşkerên beriya wî vegeriyane Laçînê gişt çûne malên xwe.

Siwaro êvarê derê nivîsgeha xwe kilîd kir û xwe berda kolanên Laçînê. Lê bajar ne ew bajarê berê yê heyama Kurdistana Sor bû. Ji ber ku sala 1929an statûya Kurdistana Sor daxistibûne herêmeke Azerbaycanê û sala 1937an jî navê wê bi tevahî ji holê rakiribûn. Êdî bajarên wê yên sereke di nexşeya Sovyetê de wekî bajarên Azerbaycan û Ermenistanê xuya dikirin. Piştî şerê cîhanê yê duyem kurdên herêmê li ser xwesteka azerî û ermeniyan li komarên Sovyetê hatibûne belavkirin.

Siwaro di kolanên bajêr de wekî teyrekî beytû digeriya û qe hez nedikir rastî kesekî nas were; lewre berê xwe dabû tax, kuçe û kolanên teze yên bajêr ku piraniya wan azerî bûn. Dizanibû gava here malê jin û zarok nahêlin bi kêfa dilê xwe bifikire; dibe ku ji ber bîranînekê çend dilop hêsir ji çavan biavêjin û bila tu bendeyê Xwedê pê nehese.

Siwaro di vê gera xwe ya li nava rûpelên dîrokê yên tozgirtî de şopgerek bû; li şûn û şopa bav-kalên xwe digeriya. Bîra wî xurt bû, gotinên kalik-pîrikên wî dihatine bîrê; çîrok û destanên gelêrî di hişê wî de zindî bûn. Li gorî zanyariyên wî yên bihîstî, dîtî û xwendî ev herêma Kafkasê demekê di destê kurdan de bûye; li vê herêmê Medan, Aran Şahiyan, Mehraniyan, Şîrvan Şahiyan, Deysemiyan, Rewadiyan, Şedadiyan û Penahiyan hespên xwe bezandine; navên gelek şûnwarên erdnîgariyê hê hê jî bi kurdî ne.
Siwaro bi awayekî wisa hêdîka û çîloçepî dimeşiya ku te digot serxweş e; lê bi rastî wî bi dîsîplîna serbazekî agehiyên xwe berhev dikirin. Di xwendineke xwe de rastî navê Deysem Brahîmê Kurd hatibû ku di sedsala 9an de li bajarê Berdeyê Mîrekiya Deysemiyan damezrandibû; serweriya xwe berfireh kiribû û bi ser navê xwe sike û pere dabûn çapkirin.

Li hinda parkekê sekinî û bi qasî nîv saetê rûnişt; digel kêşa cixareyekê noqî nav cildekî din ê dîroka kevnare bibû. Şedadiyan di sedsala 10 û 11an de li Genceyê dewletek ava kiribûn û serwerê wê yê pêşîn Mihemedê kurê Şedad ji eşîra rewadî bû. Îcar wê gavê eşîra Silhedînê Eyûbî û binemala rewadiyên Dabil-Dvînê hate bîrê. Ji xwe re got: “Dibe ku navê 'dimilî' ji vir hatibe? Gelo rewadiyên Dabilê dimilî bûne yan zaravayê wan bi navê bajêr hatiye navdar bûye? Gelo Silhedîn kurdekî dimilî yan jî dunbilî bûye? Wisan navê bajêr ê kevn Dunbul e yan Dumil e. Gelo sînorên bakur û başûrî yên kurdan ji Dabilê heta Babilê bûye? Te çima ewqas hindik dem ji dîroka gelê xwe re veqetand Siwaro? Tu li pey kariyer û peywiran ketî û îro li vê parka req-rût hişê te hatiye serê te. Heywax li te belengazo?”

Siwaro park terikand û kete kuçeyekê ku hinek jinên azerî li ber derê malekê kom bûbûn û

diaxivîn; dema ku çavên wan bi Siwaroyê serbaz û rayedar ketin rabûne piyan û bi devkenî ew vexwendine malê û vexwarina votkayekê. Yekê bi porê xwe dilîst, yekê pêşa xwe piçekê bilind dikir, yekê kêleka xwe dixurand. Siwaroyê şaşopaşo got ku wî riya xwe şaş kiriye û niha li ser peywirê ye û ew li pey xwe hiştin. Êdî dest pê kir ji xwe û bav-kalên xwe re da çêran: “We çima hişt ev tirk û ermenî li vir bi cih bibin? Hûn di nava aran û zozanan de çûn-hatin; lê xelq di navbera text û paytextan de çû-hat. Wey hişê min qurbana van jinên azerî be ku hewl didin dilê her mêrî bi navranên xwe şa bikin. Van jinan û ewên ku ev jin anîne vir çi ye? Tirk kengê hatine vir?”

Siwaro bi hişê xwe yê kronolojîk di dîroka Kafkasê de lêgerînek dest pê kir: Tîmûçînê Tatarî, Tîmûrê Leng... Na, lê beriya wê? Kê dawî li serweriya Şedadiyan anî? Ma tirkên selçûqî bajarê Genceyê bi erdê ve nekiribûn yek? Haaa... A wê rojê kambaxiya jiyana me dest pê kiriye, navenda me ya çandî hatiye hilweşandin û bişaftina hêdî hêdî bi rê ve çûye. Îro gelek kesên ku xwe azerî dihesibînin ji aliyê genetîkê ve kurd in û haya dinyayê jê tuneye. Ma divê em jî wekî cihûyan li eşîrên xwe yên windabûyî bigerin û biyoljiyê de bi pêş kevin ku bikaribin ji xwînê ew parçeyên xwe yên windabûyî bibînin?

Bi ewteewta kûçikekî re Siwaro pê hesiya ku li cihekî lap nenas e û li ser riya hatî dîsa vegeriya. Di vê navberê de çavên wî li lewheyeke kolanekê ketin ku li serê “Kuçeya 24an” dinivîsî. Tiştê balkêş ciwanên ku li kolanê galegal dikirin bi kurdî diaxivîn û li vir sekinî. Bi kurdî ji wan pirsî:

-Ev navekî balkêş e, “Kuçeya 24an” ji bo çi danîne vê derê?

Ciwanekî got ku ew nizanin; lê dibe ku kalikê wan ê heştê salî bizanibe. Siwaro ji wan xwest ku wî bibine cem kalikê xwe. Xortekî da pêşiyê û wî da pey, bi qasî 300-400 mêtroyî meşiyan û gihiştin maleke mezin. Xort derî vekir, dengekî gazî hundir kir û pîrejinek derket; jê re got ku ev camêr dixwaze bi kalikê min re biaxive. Pîrejinê li taxima leşkerî û rûçikê kurdî nihêrî, serê xwe hejand û tenê got ku kerem bike.

Siwaro piştî hal-wext pirsînê sedema hatina xwe wekî balkêşiya lewheyê û mereqa xwe nîşan da û got:

-Ciwan bi kurdî diaxivîn û navê kuçeya we 24 bû ku bala min kişand. Îcar Xwedê ev mereqa min kir bihane ku em hev nas bikin.

Kalê bi beşereke xweş bersiv da û başebaş li rûyê mêvên nihêrî:

-Bi rastî ew nav pêşniyara apekî min bû. Apê min ji bavê min êpêcekî mezintir bû û di navbera bavê min û apê min de gelek xwişk û bira hebûn. Wî digot ku sala hezar pênc sed nizanim çendan de Şah Ebasê Sefewî 24 eşîrên kurdan ên mezin ji Kurdistanê şandine vê derê ku bi rûsan re li hev xin, sînorê bakurî yê Îranê biparêzin. Ji bo wê bîranînê ev nav pêşkêşî komîteya navdanînê kiribû û hatibû qebûlkirin. Bi rastî pismamekî me yî di komîteyê de dabû qebûlkirin.

Siwaro li ser navên wan eşîran û cihên belavbûna wan bi qasî nîv saetê axivîbû û xatir ji vê mala kurd xwestibû. Di rê de dîsa ketibû lêgerînên xwe yên kûr: Dema ku hekîmê îskoçî Bel, sala 1716an ji Kafkasê re derbasî Îranê dibe; li ser riya xwe gelek herêmên kurdnişîn dibîne û dibêje çemê Kurayê yê ku navê kurdan dinumîne ji vir re derbas dibe; ew kesên ku Ksenefon jê re dibêje Kardûx ku berxwedaneke wêrek li hemberî yûnaniyan dane ev kes in, wêrekiya wan hê hê jî li cem Persan meqbûl e û bi awayekî koçber dijîn, ajalan xwedî dikin. Ji ber ku Siwaro rayedarekî dewletê bû û miriyê pirtûkan bû gelek belge û îstatîstîkên li ser herêma Kafkasê û bi taybetî derbarê kurdan de ketibûn destê wî.

Siwaro ji xwendinên dîrokê dizanibû ku sala 1800î Gurcistan bi rizaya xwe derbasî aliyê Çarîtiya Rûsyayê bûye; ji ber vê yekê Îranê bi Rûsyayê re şer kiriye û têk çûye û dîsa dizanibû ku bi Peymana Gulistanê ya 1813an Azerbaycan û Daxistan jî bûne alîgirê Rûsyayê, bi vî awayî têkiliya Serheda Kurdistanê ya jorîn bi qismên din qut bûye. Siwaro îcar Osmanî anîne bîra xwe ku sala 1918an Enwer Paşa birayê xwe yê Nûrî Paşa dişîne Bakuyê, li wê derê propagandayekê dide destpêkirin; li ser vê yekê Sovyet û Osmanî dikevin qirika hev, 15ê Îlona wê salê Osmanî Bakuyê dagir dikin û 30 Oktobirê jî têk diçin û ji Kafkasê bi temamî tên avêtin.

“Gelo Lenîn çima salên 20î Kurdistana Sor dabû avakirin?” Ev pirseke girîng bû ku divê

bihata bersivandin. Siwaro pireya Xudaferîn dianî bîra xwe ku Şedadiyan bi mîmariyeke kurdî ya bê hevta çêkirine. Çend sal berê, bi rastî sala 1932an pirtûkeke Bûkşpan a derbarê kurdên Azerbaycanê de ketibû destê wî ku sînorê Kurdistana Sor a xweser di navbera Gence, Elegez, Nor-Bayazet Dereleyez û Zengezûr de dikişand. Ma kurd tenê li vê herêmê hebûn? Helbet na! Li gorî Lenînî ji bo rêvebirin û serkeftina dewleta ciwan a Sovyetê divê bi reh û rîşên nijadî yên gelên Rûsyayê nehatiba lîstin û ev mijareke hesas bû; li gorî îstatîstîk û serjimariyên fermî divê kîjan gel li kê derê zêde bûya divê bi navê wan komarek bihata avakirin. Lewre ji bo kurdan herêma Kurdistana Sor hatibû terxankirin ku piraniya şêniyan kurd bûn û bi kurdî diaxivîn; belê, li deverên din jî hejmareke kurdan hebû; lê piraniya wan bişivîbûn, zimanên xwe ji bîr kiribûn û li ser zimanên serdest dihatin hesibandin. Herwiha Lenînî dixwest bi damezrandina Kurdistaneke herêmî dilê kurdên Rojhilata Navîn xweş bike û bi saya wan bandorê li wan deveran bike. Bi rastî jî Lenîn gihiştibû armanca xwe, bi avakirina radyoyan dengê Kurdistana Sor gihandibû tevahiya kurdan; hezkirin û sempatiyek avêtibû dilê kurdan; dilê kurdên hundirîn jî xweş kiribû ku di rêza gelên din de bûbûn xwedan-maf.

Lê çima Stalînî ev statû gav bi gav rakiribû; carekê statûya wê daxistibû û carekê jî ji holê rakiribû; gelo piştî serkeftina di şer de wî dê gava dawîn biavêta û binaşeya kurdan ji binçirkê ve rakira? Li gorî Siwaroyî pêngava paşîn a Stalînî sirgûnkirina kurdan ji herêmê bû. Îcar çima? Ji ber ku ew bi xwe gurcînijad bû; lobiyeke azerî-ermenî ya xurt li Moskovayê hebû ku li ser warê kurdan şerekî burokratîk-etnîk dimeşandin; lê ava xwe di bin kayê re dikişandin ku haya kurdekî jê tunebû. Li gorî zanyariyên wî gelê ermenî ji Balkanê ye, ji xwe re dibêjin “Hay” û ji welatê xwe re “Hayistan” ku kurdan jî hertim ew mêvan hesibandine; lewre di kurdiya qedîm de ji wan re dibêjin “êrman” ku tê wateya “mêvan”ê. Îcar azerî kî ne? Nevîçirkên Tîmuçîn û Tîmûrê tatarî ne ku ketine kîjan derê ew qelandine. Her du serî jî dagirker in, ango kurm in, zîlo ne ku bi laşê kurdan ketine; heta ku tevahiya xwînê nemijin û laşî nerizînin ew dê dev ji kurdan bernedin. Her du serî jî kurdan hêdî hêdî tune dikin; eceleya wan tuneye, sed sal şun de jî tune bibin ne xema wan e. Dema ku rojnameya Kurdistana Sovyetê dihate weşandin rûpelek bi kurdî bû û sê rûpel jî bi azerîkî bûn. Dema ku Kurdistana Sor hate hilweşandin jî vê rojnameya bi heman navî, lê bi temamî azerîkî weşana xwe berdewam kir ku bişaftina kurdan bidomîne. Herwiha ermeniyan gazî kurdên êzidî kir û di nava xwe de rojnameya Riya Teze dane derxistinê, di bin banê Radyoya Rewanê de beşa kurdî dane vekirin. Aliyê azerî bêyî kurdî kurdên misilman bi xwe ve didan girêdan; aliyê ermenî bi kurdî û êzidîtiyê. Bi vî awayî di navbera taxa kurdan de qelş û derz çêdikirin ku mêwe û sewzeyên wê paşê bixwin.

Siwaro wisa texmîn dikir ku lobiya ermenî û azerî li Moskovayê baş dixebite; li ba Stalînî gotina wan derbas dibe û kurdên belengaz bi wêrekiya xwe dixwazin dinyayê ji xelqê re bikin bihuşt; lê şaş bûn, xwe ji bîr kiribûn, kûsîgirê nava xwe û masîgirê ji bo xelqê bûn, kuştiyê di ber xelqê de bûn. Cîranên wan bi hesab û tertîb bûn; dixwestin rojek ji rojan herêmê ji xwe re bikin milk, derbasî zimeta xwe bikin û bibin serwerê yekane yê erd û esmên.

Siwaro êdî gihiştibû mala xwe, biryara xwe dabû ku biçe Moskovayê, dest bi hêlîneke lobiya kurdan bike. Bi beşereke gelekî xweş kete malê, hemû endamên malê yeko yeko ramûsan, bi dilekî aram her kesî re axivî. Êdî wî qula derziyê û tayê li dûyî dîtibû. Gava ku bikribûya li cem Lenîn rêz û statûyekê bi dest bixîne dibe ku qedera kurdan biguherîne; lê şaş bû ku wî gurciyî beriya wî ev raman di hişê xwe de çareser kiribûn. Gurciyan derfeta sedsalê bi dest xistibû û dê careke din neketa destê wan. Divê ev derfet baş bihata bikaranîn û di bin navekî cuda de herêma gurciyan ji kurd, axiskayî û hemşînan bihata paqijkirin; gurên li ser sifreya wî azerî û ermenî amade bûn ku fermana wî demildest bi cih bînin. Kurdan bi gotina pêşiyên xwe nekiribû ku dibêje: “Bizin ji bo rehetiya şevekê be jî şûna mexela xwe pêkol dike û paşê mexel tê.”

Wî biryar dabû ku bi bihaneyekê tayîna xwe derxe bajarekî nêzîkî Moskovayê ku bikaribe têkiliyan girêde; ji ber ku çûyîna rasterast dibe ku dijwar be. Mixabin êdî dereng bû, Stalînî pêşeroja gelê xwe yê gurcî amade kiribû û şirîkên wî yên azerî û ermenî li ser kar bûn ku sala 1945an dest bi

sirgûnkirina kurdan kiribûn. Na, dereng nemabû; tam roja wê bû. Wekî ku cînarên wan planeke dûvedirêj daûne ber xwe, bi serê derziyê roj bi roj bihust bi bihust ber bi armanca xwe dimeşiyan ew dê jî wisan bimeşiya. Gurcî, ermenî û azeriyan ji bo pêşeroja gelên xwe paqijiyeke nijadî dikirin; lê diviyabû li benda çûyîna Stalînê gurcî bisekinin û paşê plana xwe bikin fermiyetê. Wan ji bo gelên xwe pêşeroja Rûsyayê yê ku bi ser Kurdistanê re dakeve bazarên Rojhilata Navîn bi ro de berdabûn. Divê yekî ji giregirekên xas-rûs re ev mijara stratejîk vekira; divê ev plana maran bihata eşkerekirin û qedera kurdan bihata guherandin. Wisa xuya bû ku kesekî ji wî hêjatir tuneye; lewre divê bi dîsîplîna leşkerî gav bi gav ev xeyala xwe bi cih bianiya.

***

Bi mirina Stalînî re, general Siwaro piştî panzdeh salan dest bi xebatên xwe yên lobîgeriyê kir ku êdî serbazekî teqawidbûyî li Moskovayê bû. Êdî dem, dezgeh û derfetên wî bi têra xwe hebûn.

**Apê Xwedêda**

Apê Xwedêda kalemêrekî pêncî-şêst salî bû ku cara yekem mazûvaniya hevalên kurê xwe yê xwendekar dikir. Piştî pênc keçan kurek jê re çêbûbû û demildest ew dabû xwendinê ku xelq bibêje kurê filan kesî li filan zanîngehê dixwîne. Bi çil kul-zehmetî kur dabû xwendinê û sala yekem a li zanîngehê qedandibû. Ji kurê xwe tika kiribû ku piştî ezmûnan çend hevalên xwe vexwîne malê ku bi destê xwe ji wan re berxekê ser jê ke, da ku gundî bibihîzin ku hevalên kurê hatine gund û li fêza gund pîknîkê dikin. Sedema vê quretî û xwenîşandana wî ew bû ku dilê hinek xêrnexwazan bişkîne. Kurikî gotina bavê li erdê nexistibû; lê wî jî xwestibû ku bi hevalên wî re nekeve nîqaşan û dilên wan neşkîne. Her du seriyan jî "erê" gotibûn û ev hevdîtin pêk hatibû.

Havîna sala 2013an, dema ku mînîbusa gund mêvan li ber derê Apê Xwedêda peya kirin dê-xwişkên wî ber bi keçikan û bira-pismam jî ber bi lawikan reviyabûn. Apê Xwedêda jî bi tekbîr û bismilahekê serê berxê nêr ji cendêk firandibû; avek bi ser destên xwe de kiribû û merhebatî dabû mêvanan. Mêvan esra dereng gihiştibûn ber dêrî; lê bandora germaya nîvro ji her derê difûriya, ji dîwarên kevirîn hilmeke germ diweşiya. Lewre li bin daran kulavekî xuristanî hatibû raxistin; mînder-balgiyên qedîfe li serê hatibûn rêzkirin. Piştî ku ciwan rûniştibûn Barişê ku di pola çarem de dixwend dest bi hevnasînê kiribû û navê xwediyê malê hîn bûbû:

-Apo navê te bi xêr?

-Lawo, navê min Xwedêda ye.

-Bibexşîne apo, min zehf mereq kir, îcar karmendên tirkan navê te çawa qeyd kiriye?

-Xwezila te qe nepirsiya, Hudeyda nivîsîne; -got û nerazîbûna xwe nîşan da- wexta bavê min ê rehmetî qeyda min çêdike jê dipirsin navê kurê te çi ye, ew jî dibêje Xwedêda ye. Belengazê bê xwendin û nivîsandin çi zanibûye ku di nasnameya min de çi nivîsîne.

-Tu şukra Xwedê bike ku navê te kurdî ye; em nizanin bê ka dê-bavên me ji bo çi bi van navên tewş em riswa kirine; rehma Xwedê li dê-bavê te be apo, wan kêmasî nekiriye.

Apê Xwedêda piştî wê hevnasîna kurt navê ciwanan yeko yeko pirsî û tu şîroveyek nekir. Hinekan navine kurdî û nas digotin, hinekan navine biyanî û nenas. Ciwanan li gorî rêza rûniştinê navên xwe wiha diyar kiribûn: Ozgur, Hesen, Fatme, Dîlan, Bariş, Pakîze. Bariş û Pakîze destgirtiyên hev bûn; lewre li ba hev rûniştibûn. Hesen û Fatmeyê teze dest bi axaftinê kiribû; lewre nêzîkî hev rûniştibûn û carinan gotin bi ber hev re diavêtin. Heçî ku Ozgur û Dîlan in, her yekî bi meqamekî dilîst û ava wan di cewekê de nedikişiya; lê îro gişt bi ser xatirê Ferhadî hatibûn gundê Şaneşîna Jorîn ku jiyana gundewariyê ji nêzîk ve binasin. Helbet piyên hinekên wan li gundan ketibûn; lê bi qasî şev û rojekê li wan deran nemabûn.

Piştî hevnasînê Apê Xwedêda destûr xwest ku karê xwe yê kelepîçekirina goşt berdewam bike û dîsa kêra xwe hilda, devê wê êge kir, bi eşqeke nedîtî ket ser cendekê ter û di navîna nîv saetê de sêl da pêxistin. Pêşiyê kezeb, ceger û gurçik avêtine ser sêlê; gazî ciwanan kir ku nêzikî wî bisekinin û germî germî goşt bixwin. Paşê hêt û pîl zêl kirin, avête ser sêlê û di dawiyê de parsû avêtin ser. Diyar bû ku ciwanan têr xwaribû; lê mazûvanî tika kir çend parçe hûr-doranan jî bixwin ku dilê ehlê malê rihet be. Ji ber ku ev cara yekem e mêvanê wî tên gund; mêvanan çiqasî bixwara-vexwara şêniyên malê dê ewqasî kêfxweş bibûna.

Piştî xwarinê ciwanan destên xwe şuştibûn, derbasî salona malê bûbûn û li ber televîzyonê rûniştibûn. Di hemû qanalên kurdî de bernameyeke zindî hebû ku qala "Konferansa Neteweyî ya Kurdistanê" dikir. Ji tevahiya Kurdistanê nêzikî çil sazî, tevger û komele başdarî konferansê bibûn û her pêşengekî di qanala televîzyona xwe de daxuyaniyên girîng didan. Tevahiya ragihandina neteweyî û navneteweyî li ber avahiya konferansê weşana zindî pêşkêş dikirin; lê qanalên dijmin û xêrnexwazan tenê wekî sîxuran dîmen û gotin tomar dikirin.

Piştî demjimêra nûçeyan hemû qanalên kurdan dîsa vegeriyabûn ser bernameyên xwe yên taybet; qala serkeftinên şervan, gerîla û pêşmergeyên xwe dikir. Di qanaleke kurdan de fermandêr peywira pêşmergeyan diyar dkir:

-Niha em werin ser mijara dewisandina wargehê û şopandina rêçên dijminî. Zû ji çiyayan derbas bibe û her tim li nêzikî deştan raweste. Li şûnwarên bilind wargeha xwe bidewisîne û bila berê wê li tavê be. Ji bo şerkirinê hilnekişe kêrt û girikan.

Li gorî fermandêr derheqa şerê li çiyayan de evqas zanyarî têrê dikir; lewre derbasî mijareke din dibû:

-Gava tu ji rûbarekî dibihurî divê tu bi lezgînî jê bi dûr kevî. Gava hêzeke dagirker bi meşa xwe ya asayî ji rûbarekî derbas dibe, di nava rûbarî de pê re şer neke. A çêtir ev e: Raweste, heta ku nîvê artêşê derbasî aliyê din bibe û paşê êrişê bibe serê. Heke ji bo şerkirinê metirsiyên te hebin, wê hingê divê tu li qeraxê rûbarekî dernekevî pêşberî dagirkerê ku dil heye jê derbas bibe.

Fermandêr qala şerekî destpêkî dikir, alav û amûrên wan kêm bûn:

-Keleka xwe li fêza keleka dijminî girêde û bila berê wê li tavê be. Dijraberî herka avê bi dijminî re şer neke. Derheqa şerê rûbaran de evqas zanyarî bes e. Gava tu ji golgeniyên şorik derbas dibî, bila hemû giringiya te li ser vê yekê be: Bêrawestan û hanzûka ji wan deran derbas bibe. Gava tu mecbûr mayî ku di golegeniyeke şorik de şer bikî, divê tu hem nêzikî ava vexwarinê û çêreyê bisekinî hem jî pişta xwe bidî komeke daran. Evqas zanyarî derheqa şerê li şorgehan de têrê dike.

Pêşmergeyekî pirsa şerê li şûnwarên rast û deşt dikir; li ser vê fermandêr:

-Li şûnwarê ziwa û rast jî cihekî berdest û firêqet bi dest bixîne. Bila ev cih ji aliyê piştê û rastê ve nêzikî kêrtekî bilind be. Bi vî awayî xetere ji aliyê pêşiyê ve rû dide û pişta artêşê ewle dimîne. Evqas zanyarî derheqa raperînên li şûnwarên rast de têrê dike. Bi riya van çar zanyariyên leşkerî yên navbihurî, têkçûna dijminî teqez e.

Erê, hema bi vî awayî eşkere û li ber kamerayê fermanberên xwe perwerde dikirin; lê temaşevanî nizanibû gelo ev xap, dek û fendên leşkerî ne yan taktîk û stratejiyên bikêrhatî ne. Ji ber ku fermanên ku dida bi kêrî kurdên ku li şûnwarên germ dijîn bi kêr nayê; li cem wan jî cihê sîdar û ne beroj baş bûn, rawestana berê avan xeternak bû. Her çi hebe hermandêr ji gotinên xwe bawer diaxivî:

-Hemû artêş hem kêrtên bilind tercîhî yên nizm dikin hem jî berojan tercîhî qûzeyan dikin. Heke tu xwedî li mirovên xwe derkevî û di erdekî asê de wargeha xwe bidewisînî, artêş dê ji hemû cureyên nexweşiyan rizgar bibe û ev rewş dê bi xwe re serkeftinê jî bîne.

Di wê navberê de xwişkan şirînahiyên ku ciwanan bi dest xwe re anîbûn li tebeqan belav kirin û pêşkêş mêvanan kirin; Ferhadî jî kumandaya televîzyonê danî û alîkariya wan kir. Apê Xwedêda li serê salonê, hinekî dûrî mêvanan rûniştibû; bêdeng guh dida bernameyê û carinan liv û tevgera nava malê tesele dikir. Dema ku ji wî re şirînahî dayînenîn, ciwanan pirsîn bê ka çima şirînahiya wî ji bîr kirine; lê wî bi dilnizmiyekê bersiv da:

-Gelî ciwanan, bibexşînin, kambaxa şirînahiyê şêkirê min difirîne feleka esmanan û berê min dide nexweşxaneyan. Noşî can be, fermo hûn li kêfa xwe binêrin.

Ozgurê ku li nêzikî Ferhadî rûniştibû, piştî rabûna wî kumanda hilda û qanal guherand. Dema ku çavê wî bi dîmenên Barzaniyê rehmetî ketin sekinî û xwest ku mijara bernameyê hîn bibe. Bernamesazî pêvçûna di navbera Barzaniyan û Mameşan de şîrove dikir û digot: “Piştî ku Qazî Mihemed û hevalên wî hatin bidarvekirin, hinek axayên Mameşan ji dewleta Îranê çek hilgirtibûn û ji çiyayê Spîrêz heta çemê Gadir riyên stratejîk zeftkiribûn. 23ê Sibata 1947an komeke giregirekên Mameşan li gundê Sêlwê civîn li dar xistibû; biryar dabû ku hêza Barzaniyan bêçek bikin û bibine Şinoyê; lêbelê her du aliyan li hev nekiribû, di navbera wan de şer derketibû ku ji wan duwanzdeh kes hatibûn kuştin û du pêşmergeyên barzaniyan jî şehîd ketibûn. Di ferhenga Barzaniyê nemir de çekdanîn tunebû; li gorî wî çekdanîn razîbûna biryara xelqê bû, qebûlkirina çarenûsê bû, mecbûriyeta bicihanîna daxwazên muxataban bû.”

Ozgurî bi baldariyeke bêdawî gotinên dawîn di hişê xwe de digerandin û li dîmenan temaşe dikir û hay ji kesên dorê tunebû. Di dîmenekê de hêzeke kurd li kêrtekî û yek jî li qeraxekê şûnwarê

berbiroj desteser kiribûn û pişta xwe dabûne hevrazê ku li aliyê rastê ye. Bi vî awayî hê di destpêkê de berjewendiyên leşkerên xwe parastibûn û derfetên xwezayî yên wî erdî bi kar anîbûn. Di berdewamiya dîmenan de hêzek hildikişiya herêmeke bilind, li wir baraneke xurt dibariya, ew rûbarê ku jê derbas dibûn hilpingirîbû û kef bi ser ketibû; lewre li benda rawestan û asayîbûna vê rewşê mabûn. Ji aliyekî din ve hêzên dijminî ji operasyoneke bêencam vedikişiyan û berpirsekî wan sedema vekişînê ji çapemeniya xwe re rave dikir: “Ji ber hinek taybetiyên erdnîgariyê divê em vekişine baregehên xwe, hinek tedbîran wergirin. Li vê herêmê şkêrên kûr hene, çemên sernişivî yên xurt tê re bikişin; herwiha çalên suriştî yên kûr, şûnwarên dorgirtî, darên diriyê yên gurbiz, hezge û qelîştek tê de hene. Belê, divê em ji van deran bi dûr kevin; lêbelê em dê terorîstan kaşî van deran bikin. Dema em derkevin pêşberî wan em dê wisan bikin ku bila pişta xwe bide van şûnwarên xeternak.” Wî berpirsê dijminî jî li ber ekranan stratejiyên xwe digotin, sedem û encamên operasyona xwe şîrove dikirin. Lewre hişê wî hinekî tev li hev bû, qanal guhaste ser stranan û tevî beşdaran noqî nava galegalê bû; lê Dîlanê bi zimanekî ku hem dişibihî laqirdiyan hem jî qerf û tineza jê difûriya pêşwaziya wî kir:

-Tu bi ser çavan re hatî hevalê Ozgur, bi xêra vê stranê nebûya tu beşdarî cimaeta hazir nebûyayî.

Ozgur hinekî soromoro bûyî, hinekî bi mizemiz xwe parast:

-Bi rastî min got heta suhbet xweş be ez hinekî xwe egle bikim û paşê hespê xwe bibezînim.

-Êdî dewra hespan çû birako, xelq Ferrariyan dibezîne, diçe ser hîvê, bi amûrên bêmirov şer dike û li pey jiyana li gerestêrkên din ketiye, -got Dîlanê û firek li çaya xwe xist-.

Ozgurî li ber vê gotinê danexwar, li ber xwe da ku bi bersiveke amade devê wê tehl bike:

-Hevalê, te qe nebihîstiye ku pêşiyan gotiye “li malê tuneye arvanok, navê jinê dîndarok”? Li ba xelqê heye ku li Ferrariyan siwar dibe, diçe ser hîvê, bi amûrên bêmirov şer dike û dikeve xeyalên jiyana li Marsê. Ka çiyê me heye? Em in û çend ajalokên me ne; em in çend çekên me yên sivik in; em in û aqilekî me yî sivik e.

Dîlan bi rengekî şermkirî li ber dilê wî ve hat, dev ji qerfên xwe berda û xwest ku Ozgur hinekî dilê xwe vala bike:

-Welleh, gotina te hinekî tehlovançkî bû; lê hema çêjeke nû anî suhbetê. Ka wêneyekî rewşa me bikşîne ku em jî hay jê hebin?

-Dîlan can, dema ku em hatin vî gundî çi bala te kişand, te wêneyekî çawa kişand?

-Birako, hema ez a birçî bûm û diranekî min jî diêşiya; min qe nizanibû ez çawa hatim. Piştî xwarinê min êşbirek daqurtand û niha piçekî baş im. De bibêje ka te çi dît û kîjan wêne kişand

-Min li şûnwarên vî gundî nihêrî, bi çavan lêgerîneke baş pêk anî û bi dorfirehî tesele kir: wargeha gund li kêleka herêmeke çiyayî ye, li kêleka riyan golegenî hene û bi çêreyên avî ve rapêçandî ne; çal û kortên vê derê tijî qamîş in, daristanên wê ji binî ve lihevaliyayî ne. Ev şûnwar ji kemînên dijminî xalî nabin û sîxurên ziyankar dikarin li wan deran teleyan daynin.

Diya Ferhadî, meta Gulanê xwe negirt û hewl da ku avê li dilê ciwên bireşîne:

-Xwedê neke camêro, ev der ewle ne, devê xwe bi xêrê veke. Ev çendî çend sal in li aliyê me pozê merivekî jî xwîn nebûye. Dilrehet be, ka bila apê we yê Xwedêda ji we re çîrokeke rastîn a sîxuran bibêje ku li vî erdî ne sîxuran ne jî dijminan zêde nikaribûye pê bikutine erdê; gişt rezîl-riswa reviyane û çûne.

Apê Xwedêda neçar ma ku çîroka “Şêxê Çadirê” bide ber bayî û bêjing bike:

-Dema ku ez ciwan bûm li taxeke Bazîdê navê şêxekî derketibû û xelq êvaran diçû serdanê; me gundiyan nikaribû herin. Divê em herî dereng piştî esrê ji bajêr raqetiyana û ber bi êvarê bigihiştana gund. Xwedê xera bike, wê hingê erebe-merebe jî tunebûn û em peyatî yan jî bi siwarî diçûne Bazîdê. Min rojekê ji meta we ya Gulanê re got ku ez ê wê şevê li Xana Behço bimînim û herime serdana “Şêxê Çadirê”. Bi pirs û pirsiyaran gihiştime kesekî ku jê re digotin “Kalê” û wê şevê em çûne serdana Şêxî. Dema ku em nêzikî çadirê bûn ronahiyekê tê de şemal dida û dengê merivekî tenê dihat. Me silav da û em rûniştin, bi qasî şeş-heft kesan serî di ber de guh didane Şêxî. Kalê teme dabû min ku gava dikevime hundirê çadirê, divê çavên xwe bişkînim û li erdê binêrim; nexwe ronahiya rûyê Şêxî xenîmî çavan dibe; herwiha gava radibim divê destûrê jê bixwazim,

hinek pereyan şîşî binê postê li bin wî bikim û duayê jê bixwazim. Min belengazî jî wisa kir û nizanim ji bo çi duayek xwest û vegeriyame xanê. Sibetirê min Kalê li çarşiyê dît, xwarineke xweş dayê, sipasiya wî kir ku vê xizmetê dike. Roj-hefte derbas bûn û nizanim piştî çend mehan me bihîst ku Şêxê Çadirê reviyaye û Kalê jî xwe veşartiye. Li gorî gotina gotindaran, xêr-guneh li stuyê salixdaran, ev bêbav ne şêx bûye, sîxurê Ûris bûye. Êdî ev kesê bi navê Kalê çawa dîtibe, çawa li hev kiribin her Xwedê dizane; lê tiştê ku eşkere bûye ev e: Sîxurê bi navê Şêxê Çadirê lampeyeke biçûk a bijîjkan ne ku li eniya xwe, li binê stuyê xwe ve girêdabûye. Gava bûye êvar, egala xwe avêtiye ser serê xwe, lampe di nava rûyên xwe de vêxistiye, Kalêyê berdestiyê wî xelq hildaye hundir û wî şîret li wan kirine. Kalê destê gelek kesan girtiye, aniye ber pêşa şêxî û xwe wekî micêwir nîşan daye. Xwedê bizanibe di vê pêvajoyê de çiqas pere kom kiribin, çiqas kes şêlandibin û nebaşî kiribin. Dema ku gelekî navdar dibe hinek alim tên serdana wî û dinêrin ku qalikê wî vala ye. Ew bi xwe jî dizane ku şûna wan şehitiye û divê birevin. Rojekê Şêxê Çadirê derfetê nabîne ku vegere çadira xwe; bêyî ku post, egal û lampeyê hilde ji Bazîdê direve. Dema ku Kalê pê dihese, ew jî xwe çendekî vedişêre. Van her du dekbazan bi wê lampeya biçûk mala gelek bendeyan hilweşandibû, pereyekî xurt kom kiribû; lê Xwedê bîsa wan derxiste ber tavê û her du jî şermezar kirin. Dibe ku ev lîstikeke romiyan be jî; wê çaxê dilên wan ji kê re nexwesta digotin ev komunîst e, sîxurê Ûris e; lê her çi hebe, Xwedê belaya xwe bide bayîsan ku bi baweriyên xelqê tiraneyên xwe dikin.

Apê Xwedêda piştî kutakirina çîroka xwe hinekî sekinî, êdî çi hatibe hişê wî her Xwedê bizanibe, li meta Gulanê nihêrî; berê axaftina wî li ciwanan bû:

-Me got şêx, îcar her şêx ne sextekar e; di nava wan de hinekên mîna teberikê jî hene. Keçê, ka bûyera Mistefayê Kalikê Şêx Tinoyî ji mêvanan re bibêje ku bila bizanibin çi kurên bavan hene.
Meta Gulanê ya ku piştgirî ji mêrî stand, xwest ku daxwaza ciwanan jî bipîve:

-De em mêvana zêde aciz nekin; dibe ku ew dê razên. Ez ê êvareke din ji wan re vebêjim, bila niha li rehetiya xwe binêrin.

Ciwanan giştan tika kir ku bûyerê ji wan re vebêje; nexwe heta nebihîzin xewa wan jî nayê, ji mereqan xew dê li wan biherime. Meta Gulanê wekî bibêje “bila gotin gotina we be” serê xwe hejand û dest pê kir:

-Gava dijmin di zefta destê te de be û bêdeng rawestiyayî be, wisan bizanibî ku ew piştgiriyê ji derfetên xwe yên xwezayî werdigire û mineta wî ji te nîn e. Gava dijmin dûredest bisekine û bixwaze şerekî bide lidarxistin, wisan bizanibî ku ew ji pêşketina dijberê xwe ditirse û di nava tasewasan de ye. Gava şûna biryargeha dijminî nêzikî zefta destan be, ew dê dafikan dayne ber te. Gava liv û tevgerek di nava darên daristanekê de hebin ev nîşaneya pêşketina dijminî ye. Gava ji nava giyayê gurbiz de gelek qîjevîj bên bihîstin, tu wisan bizanibî ku dijmin dixwaze ku te di nava şik û gumanan bide gevizandin. Gava çivîk û balinde ji cihekî bifirin û ji wir bi dûr kevin ev nîşaneya kemînekê ye. Gava ajalên kovî ji nişkê ve bisilikin û veciniqin, wisan e êrişeke yekcarî pir nêzik e. Gava ji cihekî toz û xubareke mînanî stûneke bilind qulozî esmanan bibe, ev yeka han nîşan dide ku erebeyên cengî tên meşandin. Gava ev toz û xubar nizm bin, lêbelê li qadeke fireh berbelav bibin, ev yeka han jî nîşan dide ku artêşeke piyade nêzik dibe. Gava her yekîneyek ber bi aliyekî ve hatibin şandin, ev jî nîşan dide ku komên yekîneyan ji bo berhevkirina qirş û êzingan hatine şandin. Gava çendek ewrên toz û xubarê rabin û daynin, ew jî nîşan dide ku artêş konên leşkergeha xwe vedigire...

Apê Xwedêda gotina wê birî:

-Gava tu dest bi kakilê bûyerê nekî ez ê vê xwelîdankê di navçava te bidimê. Gava tu serpêhatiyê zû nebêjî û mêvanan ji mereqê biwestînî ez ê ji şûna xwe rabim û rahijim gijika serê te. Êdî Xwedê dizane ez çend kulm û pînan li parxana te xim heta ku mêvan têkevin navberê û te ji destê min rizgar bikin.

-Apê Xwedêda, bi Xwedê ev hevokên ku bi “gava”yê dest pê kirin çi xweş bûn; ji kerema xwe bisekine bila meta min pêşgotina xwe temam bike, -got Hesenî û ciwanên din jî piştgirî danê-.
Meta Gulanê bi peroşiya hunermendeke ku bi çepikan hatiye rawestandin dîsa berdewam kir:

-Gava axaftinên mitewazî û amadekariyên girseyî hebin, ew jî nîşan dide ku dijmin dê artêşê bide meşandin. Wisan e zimanê tund û tevgera êrişkirinekê nîşan dide ku ew dê hêzên xwe bi şun de vekişîne. Gava di destpêkê de erebeyên cengî yên sivik bên anîn û di baskên çep-rast de cihên xwe bigirin, ev jî nîşan dide ku dijmin eniya cengê rêza dike. Gava bêyî peymaneke morkirî pêşniyarên aştiyê bên pêşkêşkirin ev yek nîşaneya kemînekê ye. Gava li holê gelek liv û tevger hebin û gelek leşker tevî refan bibin ew jî nîşan dide ku êdî kêliya xeternak dest pê kiriye. Di şerê Agiriyê de jî kêliya xeternak dest pê kir, diyê zarok diavêt, mêrî jin berdida, jinan xwe di zindaran de diavêt, mêr mîna xesîlan li erdê hatibûn raxistin. Mistefayê Kalikê Şêx Tino jî tevî şervanên Agiriyê bûbû, destek û piştgirî dabû şoreşê, xwestibû kurd bigihêjin mafekî mirovîn. Bi salan şer kiribû, nereviyabû û şehîd ketibû. Xalê Eysayê Pitê pê hesiyabû ku Mistefa di kir de hatiye kuştin; mexsûsen pez ajotibû û heta cendek çûbû. Paşê xirp zivirîbû û hatibû cem bavê, cem Kalikê Şêx Tino. Jê destûr û fetwa xwestibû ku here, sêrî ji cendek qut bike, li cihekî veşêre û paşê here qereqolê û bibêje ku di kir de seriyekî bêcendek dîtiye, heke destûr hebe -ji bo xêra xwe û ji bo ku nebe nexweşî- ew dê wî cendekî bîne û di nava goristanê de veşêre. Fermandarê romiyan destûrê didê, ew jî diçe, cendek tîne, li qereqolê nîşan dide û paşê dibe mirîşoyê. Dema kefenkirinê jî sêrî pê ve didirû û wisa çal dike. Çendek derbas dibe, fermandarê romî dinêre ku gundê Helacê her hefte tê serdana goristanê û gora cendekê bêserî jî ziyaret dike. Li ser vê dikeve şikê û roja serdana tê cem gundiyan û ji wan dipirse ku çima serdana vî bêkesî dikin. Gundî dibêjin ku di baweriya wan de heye, gava cendekek bêserî were çalkirin ew însanekî pak e, rastî xaynetiyê hatiye û duzayên wî meqbûl in; lewre li hinda merzelê wî duayan dikin. Şika fermandêr ranabe û dibêje ku heke gotina wan rast be, divê kê bêhurmetiyê lê bike rastî belayan were; de rabin, li ser gora wî govendê bigirin û bilîzin. Gundî mecbûr dimînin ku govendê bigirin; lê govenda bi lîstik û çirtik nagerînin, ji bo hurmeta Mistefayî “şeranî” dilîzîn.

Li vê derê ciwanan bi hev re gotin:

-Metê, Kalikê Şêx Tino kî ye? Şeranî çi lîstik e.

Meta Gulanê maf da ciwanan ku derbarê van navan de hinek tiştan hîn bibin:

-Lawo, Kalikê Şêx Tino şêxekî heqîqî bûye û li gundê mala bavê min, li Helacê jiyabûye; bi xwe ne xelqê wir bûye û paşê hatiye, ketiye gund, xelqê jî razîbûna xwe dayê. Xelqê carinan dîtiye ku ji ber çavan winda bûye û li cihinên gelekî dûr meriv hatine û gotine ku li wê derê bi Kalikê Şêx Tino re axivîne; loma ew nav lê kirine.  Îcar lîstika “şeranî” jî tehrekî gerandina govendê ye; lê di lîstikê govend çep vedigere, eynî mîna “şêxani”ya we ya îro ye; ne bi reqs û çirtik e. Dibêjin, di dawetekê de şeranî hatiye lîstin, taseke tijî av danîne ser serê bûkê, du saetan lîstiye û tas neleqiyaye, nerijiyaye. Vê yekê jî bibêjim, bi texmîna min dema kesekî qedrbilind ji malekê bimire û piştî mirina wî dawet çêbe vê govendê digirin.

Apê Xwedêda kum di destekî de û tizbiya nod û neh hebê di destê din de rabû ser piyan, çavên xwe ji keçan re çîrovîro kir û got:

-Çîrok çi xweş in, devê we ji hev çûye û hûn qe nabêjin em nivînan daynin û gazî mêvanan bikin.

Keçikan ji şerman şekek da xwe, rabûn ser piyan û gotina bavê xwe ya fermankî bi cih anîn û keçên mêvan birin cem xwe. Herwiha ji bo xortan jî çend deste nivîn anînê hêwana malê û vekişiyane jûra xwe. Apê Xwedêda gote mêvanan ku ew dê li ber hevşiyê pêz razê û qilaliyê bike; bila qusûra wî bibexşînin. Piştî çûyîna bavê, Ferhad û xortan axaftina xwe berdewam kir; xort ji çîrokan têr nebûbûn; lê Ferhad ew serwext dikirin ku tiştên vegotî rastî ne, tenê bi tehrê çîrokî hatine salixdan. Ozgur ji pêşgotina Meta Gulanê pir hez kiribû û digot:

-Xwedê mala bavê te ava bike, nehişt ku diya te wê pêşgotina xwe temam bike.

Ferhadî dîsa ew serwextkirin ku piştî “gava”yê “heke” jî tê; lê ji ber ku ew xerîb in diya wî uslûba xwe guherandiye û kurt biriye. Li gorî gotina wî, zemanê berê dema ku naveroka çîrokê kurt bûye çîrokbêjan bi hinek gotinên xweş axaftin dirêj kiriye. Helbet ev axaftina zêdekirî li gorî naverokê hatiye guhertin; gava çîroka hezkirinê bûye bi şêweyekî, gava serpêhatiya mêrxasekî bûye bi teşeyekî, gava bûyereke efsûnî bûye bi tilism û salixên sihirbazan hatiye xemilandin. Lê dîsan jî

mukir dihat û digot ku diya wî vê pêşgotina taybet a tijî teme û şîretên şervaniyê tenê ji bo meselokên Şerê Agiriyê bi kar tîne.

Mêvan bi awayekî matmayî li ser nivînên xwe rûniştin, piştî axaftineke kurt biryar dan ku zû razên xewa xwe rind hildin. Ji ber ku hewesa wan bi pêşgotinên Meta Gulanê re hatibû û sibehê dê Apê Xwedêda jî qanî bikirana ku tevî wê nebe, bila mîna çemekî gur bi dilê xwe biherike, bikişe.

***

Li gundê Şaneşîna Jorîn danê sibehê gelekî ciyawaz e: berbangê bêdengiyeke kurt dest pê dike, çirçirokên şevê êdî westiyane, segên ku ji êvara Xwedê de ewtîne êdî peywira xwe dewrî mirovan kirine, hêdî hêdî dengên merivan, teqîniya deriyan, teperepa piyan tê bihîstin; paşê beytok ji hêlînan derdikevin û gazî qijikan dikin. Bi derketina qijikan re êdî çêja razanê namîne, ma yek ji yekî re bibêje “weylê qijik bi ser ketî”. Roj ji parxana çepê ya Agiriya Biçûk re hiltê; lê pêşiyê porê xwe yê zer le esmên belav dike, zerekiyên wê ewrên belawela avzêrî dikin, paşê bi nazenînî serê xwe ji pişt kêrtan re derdixe. Gava çenbera tavê gişt derkete ser erdê û bi qasî çend riman hevraz bû, paleyên li zeviyan taştiyê dixwin; ji ber ku berî du saetan hatine, hinekî xebitîne û niha xwarin heq kirine. Di çanda vî gundî de heqkirin gelekî girîng û neheqî tiştekî kirêt e.

Dema ku mêvan rabûne taştiyê, Apê Xwedêda pezê xwe gihandibû şivanê ku diçû ber colek pezê gundiyan, keçeke wî çêlek dotibûn û dewar tevî naxirê kiribû û Meta Gulanê jî taştiyeke xurt amade kiribû. Ferhadî du misînên avê, du sabûn û du pêşgîr derxistine ser balkonê, ciwanan destên xwe şûştin û bi mehdeyekî vekirî vepelîne ser destexanê. Bi ken, henek û qerfan taştiya xwe dixwarin ku Meta Gulanê pêşniyar kir ku Ferhad piştî taştiyê xortan bibe nava gund bigerîne û keç jî digel keçan herin nava mêrgan ji xwe re pincarê biçinin, li bin daran rûnin û suhbet bikin. Pêşniyar bi mizemiza her du nîşaniyan û razîbûna yên mayîn hate qebûlkirin.

Xort nêzikî nîvro çûne nava baxçeyê kalikê Ferhadî; têra xwe qeysî, alûç, sêv, fişne hirmê xwarin; danê nîvro li mala kalikê wî menqelek vêxistin; berêvarê bi ciwanên gund re hola piyan lîstin. Keçan jî beriya nîvro çûne nava mêrgê; siping, tevretûjk, pîqask û tirşo çinîn û bi xwêyê xwarin; danê nîvro li pezdotin û bêrîvaniyê temaşe kirin; xwe gihandin partiya paşîn a goştê biraştî û digel xortan karê xwarinê ji nav derxistin. Îcar piştî xwarinê ew hatine nava daran bi têra xwe mêwe xwarin; çûne mala cînarekî jî, di nava kerdiyê bostên de çend baq hêşînayî ji xwe re berhev kirin û ber bi êvarê li mala Apê Xwedêda kom bûn.

Bêhneke goştî ya gelekî xweş ji pêş malê difûriya; lê tiştekî xuya nedikir. Ciwanan ev yek mereq kirin û pirsîn. Ferhadî got ku diya wî surprîzekê ji wan re amade dike û mereqa wan kire du qatî. Dema ku Apê Xwedêda rabû ser nimêja mexrebê çûn-hatina keçên malê zêde bû û ev dihate wê wateyê ku piştî tizbîkişandinê divê destexan li erdê raxistî be; herwiha dema ku bi “amîn”ê re destê xwe li rûyê xwe xist û li pişt xwe ve zivirî divê bêrawestan li ser xwarinê be.

Meta Gulanê du elok dabûne serjêkirin, digel nok, pamîdor û çend bîberên tehl di dîzê de avêtibûne tendûrê; piştî derxistinê jî bi biharatan terbiye kiribûn. Leganên mêvanan baş tijîkirî digel selete û vexwarineke sar hatin ber; bi kêfeke nedîtî ketine ser, hey nihêrîn ku xwarin qediyaye û zik têr bûne; lê çav tê de maye. Piştî navbereke rawestanê çayeke tîr digel çerezan hatine danînê; ciwanan wê êvarê nehiştin televîzyon vebe û bala wan belav bike. Bi pêkutî ji Meta Gulanê daxwaz kirin ku qala bûyerên şerê kirê Agiriyê bike; lê ew hinekî dilsar bû, dizanibû ku dê li pêşberî mêvanan bigirî û şerm dikir. Di dawiyê de razî bû, Apê Xwedêda pişta xwe pê de kir û li aliyê dîwêr nihêrî ku pirepira hêsirên wê nebîne:

-Gava hate dîtin ku hin yekîneyên leşkerî tên şandin û hinek jî tên vekişandin ev yeka han jî xap û teleyek e. Gava leşker bi alîkariya çekan li piyan rawestiyabin, wisan e ji birçînan derman di çongên wan de nemaye. Gava çivîk bi kêfa xwe li her derê niştin, wisan e ew der ne dagirkirî ye. Bi şev qîjevîj hêrs û sehmê radike. Gava di leşkergehê de alozî û tevlihevî rûdabin, wisan e hêza

serfermandarî qels e. Gava ala û nîşaneyên leşkerî ji cihekî bo cihekî din bên guhastin, wisan e serhildaneke navxweyî li dar ketiye. Gava fermandar engirî û bihêrs bin, ev jî tê wê wateyê ku leşker pir canbêzar bûne. Gava artêşek hespên xwe bi cêh têr bike, pez û dewarê xwe ji bo xwarinê ser jê bike û leşker amanên xwe yên aşpêjiyê li ser kuçikên wargehê nehêlin û neçin, ev rewş nîşan dide ku ew dê venegerin konên xwe. Her wiha tu dê bizanibî ku ev leşker ji bo şerekî hetanî mirinê re amade ne.

Dibêjin Brahîm Axayê Heskê Têlî li nav mêrg û eraziyê xwe bûye; nihêriye ku siwariyek hespê xwe ber bi wî dibezîne û parxanê dide ber qamçiyan. Ew bi xwe berê serleşkerekî Henga Hemîdî bûye, cil û bergên wî yên fermî û çeka wî ya mîrî hebûne. Siwar bi wê kelebezê dibêjê ku dewleta Romê ji serê wî re ferman derxistiye û bila li çareyekê binêre. Birahîm Axa xwe digihîne hespê li mêrgê tewilandî, dibêje “ya rebî tu min nedî destê van segbavan heta ku bigihêjim mawzer û fîşengan” û di bînekê de tê malê. Di riya xwe de difikire gelo jin û zarokan bikuje û bi kurên mezin derkeve çiyayê Agiriyê yan wan jî bi xwe re bibe? Di dawiyê de destê wî naçe jin û zarokan; dibêje heke heval û alîgirên wî jin û zarokên xwe nekujin û bînin çiyê wê hingê kuştina wan badilhewa ye.

Heke dijmin bibîne ku qezenckirina destkeftinekê pêkan e, lêbelê hewl nade ku vê destkeftinê bîme bike, wisan e leşker tengezar û westiyayî ne. Heke li pey hev diyarî bên belavkirin, ev yek nîşan dide ku dijminî hema hema fîtik li binê têra xwe xistiye. Sezakirinên zêde rewşa bêhêvîtiyê ya dijwar nîşan didin.

Romê wê çaxê biryar û ferman derxistibûn ku piştî şoreşa Şêx Seîd Efendiyî çiqas serekeşîr, beg, axa û pêşeng hebin werine binavatkirin, bê ser û şûn kirin, bê berate ji holê bên heyibandin. Brahîm bi malbatî derdikeve çiyayî û hawarê di nava gel de belav dike. Li gorî ku min ji şahidên dewrê bihîst paroleya wan “telebna-wecebna” bûye. Îcar min pirsîbû bê ka ev tê çi wateyê û bersiv “heke em bixwazin-em ê bi dest ve bînin” an jî “me xwest û Xwedê jî da”.

Tu kengê bibînî ku refên leşkeran di navbera xwe de kurtepistan dikin an jî awazeke bêçaretiyê dinehwirînin ev dîmena han nîşan dide ku di navbera payedar û peywirdaran de nerazîbûnek heye. Heke fermandarek di destpêkê de gef û guran li leşkerên xwe bixwe, paşê jî dema ku jimar û hêza dijminî xurt be miameleyeke baş li wan bike, ew jî nîşan dide ku zanyariyên saloxgeriyê yên vî fermandarî qe tunene.

Dibêjin li der û dora Brahîm Axayî bi qasî 500-600 mêrî hebûye, li ser her kêrt û girikî qelaçeyek çêkirine, ji wan giştan gule avêtine; lê bi dorvegerî gule avêtine, ango merivekî ji vê qelaçeyê çend gule avêtine, paşê derbasî yeke dinê bûye û ji wir jî çend gule avêtine; bi vî awayî li dijmin dane nîşandan ku hejmara wan pir e, ji her aliyî vî guleyan diavêjin. Bi salan li ber xwe dane, heta ku ehmeqekî kurdan çûye cem fermandarê tirkan, sîxurî kiriye û pêşniyar kiriye ku ji piştê ji kurdan bistînin. Bi vî awayî pişta kurdan şkandine û hê jî necebiriye.

Dibêjin beriya belavbûna Komara Agiriyê fermandarê tirkan ji Brahîm Axa xwestiye ku aştiyekê bikin. Brahîm Axa ji tercumanê xwe re gotiye ku gotinên wan rast ji min re û yê min rast ji wan re tercume neke ku em li hev nekin.

Heke qasidên dijminî diyariyan bi devên xwe bigirin û werin, ew jî nîşan dide ku dilê dijminî bi agirbestekê heye. Gava hêzên dijminî bihêrs bimeşin û derkevin pêşberî hêzên reqîban, her wiha demeke dirêj ne tevî şerekî bibin ne jî xwe bidin aliyekî û vekişin, di rewşeke wiha de divê mirov pir baldar be û baş li xwe miqate be. Gava jimara hêzên merivî ji jimara hêzên dijminî kêmtir be, ev jî tê wê wateyê ku divê meriv êrişên rasterast li dar nexe. Wê hingê tiştê herî kêrhatî yî ku bê kirin ev e: divê hemû hêzên berdest bêne têkuz û rêza kirin, ji nêzik ve dijmin bê şopandin, meriv bi xurtkirina hêzên xwe yên neteweyî ve mijûl bibe.

Brahîm Axayê rehmetî di şerî de şehîd dikeve, nareve û heta remeqa dawîn li ber xwe dide.

Ez qurbana we bim, hûn li giriyê min û salixdana min nenêrin. Bila jana vê bûyerê li dilê we nexe û kezeba we neşewitîne. Bav û kalên camêr bûn, dema xiyanetê xiyanet nekirin; ji nava wan xayînan xayînê herî xayîntir li wan xayîntî kir. Serbilind bin.

Meta Gulanê êdî xwe negirt, destmal li ber dêv ji hêwanê derkete ser balkonê ku piçekê sur lê xe û bi ser hemdê xwe de were.

Apê Xwedêda xwest ku hêwanan kerr û lal ji vê bêdengiyê derxe û got:

-Gelî ciwanan, va ye Çiyayê Agiriyê dîsa li şûna xwe ye û serê wî bi mij û dûman e. Divê em rexneyekê li xwe bikin ku divê me tedbîra xwe hê di berê de wergirta. Bi rastî divê wexta ku merivên biyanî ji erdê me re derbas dibûn me destûr neda. Me beriya ku bajar bikevin destên dijmin vala kiribûn; em havînan li çiya û zozanan bûn û zivistanan dihatin ser warên gund û bajaran. Ne dewleta me hebû, ne artêşa me hebû, he casûsê me hebû, ne top-tifingên me hebûn. Em mîna bêaqilan di bin wesayet û wekaleta bêbaban de dipirçiqîn. Teyr û tilûrên alemê wasî û wekîlên me de zîrç dikir û wan jî zîrça xwe bi ser me de berdida. Kesê ku tevger, pêşbînî û çareseriyên xwe nede ber hev; lêbelê dijberên xwe sivik û hêsan bibîne teqez ew dê ji aliyê wan ve dîl bê girtin.

Apê Xwedêda nexwest ku axaftinê dirêj bike; lê dîsa jî got:

-Gelî ciwanan, me ji bo wê yekê berê we da bajar û bajarvaniyê. Herin dinyayê bibînin û bi ser miletê xwe de vegerin. Çiyayên me bi cihekî de naçin, li şûna xwe rawestiyane, li qûntara her yekî bi sedan, belku bi hezaran gorên bêkêlik hene; bawer bikin dijmin dê tu carî li wan çiyayan bi cih nebe; wê her tim li dora çiyayan bi cih bibe. Lewre divê hûn bajaran şên bikin û piyên dijminan jê raqetînin. Bi hevgirtineke wisa ku ba, av, agir, xwelî û mirov we ji hev neqetînin. Birayên xwe yên li çil-çiyayan, li biyanistan-zindanan vegerînin malên wan. Bila her kes vegere ser rewşa xwe û dinya-alem çawan em jî wisan. Ma kî hez nake serê sibehê rabe, eşortmanê xwe li xwe bike, here firneyekê û çend kade-kulîçeyan ji bo taştiyê bistîne; paşê were ber firoşgeha rojnameyan, ji xwe re çend heb rojnameyên kurdî bistîne, vegere malê û digel malbata xwe taştiyekê bixwe, çavekî li rojnameyan bigerîne, here ser karê xwe hemû miameleyên xwe bi kurdî pêk bîne? Ma kîjan bêwijdan dikare vî mafê mirovîn ji me kurdan re zêde bibîne? Bi Xwedê kî vî mafî ji me kurdan re zêde bibîne, divê mirvo duaya Cenabê Nûh eleyhiselamî lê bike; wê hingê agir bi dinyayê bikeve jî divê kurd dest nevêjinê ku bila gişt bişewitin.

Ciwanan bi neçarî got ku rast dibêje û ew dê gotinên wî bi bîr bînin; lê dîsa jî dilê wî rehet nebû û rûyekî kelogirî axivî:

-Ez ji duh ve peyv û tevgerên we dinirxînim; min bi qasî têra xwe temen girtiye û ji Xwedê re şukir ku çavê min li malê dinyayê nîn e; lê divê vê yekê jî bibêjim ku em faîza deynên bav-kalên xwe didin. Ji me re dam-dezgehekî bi reng û rûçikê me, bi ziman û çanda me nehiştin. Ez bi qasî zanîna xwe ya gundewarî û reşekurmancî dibêjim: Şivanê serşivan ew kes e ku xencer di ber de ye, tifing li milan e, dûajoyê wî keriyî dipê, hespê kihêl bi destkêş li pey e û çend segên wî yên şivaniyê jî li wî aliyî û li vî aliyî çûvan didine xwe; li çiyayan guleyan bera esmanan dide ku rawir birevin, li berê avan guveguva bilûra wî ye. Ha serşivan ha serfermandar, her du jî yek in û peywira wan yek e; tenê amûrên wan cihê ne.

Ciwanan nihêrî ku Apê Xwedêda gelekî tijî bûye, şîretan dibarîne û nifiran li feleka xayîn dike; lewre bi ber dilê wî ve hatin ku vê carê lap teqiya û enirî:

-Ji duh ve ewên ku li ser ekranan barebar e û gazî hevgirtinê dikin heta niha nehiştine ku du leşkerên wan herine ba rikber û reqîbê wan. Ji sibeha Xwedê heta êvarê tûyî hev dikin û hawariyên xwe belav dikin. Belê ez gundî me û nexwendî me; lê ez jî bi qasî xwe merî me. -Beriya ku serweriya te bipejirînin û girêdana xwe ya bi te re diyar bikin- heke tu sezayê bidî leşkeran ew dê guh nedin fermanên te. Heke leşker fermanên te guhdarî nekin jî wê hingê ew dê bi kêrî tu tiştê balkêş neyên. Her wiha -piştî ku serweriya te pejirandin û girêdana xwe ya bi te re diyar kirin jî- heke tu nikaribî sezayekê bidî wan, wê hingê ev rewşa bêkêriyê dê berdewam bike. Lewre divê di pêngava pêşîn de bi leşkeran re miameleyeke mirovane bê nîşandan; lêbelê divê bi disiplîneke xurt di bin kontrolê de bên girtin. Ji bo serkeftinê ev rêbaz çêtir û hêjatir e. Gava leşker li ser daxwarina fermanan bên perwerdekirin û ev daxwarin bibe exlaqê wan, wê hingê ev artêş dê bibe artêşeke têkuzkirî û rêzakirî. Nexwe perwerdehiya vê artêşê dê sist û belawelayî bimîne. Gava baweriya serfermandarî bi leşkerên wî hebe; lêbelê her tim ji wan bixwaze ku fermanên wî nevêjin pişt guhên xwe, wê hingê qezenc dualî ye, duqatî ye.

Her du mêvanên kurîn rabûna ser piyan, xwe avêtine hembêza wî û bi niyaza aştkirinê çûne destan ku bes bike. Apê Xwedêda jî ew neşkandin, derkete derve hilma xwe berda û ji xwe re got:

-Ya Rebî tu me ji vê hewaya paqij mehrûm nekî! Ya Rebî ew ên ku vê xwezaya me jehrdadayî dikin, Tu wan di nava jehra wan de bikujî! Çi bibêjim Xaliq, evdekî Te yî gunehkar im û ji ber gunehên xwe ve towbekar im, ji çerxa feleka xwe lomekar im!

**Ax û dîsa ax!**

-Dibêjin rojekê merivek rastî zilm û sitema yekî tê; sitemkar li zikê wî dixe mêrik dibêje “ax, pişta min”, li piştê dixe dibêje “ax, pişta min” û li navçavê dixe dîsa dibêje “ax, pişta min”. Sitemkar mehtel dimîne, xwe nagire û dipirse “kuro ez li kê dera didim tu dibêjî ax pişta min, ev çi rewş e?”. Mêrikê sitemdîtî dibêjê “heke pişta min hebûya ka te dikaribû li min bida?”

-Bi Xwedê ev “ax”a kurdan gelekî balkêş e; kêfxweş be jî dilsotî be jî axeax dike; ji xweliyê re ax, ji welêt re ax, ji zilmê re ax û ji gorê re ax dibêje. Min jî fêm nekir ev çi rewş e?

Du zimanzanên kurd li ser peyva “ax”ê nîqaş dikir bê ka kîjan wate resen e û kîjan mecaz e; lê di dawiyê de her duyan jî biryar da ku “ax”eke bi wateya xweliyê wekî şêweyê resen bibijêrin û “ax”ekê jî wekî peyvedengekê. Bi çil kul û derdî cureyên xweliyê, peyv û biwêjên têkildar rêz kirin ku bi qasî rûpelekê digirt: axa narîn, axa êrgûn, axa sax, axa sar, axa nizanim çi û çi... bin-ax kirin, ax kirin, axlêve, ... Paşê derbasî wateya wê ya mecazî bûn û ji wateya “zemîn, erazî û welat” dest pê kirin ku êdî damara wan a welatperweriyê hilpingirî; nema xwe girtin, geh bûne fermandar geh bûne serok geh bûne bazirgan û geh bûne cotkar... Sedema vê yekê jî ew bû ku her duyan jî demekê şivanî û cotkarî, paşê jî şervanî û siyasetmedarî kiribûn.

Yekî bi awayekî sivîl digot:

-Erazî; eraziyê rast, eraziyê çal û kort, eraziyê çiyayî, eraziyê bi kevir...

Yê din derfet didît ku çanda xwe ya leşkerî nîşan bide:

-Eraziyê berdest, yekalî, hevalpişt, berteng, bilind û dûredest... Eraziyê ku ez dikarim ber bi dijminî ve û dijmin jî ber bi min ve were, jê re dibêjin eraziyê berdest. Di eraziyeke wiha de, divê mirov berî dijminî leşkerên xwe li kêrt û giran bi cih bike, xwe bide hêla rojê û riyên debarê destnîşan bike. Bi vî awayî gavekê li pêş dikeve û berjewendiya dijminî dike bn destê xwe.

Hevalê yekem divê bersiveke wisa bida ku ji kesayeta wî re nebûya kompleks, di bin zanyariyên wî de nepirçiqiya:

-Eraziyê ku piştî êrîşî mirov nikare bi paş de bi dest bixîne, jê re dibêjin eraziyê yekalî. Di eraziyeke wiha de şerê li dijî dijminekî neamadebûyî serfirazî ye. Na, heke dijmin amadebaş be û mirov di vî şerî de bişkê, encam ziyan e û tu feydeyeke vekişînê nîn e.

Hevalê duyem nehişt ku yê yekem zêde forsa xwe biavêje bi ser ve zêde kir:

-Eraziyê ku ne ez dixwazim ne jî dijmin dixwaze dest jê berde, jê re dibêjin eraziyê hevalpişt. Di eraziyeke wiha de gava dijmin hewl bide ku min kaşî êrişê bike jî ez ji şûna xwe naleqim; lê gava ew ber bi min ve têkeve tevgerê ez ê jî hêdî hêdî vekişim û lê bidim.

Hevalê yekem bi hevahengiyeke şervaniyê gotina wî temam kir:

-Her çî şûnwarên berteng in, divê meriv pêşiya wan deran wergire, tê de bidewse, bitele û li benda dijminî bisekine. Heke dijminî şûnwarek girtibe û tê de bi cih bûbe, ez nadime pey wî; lê heke dewsa xwe çênekiribe ez ê ji ser stûyê wî peya nebim û nehêlim bipirpite.

Hevalê duyem êdî xwe ranegirt û bertek nîşan da:

-Hevalo tu bi min re qayişkêşaniyê dikî yan kap dilîzî? Tu dibêjî em di pêşbaziyekê de ne.

Hevalê yekem jî poşman bû ku ji riya zanyariyê derketiye ku bi vî awayî kar bi pêş ve naçe:

-Bibexşîne birako, rojên kevn-teze li hev ketin, ezberên min ên berê hatin bîra min; lê tu çima ketî van mijaran?

Dilnizmiya hevalî ew jî mecbûr kir ku rastiya tevgera xwe raxe ber çavan; lewre rexneya xwe kir:

-Çi ji te veşêrim, çi ji Xwedê veşêrim; hema min nexwest şivanî û cotkariya xwe bînim bîra xwe ewqas.

Li ser vê yekê her du hevalan bi dilnizmî û hestiyarî biryar da ku pêşiyê van ezberên xwe vala bikin; paşê dest bi karê zimanzaniyê bikin; nexwe xebateke zanistî bi rikeberiyeke ezberan durist nabe.

Hevalê yekem bi pirsekê serê planê vekir:

-Ka bibêje, ji bo kêrt û bilindahiyan stratejiya we çi bû?

Hevalê duyem wekî makîneyeke otomatîk dest bi xwendina ezberên xwe kir:

-Ez ê pêşiyê gir, kêrt û bilindahiyan wergirim, li şûnwarê herî berz, li hêla rojê bi cih bibim û

dijminî bipêm. Heke dijmin beriya min ew der wergirtibin, divê bi awayekî çalak wî daxînim jêrê; herwiha divê nedime dû wî û giran giran hilnekişim jorê.

-Lê di vir de mijara daxistina dijminî sergirtî ye; tenê dibêjî “bi awayekî çalak wî daxînim jêrê” û şîroveyeke bikêrhatî tuneye.

-Biracan li vê derê stratejî li ser qabiliyeta te dimîne; di perwerdehiyê de ji bo şert û mercê tu nikarî stratejiyekê diyar bike.

-Maqûl e. De bibêje, ji bo eraziyê dûredest çi dibêjî?

-Bi rastî ev cureyê eraziyê her çiqas dengeya hêzan diyar bike jî şerxwaziyê dijwar dike; lewre bêfayde ye û divê meriv jê dûr bisekine. Babeta şeş cureyên eraziyê yên ku me -wekî berdest, yekalî, hevalpişt, berteng, bilind û dûredest- bi nav kirin divê hertim di hesabê fermandêr de hebin; di vî hesabî de berpirsiyarê herî bilind fermandarê giştî ye ku divê wan îhmal neke.

Hevalê duyem beriya ku hevoka xwe kuta bike, işareta “raweste”yê da hevalê yekem ku vê carê ew pirsekê jê bike:

-Me qala şeş cureyên eraziyan kir, de îcar tu bersivê bide: şeş karesatên şerî kîjan in?

Hevalê yekem hilmeke xurt kişand û dîsa berda; wekî ku bizanibe dê bersiveke dirêj bide wiha gotin kurteve kir:

-Heke şaş nebim, pêwendiya şeş karesatên şerî bi rewşa xwezayê nîn e; sedema sereke bêqabilîyetiya fermandêr e ku dibe sedemkarê rev, bêtaetî, bêhêzî, têkçûn, tevlîhevî û şkestinê. Gava hêz dengî hev bin û fermandar şervanekî derxe pêşberî deh kesan, encam rev e. Dema fermanber xurt û fermandar lawaz bin, encam bêtaetî ye. Berevajî vê yekê heke fermandar xurt û fermanber lawaz bin, îcar encama vê jî bêhêzî ye. Ji aliyekî din ve fermandarên bêhnteng û bêtaet di civînên digel dijminî de bi hêrs û serbixwe tevdigerin. Gava serfermandar kapasîteya fermandarên xwe nizanibe, encam têkçûn e. Dema serfermandar lawaz û sist be, tesîra propagandayê namîne; leşker û fermandar bêpeywir dimînin û disîplîn ziyanê dibîne ku encama wê jî tevlîhevî ye. Dema serfermandar nikaribe kapasîteya dijminî bihesibîne, ji nava artêşa xwe hêzên pêşeng veneqetandibin, kêmjimarê li hemberî pirjimarê, lawazan li dijî xurtan bi kar bîne, encama vê tevgerê jî şkestin e. Ev şeş karesat riya şkestinê vedikin. Serfermandar bi xwe berpirsiyarê herî berz e û divê tu carî vê îhmalkariyê neke, riya şkestinê li ber fermanberên xwe veneke. Hevalo, ji kerema xwe re, tu jî eraziyê hevalpişt şîrove bike ku em navberekê bidine nîqaşa xwe.

Hevalê yekem jî pejirand ku vê mijarê êdî bigihînin dawiyê; nexwe ew dê karê xwe yê zanyariyê nekin:

-Erazî hevalpiştê şervên e, leşkêr e. Taybetiya serfermandarê jîr ew e ku xwe dispêre riyên serfiraziyê, çareseriyên bikêrhatî, xebatên encamdêr û giyanê erênî. Lewre li qada xwe baş lêkolînê dike; pêşiyê dijminê xwe baş nas dike, mesafeyên dûr û nêzîk dipîve û ji erdnîgariyê baş sûd werdigire. Bala te kişandibe, min di giştan de “baş” got; ji ber ku serfermandar riya başiyê dijbêre; dibexwediyê av, erd û esmên. Kî bibe xwediyê van taybetiyên kesane û erdnîgariyê dê bi ser bikeve.

***

Hesen Gumus û Huseyin Altin du hevbajarî bûn ku bi salan li dijî hev siyaset meşandibûn; di nava tevgerên leşkerî yên kurdan de cih girtibûn, ji ber dozên xwe ketibûn zindanan û di dawiyê de li du welatên Ewropayê bi cih bûbûn. Bi qasî ciyawaziyan hevpariyên wan jî hebûn ku piranî ji bo van ciyawaziyên xwe dihatin ba hev; bi rastî şert û mercan ew dianîne ba hev. Hesen mirovekî aştîperwer bû ku di nava kurdan de wekî “kevoka aştiyê” dihate naskirin; lê di bin cil û bergên xwe de kesayeteke leşkerî ya bipergal û rêxistî jî vedişart. Heçî ku Hisên e ew jî “mêrxasê meydanan” bû ku her gotineke wî mîna şûrekî birra tûj bû; lê ji nêzik ve wekî kesayeteke aram û hêmîn xuya dikir.

Hevpariya Hesen û Hisên kurdbûn, gundîtî û hevbajarîtî ye. Dema ku Hesen hatibû Ewropayê, rojên xwe yên pêşîn li komeleyeke kurdan mabû, nihêrîbû ku zarokên kurdên ewropayî bi kurdî naaxivin, sedema vê pirsîbû û bersiva “ji ber tunebûna dezgehên kurdî” hildabû. Lêbelê

Hesen bi rewşê qayîl û razî nebûbû kurseke zimên ji zarokan re vekiribû; paşê bûbû mamosteyê zimanê kurdî yê komeleyê û êdî bi kesayeta mamosteyekî dihate naskirin. Hisên jî di destpêkê de bi dîplomaya xwe ya zanîngehê ji xwe re karek peyda kiribû, wekî wergêrê zimanê tirkî xebitîbû; lê rojekê dozeke kurdên bakurî ew bi neçarî kiribû nava wergera ji kurdî, vî karî gelekî kişandibû û êdî wekî wergêrê zimanê kurdî xebata xwe domandibû; lewre neçar mabû ku biçe komeleyên kurdî, zanyariyên xwe bi pêş ve bibe û heke mumkin be bawernameyeke kurdî jî wergire.

Piştî xebatên bi salan her du camêr jî kednişîn bûn, ji siyaseta rojane bi dûr ketibûn û bi dilsozî li ser ziman, wêje, devok û zaravayên kurdî lêkolîn amade dikirin; hilberînên xwe di heman kovarê de diweşandin. Ji ber heman kovarê carinan li avahiya kovarê rastî hev dihatin, silav didane hev û li ser piyan rewşa hev dipirsîn.

Sala 2008an kovarê her du camêr peywirdar kirin ku li ser devoka wan a herêmî xebateke hevpar amade bikin. Bi vê boneyê serdan, rûniştin, nîqaş û hevdîtinên wan zêde bûn; derfetên hevnasîn û pêwendiyên kesane jî çêbûn. Piştî meh û salan hînî xwû-xeysetên hev bûbûn; êdî ji bo bîrdoziyên xwe hev nediêşandin. Bi van hevdîtin û xebatan sê hevparî di navbera wan de peyda bûbûn: Mebesta qenc, tevgera durist û axaftina rast. Ev hevdîtin û komxebata wan a pêncemîn bû ku digel hev dihatine bajarê Wanê; bi qasî panzdeh rojan li ser devokên herêmê dixebitîn, dost-nasên xwe didîtin û êvaran bi eqrebayên xwe re rûdiniştin. Hesen ji Swêdê û Hisên ji Almanyayê heman rojê dihatine Stenbolê; sibetirê bi balafirekê rasterast berê xwe didane welatê xwe yê hevpar. Li otêleke baş diman, ji bilî cihên mayînê jûra konferansan an jî jûreke fireh a hewadar kirê dikirin. Bi qasî pênc rojan bêyî ku kesekî bi hatina xwe bihesînin dixebitîn; xebatên xwe yên hevpar bi ser hev de dianîn û paşê bi der û dorê re pêwendî girêdidan. Ev roja wan diduyan bû ku li ser peyv û biwêjên têkildarî “ax”ê dixebitîn; piştî sê rojan dê biketana nava gel û ji çanda gelêrî nimûne berhev bikirana.

Hesen û Hisên ji jûra xebatên hevpar derketine terasa otêlê ya li ber Gola Wanê; lê ji bilî reşahiyeke bêdawî tiştek xuya nedibû. Li peravan di bin ronahiya xurt de hinek kelekên masîvaniyê dihatin dîtin û ji tevgera mirovan zêdetir çûn-hatina erebeyan bala mirovî dikişand. Her du hevalan qehweyên xwe hildan; bêdeng li bajarê pêşberê temaşe kirin û bi firên bêdeng fîncan birin lêvên xwe yên ziwa. Ji ber ku Hesen bi temenê xwe jê mezintir bû, Hisên rêz û giramî lê nîşan dida; beriya wî dest bi axaftinê nedikir. Hesen jî ev rêzdariya Hisênî dizanibû û hertim derê axaftinê li ser Hisên vedikir; lewre piştî bêdengiyeke dirêj xwest ku Hisên dîsa bide axaftin û ji bêdengiya xwe bêzar neke:

-De bibêje birako, te piştî ewqas salan te Wan çawa dît û niha çi hestên te hene?

-Welleh keko ez li ber tu tiştî nakevim; ji kirinên xwe yên berê ne poşman im. Ji wê dewranê re ew tevger pêwist bû, yan jî me wisa pêwist didît, derbas bû-çû; lê kulek heye ku dilê min diêşîne û dixwazim berî mirina xwe bi te re pareve bikim.

-Fermo, dibe ku ramanên me hevpar bin û em alîkariya hev bikin.

-Me ewqas salan dijayetiya hev kir û li riya lihevkirinê negeriyan; niha em mîna hespên kadane bûne, bi kêrî tiştekî nayên, di bazarên xelqê de hatine firotan ku baxçeyekî ajalên wan bixemlînin û zarokên wan bi me ajalan nas bikin.

-Ewqasî jî bedbîn nebe mal avayo! Em bi salan li gorî ramanên xwe bi rastî-duristî xebitîn, me kedeke mirovane da û em niha malnişîn bûne. Li hemû welatan malnişîn ji xwe re karên dilsoz dikin û rojên xwe derbas dikin; ma me jî tiştekî wisa heq nekiriye?

-Me zêdetir jî heq kiriye; lê wekî te gotî “welat”ekî wan heye û ev welat li ser navê wan e, ew li welatê xwe jî bibin li derveyî welatê xwe jî bibin bi wî welatî tên naskirin. Em niha li welatê xelqê ne û ji bo welatê xwe yê li ser navê xelqê hatine vir; piştî çend rojan em ê dîsa vegerin welatên xelqê û welatê bav-kalên xwe ji xelqê re bihêlin ku bi rê e bibin.

Hesenî êdî ne pirs jê kir ne jî hewl da ku êşa wî derman bike; ji ber ku êşa wan a hevpar kengê jan bida her du bi hev re diêşiyan, birînên wan bi hev re diaxivîn. Qehweyên xwe vexwarin;

lê tehma xebatê jî reviyabû û dîsa Hesenî bi pêşniyarekê xwest ku hewaya reş-tarî ya “bêwelatî”yê belav bike; rojê derxîne û her du jî hinekî germ bibin:

-Gelo te peyv “kax”ê bihîstiye? Nizanim gelo navê van amanên ku ji heriyeke taybet tê çêkirin bi xweliyê re heye?

-Helbet heye, madem ku peyva “ax” tê de heye û ji xweliyê tê çêkirin divê têkiliyek hebe. Li gundê me ji wan amanan re kaxetît dihate gotin; ango tîtik û amanên ji kaxan.

-Te got kaxetît, îcar ew kevir û tehtên ku ji heriyê tên çêkirin û serê banan sêgoşekî pê tên avakirin jî kaxetîtik in; lêbelê em ewqasî li ser têkiliya kûr a bêjeyan bisekinin karê me naqede. Ka em ê çi têkiliyê di navbera van peyvan de bibînin: “bax, zax, sax, çax, dax, kambax, qerax, yax, tax, max, çomax” û sedan peyvên ku bi axê diqedin...

-Rast e, dixwazî em vegerine xebata xwe; lê vê carê destûrê nede min ku têkevim nava bîranîn û ezberên me yên kevn. Bila xebata me bibe serfermandarê me û nehêle mijar tarovaro bibin, ji hev biqetin.

-De baş e, em rabine ser kar.

Wekî ku Hisênî jî got, di xebatên hevpar de komxebat serwer e û her beşdarek mîrê gotina xwe ye. Gava peyvek an jî nêrînek ji devê mîrê gotinê derket, êdî ew dibe malê komxebatê. Ji xwe komxebat jî mîna artêşekê bi rê ve diçe. Lewre heke serkeftina artêşê nêzik be, êdî serwer ji bo rawestandina şêr fermanê bide jî şer dê berdewam bike. Heke şer ber bi serkeftinê neçe û serwer fermana berdewamiya şêr bide jî, divê şer bê rawestandin. Bi gotineke din, di komxebatan de beşdar, alîkar û rêveber li dû navdariyê nakevin; divê her axaftineke wan pişta xwe bispêre çespandineke zanistî. Herwiha ew bêtirs in, jiçavketinê natirsin. Heke bitirsin jî, divê ji çavnebariyê bitirsin ku mala zanyaran xera dike û avahiyê saziya wan bi ser wan de tep dike. Ji aliyekî din ve parêzvanên zimanekî û gelekî heman tiştî dikin. Kesê ku xelqê xwe diparêze, welatê xwe jî rizgar dike û kesê ku zimanê xwe diparêze gelê xwe jî diparêze. Serwerê bikêrhatî welatî rizgar dike û zanyarê baş zimên ûû amûrên zimên rizgar dike. Ji bo zanyarekî peyv leşker in, divê wekî zarokên xwe li wan miqate be; ji ber ku peyv hertim bi merivan re digerin, ew dê li newalên herî kûr jî li dû te bin; wekî leşkerên dilrast li çep-rasta te, li pêş-paşa te, li ser-binê te nobedar bin. Heke mirov wekî leşkerên xwe yên dilsoz an jî wekî lawên xwe yên hezkirî li zimanê xwe miqate be, ew dê heta mirinê jî li dû wî bin, di bin fermana wî de bimeşin. Lêbelê divê qencîxwazî bandora mirovî neşkîne û qencîxwaziya zimanî rûmeta wêjeyê binpê neke. Bi gotineke din, divê hezkirina mirovî ya ji bo zimên hêza wêjeyê nekuje û nebe sedemkarê aloziyê. Ziman ne tenê zarokê delalok e; zagon jî ferman jî şîret jî bi zimên tên ristin; wekî ku dîwar bi kerpîçên kêmber tê lêkirin û parastineke xurt saz dike divê hûnaka zimên jî bikaribe xwe biparêze.

Hesen û Hisên ketine jûra xebatê û dergehê jiyana derve bi ser xwe de girtin; bi hêza du artêşên hevpeyman êriş bir ser bêpergaliya peyvan, peyv rêz kir, ji wan re nasnameyek derxist, hebûna wan li ser kaxezê tesbît kir, ew ji meşqeke leşkerî re derbas kir. Her duyan jî dizanibû ku tenê leşkerên ji şerekî re amade û tenê pisporên rêbaza şerî dikarin nîvê serkeftinê bi dest dixînin, nîvê dijminî têk dibin. Heke peyvên kurdî bikaribin zora peyvên dijminî bibin, lê rewşa wan nehatibe diyarkirin jî nîvê serfiraziyê ye. Heke zimanê kurdî bikaribe zora zimanên biyanî bibe, ji bo xweparastin û êrişê amade be; lê nizanibe çawa dest pê bike jî nîvê serfiraziyê ye.

Hesen û Hisên di van pênc salên xwe yên dawîn de her sal bi qasî panzdeh rojan ligel hev diman; kêmasiyên xwe telafî dikrin û zêdehiyên xwe bi hev re pareve dikirin. Salên xwe yên nezaniyê-nexwendinê kiribûn sermaye-xizmeta zimanê kurdî; zimandirêjiyên xwe yên ciwaniyê kiribûn ava aşê xebata xwe ya kalaniyê û tiştê herî girîng bi tecrubeyên xwe yên rêxistî-pergalkirî rêbazên nû li ser komkirin, tomarkirin û senifandina peyvan disepandin.

**Şeşik, Nehberek û Sedreng**

Her çiqas navê vê lîstikê şeşik jî bi pênc kevirên gilûmûtkî yên bi qasî findiqan tê lîstin. Ev kevirên gilover çiqasî bi girnûs bin ewqasî bikêrhatî ne. Ji ber ku lîstika şeşikan bi xarikan dijwar û bêtehm e; zû ji destan dişimitin ku lîstikvan zû dişewite û dor derbasî reqîbê wî dibe.

Ev şeş kevir bi weşeke asayî li erdê tên belavkirin, ji nav yek tê hildan; paşê ev yeka jibartî ber bi hewa tê avêtin û kevirekî li erdê tê hildan ku her du kevir jî di destekî de kom dibin. Piştre ew kevirên mayî tên berhevkirin û ji vê asta yekem a berhevkirina yeko yeko re “raweşan” tê gotin. Di asta duyem de kevir didu didu tên hildan ku jê re “du-cêwî” tê gotin. Pişt re “sê-kuçik” tê ku sê heb bi carekê û yek jî bi carekê tê hildan. Paşê “çarmêrkî” tê; hebek ber bi hewa tê avêtin, yên mayîn bi carekê tên hildan. Di asta “sêpî”yê de sê tilî wekî sêpiyekê tên vekirin; kevir li bin sêpiyê tên komkirin û hildan. Li pey re “qula gur” heye ku tiliya mezin û ya şehadetê wekî sifirekê çik tên girtin, kevirên li erdê di qulikê de tên komkirin û yekcar tên hildan. Di asta “kon” de tilî wekî çadireke gilover tên vekirin, li navbera tiliyên vekirî şeşik tên danîn, li kefa dêst tên berhevkirin û yekcar tên hildan. Di asta dawîn de “nanê teptepe” heye ku kevirek ber bi hewa tê rakirin û çarê di dêst de tên danîn û dîsa tên hildan. Kî pêşiyê bigihêje vê astê mafê sizadana reqîbê xwe bi dest dîxîne ku kevirek ber bi hewa tê rakirin û pişta destê lîstikvanê têkçûyî tên quncirûkkirin. Taybetiya vê lîstikê destsivikî, teql û wezna kevir-rakirinê û çelengiya lîstikvên e.

Xurşîd dema ku zarok bû bi keçikan re şeşik nedilîst; her çiqas beşa hera xweşik a vê lîstikê sizadan bû û gava serkeftin bi dest bixista pişta destê keçikan quncirûk dikir, qe nebe destê wî bi mafdariya serkeftinê li destên wan diket jî, wî ev lîstik tu caran bi keçikan re nedilîst, serhevde, nav-nûçik, sox-sunix li pey navê xwe nedixistin; lê carinan hezarê carê carekî bi kurikan re dilîst. Ji ber ku di nava civakê de lîstika şeşikan di navbera zarokên kurîn û keçikan de bêrûmetî bû. Gava kurikekî tinazeyên xwe bi kurikekî dîtir bikira jê re digot “tu here, bi keçikan re şeşik bilîze, ev karê mêran e û mêranî bi te nabe”. Herwiha gava keçekê nav û nûçik bida serê keçikeke hevalê xwe jê re digot “bi mêran re şeşik lîstiyê”. Ji aliyekî din ve gava kur û keçikan serhevde bidana serên hev, nav û nûçik li pey hev bixistana digotin “nemêro, bi keçikan re şeşik lîstiyo” an jî “şîrheramê bi kurikan re şeşik lîstiyê”.

Dema ku Xurşîd dest bi dibistanê kiribû dest bi “nehberek”ê kiribû û havînan dema ku çûbû ber berxan an jî çûbû ber pêz gelek caran “nehberek” lîstibû ku di ciwaniya xwe de asta xwe ya lîstikvaniyê gelekî bi pêş ve biribû. Nehberek lîstikek e ku bi neh berikan tê lîstin û wekî lîstika dembihurandin û xemrevîn jî tê naskirin. Li navenda zemînekî çargoşeyeke biçûk tê çêkirin, paşê ji wê mezintir û ya hera mezin tê xêzkirin. Ji her koşeyeke çargoşeya biçûk heta koşeya çargoşeya mezin xêzek tê kişandin. Herî dawîn ji nîveka çar aliyên çargoşeya biçûk çar xêz ber bi çargoşeya mezin tên kişandin ku dişibihe tevna pîrê. Di nehberekê de gava sê kevir li ser xetekê yan jî aliyekî rêz bibin mafê xwediyê van keviran heye ku kevirekî reqîbê xwe hilde. Ji her du lîstikvanan kevirên kîjanî du heb bimînin ew kes têk diçe. Taybetiya vê lîstikê ew e ku kevir tenê di xetekê de diçin-tên û tu carî ji şûna xwe baznadine cihekî din; lewre divê lîstikvan paş-pêş û kêlekên xwe baş kontrol bike, nehêle ku kevirên hevalê wî têkevin nava kevirên wî.

Xurşîd di heyama dibistana navîn de hînî “sedreng”ê bûbû û hetanî dawiya dibistana amadehiyê geh geh bi hevalên xwe re lîstibû; lê di pêşbirkan de negihiştibû fînalê ku di pileya pisporan de bilîze. Di zanîngehê de dîsa dest pê kiribû; lê piştî xwendina Mem û Zîna Ehmedê Xaniyî felsefeya wî ya sedrengê lap guherî bû.

Li gorî Mem û Zînê lîstika “kişik”ê ya ku wekî şetrenc û setrencê jî tê zanîn, berê bi deh keviran hatiye lîstin û tê de kevirekî bi navê kerkedan jî hebû ye ku hejmara keviran dibe deh: Şahek, wezîrek, du keleh, du hesp, du fîl, du kerkedan û deh leşker; ango deh giregirek li paşiyê û deh leşker li pêşiyê. Ji ber ku deh kevir ên paşiyê li deh xanikan hatine belavkirin di zemînê çarçikê de sed xanik hebûne; pênc rêz ango pêncî xanik para aliyekî bûne û para aliyê din jî ewqas xanik û kevir ketine. Lêbelê ji ber çi sedemê be kerkedan êdî jê hatiye avêtin û tenê neh kevir mane. Îcar neh heb neh jî dikine heyştê û yek; lewre heke mirov peyva setrencê wekî navê pêşîn qebûl bike ev

nav ji sedrengê hatiye; lê heke mirov peyva şetrencê navê wê qebûl bike wê ev nav ji heyştê rengê hatiye kurtkirin. Carinan ji xwe re digot: dibe ku êdî bi heşt reng keviran tê lîstin, loma navê wê ji heştrengê guheriye û bûye şetrenc; an jî şêst û çar xanik para wî dikevin, loma ji şêstrengê guheriye û bûye şetrenc ku ereb tîpa /g/yê wekî /c/ bi lêv dikin. Îcar çima ji erebî hatibe? Dibe ku sedrenga ku ji aliyê gelên aryayî ve hatiye lîstin, piştî belavbûna îslamê têk çûye û wekî welatê wan lîstika wan jî bûye malê ereban; bi domana demê re aryayiyan dîsa lîstika xwe lîstine; lê nizanibûne navê wê ji ku hatiye. Di dawiyê de gihişt wê biryarê ku berê sed xane di textikê kişikê de hebûye; lewre navê wê sedreng bûye.

Xurşîd êdî felsefeyek ji bo lîstikên xwe çêkiribû: Şeşik ji bo zarokan lîstika çalakiyê ye; nehberek ji bo ciwanan destpêka ramyariyê û sedreng jî lîstika siyasetmedariyê ye. Madem ku para wî ya di sedrengê de dewleta wî bû, diviyabû dewleta xwe biparasta û dijminê xwe têk bibira, wisan e divê wateyek bida kevirên xwe. Şah ew bi xwe bû ku rola serokî didayê; wezîr serokwezîrê bû; fîl polîs û îstixbarata wî bûn; hesp balyoz û qasidê wî bûn; keleh artêşên wî bûn; leşker aborî û cebilxaneyên wî bûn. Mixabin di vê lîstikê de şer bijarteya tekane bû ku divê li gorî hunera cengê bihata birêvebirin. Lewre felsefeyeke wiha ji xwe re ava kiribû:

Di vê hunera cengê de xaneyên parçebûyî, hêsan, kevneşopî, berdest, têkel, serdest, xeter, dorpêçkirî û mîheng hene. Li xaneya “parçebûyî” mîr û axa hene; hertim li dijî hev şer dikin. Li xaneya “hêsan” mirov di demeke kurt de digihêje armanca xwe. Li xaneya “kevneşopî” de derfet ji her kesî re vekirî ne; tu û dijminê te bi heman hêzê şer dikin. Li xaneya “berdest” her kes dikare bi pêş ve here, ango riya pêşveçûnê vekirî ye û destê her kesî digihêjê. Li xaneya “têkel” sînorê sê mîran an jî digihêje hev; kî pêşiyê bigihêje çaterêya sînoran ew dibe serwerê tevan û wekî serokê giştî tê hesibandin. Li xaneya “serdest” çand û rêbaza jiyanê ya gelek kesan mîna hev e; ango serweriya hişmendiyekê heye, modela desthilatdariyê li gorî hişmendiya çand û rêbaza jiyanê ya hevpar teşe digire. Li xaneya “xeternak” bi çiya û daristan, gir û bihur, avzêm û hezakan dagirtî ye ku tê re bihurîn dijwar e. Li xaneya “dorpêçkirî” êrîşkirin û vekişîn zehmet e; hêzeke dijminî ya biçûk dikare li hêza min bixe. Li xaneya “mîheng” her tişt di nava lez û bezekê de diqewime; heke mirov bi lez biçe şer û êriş bike ji mirinê difilite; lê heke teral teral tevbigere wî şerî winda dike û têk diçe.

Xurşîdî ji bo vê felsefeya xwe hinek rê û rêbaz jî bijartibûn: Divê li xaneya parçebûyî şer nekira, li ya hêsan nesekiniya, li ya kevneşopî êriş nekira, li ya berdest pêşî li dijmin negirta, li ya têkel hevalbendî çêkirana, li ya serdest talan bikira, li ya xeternak ji rewşê dûr bisekiniya û li ya dorpêçkirî riyeke rev û vegerê bigeriya, li ya mîheng şer bikira. Xurşîdî hem bi hevalan re dilîst hem bi kombersê re hem jî bi lîstikvanên pispor ên li ser înternetê re dilîst. Gava bi hevalan re bilîsta lîstika xwe ya klasîk dilîst; wekî şerkarekî jîr noqî nava yekîneyên pêşîn û alîkar, yekîneyên mezin û biçûk, yekîneyên bijarte û leşkerên rêzîn, yekîneyên serbaz û berbaz dibû; bi riyeke kurt xwe digihande xalên lawaz ên dijminî, ew ji hev de dixist, tarovaro dikir, nêrîna wî şêlî û tevgera wî bêmehde dikir. Êdî bi tecrubeya xwe dizanibû ku gava yekîneyên dijminî ji hev de bikevin ew dê rê nede ku careke din bi ser xwe de werin. Bi heman tecrubeyê dizanibû ku gava yekîneyên dijminî xwe li hev ragirin, divê ew rê nede wan ku careke din rêxistina xwe têkûz bikin. Ji ber ku gava hêza dijminî yekgirtî, rêxistî û pergalkirî be ew dê êriş bike; gava jihevketî be ew dê li cihê xwe raweste, çend tevgerên bêfayde nîşan bide.

Rojekê Xurşîd beşdarî pêşbirka sedrengê ya zanîngehê bû ku ji bo wî delîveyeke gelekî sûdwer bû. Wê roja ku derkete pêşberî hevrikekî nenas hişê xwe kir qada jîmnastîkê, pirs li ser pirsê rêz kir: “Gava ez li hemberî kesekî pispor bilîzim ku qabiliyetên wî yên minawereyê zehf bin, gelo divê çawa bilîzim?” Bersiva xwe di hişê xwe de dida: “Li tevgera wî binêre, gava kêfa wî bi lîstikê re hatibe û zû bilîze ew encamê dizane û te ber bi pêvajoyê diajo; wisan e pê nexape, dest dayne ser wî tiştê ku jê re cazibedar e; tu dê binêrî ku çiqasî sernerm bûye û kêfa te ya lîstikê narevîne; bi xwe jî nekeve heman dafikê. Çal û kemîna ku jê re dikolî bi xwe nekevê!” Piştî vê pirsê dîsa kete

nava liv û tevgerê: “Gava hevrikê te destsivik û biryarsivik be tu dê çi bikî?” Bersiva tekane dihate bîrê: “Di şer de destsivikî û biryarsivikî encamê diyar dikin; wisan e jê sûd wergire, bila hevrikê te negihêje leza te, rêbazên nenas bi kar bîne û ji cihê ku hevrikê te lawaz e û ne li benda minawereya te ye êriş bikê. Gava tu artêşa xwe li cihekî nenas daynî, tu dê li ser hemû ihtimal û xetereyan hişyar bibî; bi vî awayî tu dê baş konsentre bibî ku êdî hevrikê te nikare xwe li hemberî te ragire.”

Li gorî Xurşîdî diviyabû lîstikvan amade, ragirtî û rakişandî bibe; herêmên dewlemend talan bike ku leşkerên xwe têr bike. Xwarina baş mehde û hêzê diafirîne, ev jî bi xwe re tevgerên netexmînkirî yên artêşê tîne. Gava tu riya revê, xweparastinê û xwerizgarkirinê bidî pêşiya artêşê, ew zû bi zû riya mirinê nabijêre; lê gava ku bi exlaqekî bilind be û bizanibe ku bi mirinekê gelek jiyan dê rizgar bibin, wê hingê amade ye ku bimire, fedakariyê bike. Gava leşker bigihêje mehdeyekî bêhevta û hêzeke bêdawî, gava ji tu dijwariyê netirse ma wê hingê nikare çi bike?

Di pêşbaziyên sedrengê de gelek lîstikvanên nepispor jî beşdar dibin; hinek xwe diceribînin, hinek forsa xwe diavêjin, hinek bi xatirê şansê hevrikekî neşareza çend destan bi pêş ve diçin; lê hinek pispor in, şareza ne, her kevirekî xwe bi ramaneke kûr û stratejiyeke serkeftî dileqînin. Îcar gelo bextê Xurşîdî çawa bû? Gelo ew dê di serê sêrî de rastî hinek neşarezayan bihata û çend destan bi pêş ve biçûya yan dê lîstika xwe ya pêşîn de rastî pisporekî bihata, paşstûka xwe bixwiranda û wekî temaşevan li qada lîstikê bima?

Di nava van tirs û fikaran de hate pêşberî hevrikê xwe yê pêşîn; riya rizgariyê tunebû, divê li ber xwe bida, wekî pezeke ku ji keriyê xwe veqetiyaye û bi sehm diçêre li tevgera hevrikê xwe inêriya, bêyî ku raweste ber bi pêş ve şer bikira. Di nava şer de hînkarî bi dest nakeve, badilhewa ye ku lîstikên ceribandinê û xwe nîşandanê bikî. Heke bêyî hînkariyê disîplîna xwe bi dest bixista, dê bêyî axaftin û gotinê taetkariya kevirên jî bi dest bixista. Heke ji rêbazên lîstikê re sadiq bimaya, dê kevirên wî jî bêyî lihevkirineke pêşwext sedaqet nîşan bidana. Heke baweriya wî bi serkeftinê hebûya yan jî kevirên xwe li gorî stratejiyekê bilîsta, wê hingê bêyî fermankirinê dê baweryek jê re çêbûya.

Diyar bû ku hevrikê Xurşîdî yê pêşîn jî hînkariyên xwe temam kirine û bi heman armancê li pêşiya wî ye; ew fend û fûtên ku di hişê xwe de digerîne, bi heman şêweyî di hişê hevrikê wî de jî digerin. Lewre biryar da li dijî spekulasyonên hevrikê xwe karekî qenc derxe mehderê, ne di dilê wî de ne jî di dilê hevrikê wî de bila şik nemîne ku heta matbûnê alternatîfeke din peyda nabe. Divê qedr bida her kevirekî xwe; rast e peyakên wî ewqasî ne giranbiha bûn, lêbelê divê ji tiştên kêmbiha nefret nekira. Herwiha divê ji bo bidestxistina hesp, fîl, keleh û wezîrekî divê qira leşkerên xwe neaniya. Leşker heye ku peywira xwe baş bi cih tîne, êrişeke serkeftî dike, dikeve nava sînorê dijminî, dibe wezîr û vedigere welatê xwe; wisan e leşker ji mirinê natirsin û jiyaneke dirêj jî biçûk nabînin.

Keleke xwihê bi ser Xurşîdî re avêt û hevrikê wî ev tevgera wî dît. Peyakên xwe wekî oxirkirina leşkerekî dişande cengê; dema ku ferman dida, peyak bi unîformayên ji utîkirina teze nemgirtî bi rê diket; carinan rûniştî, carinan veketî, hinarik bi rondikan şilbûyî dimeşiyan. Di gava xwe ya pêşîn de peyakan dizanibû ku êdî ketine riyeke bêveger û gava pêşî li wan bihata girtin jî diketine rewşeke bêtevger. Wê hingê leşker bi wêrekiya dişibihîn Ristemê Zal û Xanê Çengzêrîn. Stratejîstê zîrek dişibihe şahmaranekî ku li çiyayê Qaqilwaqê dijî; mirov serê wî bipirçiqîne jî boçika wî bi lez dilive; mirov li boçikê bide serî bi lez vedigere û li mirovî vedide, jehrekê berdide bin çermê mirovî; gava mirov bi zanatî yan jî bi şaşîtî li navê bide, serî û boçik bi hev re bi lez li mirovî dialin û lê vedidin. Gelo dibe ku tevahiya artêşekê mîna şahmaranê Qaqilwaqê tevbigere? Bersiva Xurşîdî “erê” bû.

Xurşîdî xwest ku bala hevrikê xwe ji ser tevgera xwe bibe û dest bi hevnasînê kir:
-Birako, navê min Xurşîd e û beşa dîrokê dixwînim; lê tu?

-Navê min jî Serdar e û ez jî beşa endazyariyê dixwînim.

-Hêvîdar im ku di destê pêşîn de min têk bibî û qe serdariya te neşkê û heta dawiyê Serdarê vê meydanê bî.

Serdêr xwe mecbûr dît ku duayekê li hevrikê xwe bike û ji bin mineta wî derkeve:

-Ez wateya navê te nizanim; lê ez jî ji te re bextekî vekirî niyaz dikim.

-Xur tê wateya “roj”ê û “şîd” jî tê wateya ronahiyê, ango “ronahiya rojê”.

-Tu niha wateya “cimşîd”ê jî dizanî, gelekî mereq dikim ew tê çi wateyê?

-“Cim” tê wateya hîvê û “şîd” herwekî min berê jî got tê wateya ronahiyê, ango “ronahiya hîvê”.

-Sipas ji bo vê agehiyê; lê divê em hinekî destê xwe lez bigirin ku zû bigihêjin fînalê.

Xurşîdî bi vê kurteaxaftinê fêm kir ku çavên hevalê wî li fînalê ye û lezgîn e. Lewre biryar da ku hêdîka û bi emadê xwe bilîze; lê gelo ev taktîkeke hevrikê wî bû yan bi rastî jî wisa dixwest? Her çiqas kevirên paşîn ên giranbiha leşkeran dişînin eniya şer û pêşiya minaweraya xwe vedikin jî, her çiqas di navbera peyak û giregirekan de nefreteke eşkere hebe jî roja şer û talanê alîkariya hev dikin. Ji ber ku peyak û kevirên din gava bi tevayî li keştiyekê siwar bin û navgîna wan pêrgî firtoneyê bê, ew mîna destê rast û çepê alîkariya hev dikin; nexwe lezandina wezîr, fîl, keleh û hespan têrê nake. Rêberiya rast ew e ku mirov bikaribe li ba hemiyan wêrekiyê vejîne. Rêbaza rast ew e ku mirov bikaribe li derveyî eraziyê xwe jî minawereyan bike; hem bikaribe peywirên rehet û hêsan hem jî yên dijwar û tirsnak bi cih bîne.

Xurşîdî hevrikê xwe carekê teqiland û hilqefşand; hizr kir ku endazyar bi pîvan tevdigerin û mîna lîstikvanê nehberekê di xetekê de diçin. Li gorî endazyaran “gava ihtimala têkçûnê hebe, jixwe têk dê rojek ji rojan têk here jî”. Lewre divê Xurşîdî tirs biavêta dilê wî û carinan bi mantiqa wî jî bilîsta: “gava her tişt li gorî dilê te biçe, di vî karî de pirsgirêkek heye; pirsgirêka çareserkirî pirsgirêkên din bi xwe re tîne; bi tiştekî re zêde bilîzî tu dê wî xera bikî”.

Dema ku Xurşîd li ser van stratejiyan difikirî ji nişkê ve rêbazine endazyariyê yên din hatine bîrê: “tu tişt bi qasî ku xuya dike ne hêsan e; heke bibêjî 'ev mase boyaxkirî dest nedê' ew dê hewl bide ku dest bidê”. Wisan e divê hanzûka ve ji fikar û nirxandinê derketa; tevahiya bala xwe bida lîstikê û lîstikvên. Stratejîstê jîr rêberiyeke wisa koma xwe re dike ku kom nema dikare xisarê bigihîjîne xwe. Peywira serfermandar ew e ku di bêdengiyekê de aramiyê pêk bîne û bi rêbazên lihevhatî rêveberiyeke serkeftî biafirîne. Gava peyakên wî ji agehdariyê bêpar bin, berê xwe dabin eniya dijmin divê ew rênasiyeke pêwist bigerîne.

Xurşîd dîsa da hişê xwe ku plana xwe ya amadekirî neguherîne; nekeve riyeke nenas û bi van mijûlahiyên xwe yên bêbingeh-neceribandî hemû endamên artêşa xwe ji zanînê bêpar nehêle. Rast e carinan bi guhertina cihê xwe yê razanê û riya xwe ya rojane, ew ê şaşmayînê peyde bike; lêbelê dema ku ber bi jor ve hilkişe û di lehzeya rast de pehînê li nerdewenê bide, ew dê li kûrahiya erdê dijminê xwe fermanberên xwe yên bê zar û ziman şerpeze bike. Wisan e divê keştiyan neşewitîne, firaqên xwarinê neşkîne, nebe mîna şivanê ku berê pêz dide devereke kêmnas û li şûna ku pêz ji guran biparêze, bi xwe bi vir û wir de dibeze, kes nizane bê ka rûgeha wî bi ku de ye. Rast e komkirina hemî peyak, hesp, fîl, keleh, wezîr û şahên artêşa sedrengê peywira lîstikvên e; lê divê baş bizanibe bê ka çawa ji eraziyên xeternak re derbas bibe.

Dema ku Xurşîd di nava deryaya ramanan de bû, Serdêr nermînga peyakekî wî hilda û danî kêlekê. Bi mirina leşkêr re şîn kete nava mêjiyê Xurşîdî; lê wî nûçeya kuştinê ji raya giştî re ranegihand, hinekî rawestiya, heta ku jana çêkûç ji sêrî derket liv û tevger nîşan neda. Paşê bi xwe re kete şerekî kurt û bi ser ket: ev camêr endazyar e, ji kîmya, biyolojî û derûnnasiyê zêdetir bîrkarî û fîzîkê bi kar tîne; lewre li cem wî pertaf û fors tunene, lîstik bi rêbazên lîstikê tên lîstin. Wisan e divê gavên pîvandî biavêje ku bikaribe li ber hevrikê xwe raweste; bi çend kulman ve dengeya wî şaşopaşo bike. Bi fîlekê peyakê Serdêr hilda û bi hêminiya wî re lîst; pîvanên bîrkariyê bi kar anîn û

peyakekî din jî da. Na, divê êdî dîroknasiya xwe bi kar bianiya ku Serdêr jê nizanibû; artêşa xwe berhev kir û cardin êriş bire ser. Ji ber guherînên li wan neh xaneyan, divê zelaliya taktîkê û mercên derûnî ji nirxandinên xwe dernexista û çu carî ji bîr nekira. Gava li eraziyê nenas bal û morala artêşê belawela bibe kêşmekêşiyek, aloziyek pêk tê; lê ev rewş demkurt e yan jî divê pêşî lê bê girtin ku tedbîrên ewlehiyê werin girtin.

Serdêr çend kevirên xwe heta ber xeta sînor anîbûn; sînorên dewleta xwe li paş xwe hîştibûn û derbasî sînorê dewleteke din bûbû, li wê herêmê bi biryardarî şer dikir; lêbelê pêşketina wî sînorkirî. Êdî daketibû kûrahiya erdê dijminê xwe yê Xurşîd û serdestiyeke berbiçav bi dest xistibû. Li dijraberî Serdêr, Xurşîdî nikaribû daketa erdê wî; ji ber ku Serdar bi sîmetriyekê diçû; lewre bi hêsanî minawereyên xwe dimeşandin. Divê Xurşîdî tedbîrên ewlehiya herêma xurt bikirana û li dora kevirên wî yên pêşketî bigirta, li herêma xwe derfeta gerê neda wî. Herwiha divê li pey peyakan neketa û sekvan li pey giregirekên wî bixistana, dor li wan bipêça, riya vegerê ji wan bibiriya û gemaro dayîna ser.

Dema ku hesp û wezîr ji xaneyên paşîn kişand û ber bi şerê rastîn ajot; ji bîr nekir ku bi rokeke biçûk şûna şahê xwe jî biguhere; li dora wî bi peyak, fîl û hespan bipêçe û kelehan bi hev re derxe meydana şêr. Serfermandarê artêşa Xurşîdî li pêwistî û daxwazên hemû endaman nihêrî, rewşa tevgerê pîva, carekê ji aliyê xwe ve li qada hevrikê xwe nihêrî, carekê ji qada hevrikê xwe ve rewşa artêşa xwe tesele kir. Gelek kevir li kêlekan sekinîbûn; şerekî dijwar qewimî bû û di vê herêma parçebûyî de geşt û ger hêsan bû. Êdî bi asanî ji wî serî dikaribû here û were; lê divê destûr neda peyakan ku xwe erdê re bikişînin, bigihêjin eniya wî û bibine wezîr û berpirsiyarên girîng. Lewre divê bi çavekî giştî li her du aliyan ve li zemînê lîstikê binêriya û biajota ser şahê wî.

***

Serdar mat bûbû, Xurşîd mabû fînalê û ew duaya wî ya di serê lîstikê de li wî vegeriyabû; lê xetere didomiya ku keçeke bedew derkete pêşiyê. Xurşîd fikirî ku vê keçê bi bedewiya xwe kurikek têk biriye û divê baldar be; bi tevgerên wê yên zayendî nexape. Hevaltî, evîndarî tiştek e û lîstik, serkeftin tiştekî din e; lewre xêrhatinî lê kir û got:

-Hevalê, bi texmîna min te bi bedewiya xwe kurikek têk biriye; navê min Xurşîd ji beşa dîrokê.

Keçikê destê xwe bire porê xwe û ew da aliyekî; destekî xwe wekî baweşînkê hejand û got:

-Na lo, min bi keçekê re lîst; me gelekî gijika hev kaş kir û di dawiyê de min pişta wê gihande erdê şil. Navê min jî Fatme ye û beşa zanistên siyasî dixwînim.

-Wisan e, tu dê mîna Qere Fatmeyê artêşa xwe kom bikî; li hemberî artêşa min a ûriskî şer bikî û di fînalê de herî Stenbola paytext ku fînala fînalê ye.

-Hêvîdar im ku ûris nekeve erdê min û pêwistî bi şerekî tunebe; çûyîna paytext jî nesîb û qismet e.

Xurşîd bi teqla axaftina wê mat bûbû, bûbû heyrana nirxandinên wê û dest bi lîstikeke qirêj kir. Hinekî bi simbêlên xwe ve lîst û li bin çavan re tevgera hevrika xwe nihêrî ku gelekî aram e, wekî ku di dilê xwe jê re dibêje “ez ê niha wan simbêlên te bikim gema devê te”; lê diviyabû dengeya wê serobino bikira, îcar çawa?. Wisan e dijmina wî di beden û derûniya xwe de serdest bû, gavên pîvandî diavêtin, bi sehma xezalan dimeşiya, li der û dorê dinêriya; lewre divê lez bida rêzên paşîn, parastina xaneyên berdest bikira, li xaneyên têkel hevkarên xwe zêde bikira û ji hêza dostan zêdetir aloziya dijminan bi kar bianiya. Ji nişkê ve hate bîrê ku “gava hevrik serdest be, divê mirov bi riyên ewle debara xwe bi rê ve bibe, zû bi zû nekeve kemînan, ji karên mişextî bi dûr keve û li dora kevirên pêşketî bipêçe”.

Çend minawere bêyî ziyan pêk hatin ku Xurşîdî dest bi lîstikeke qirêj kir; li kêlekeke rana xwe girt û çend caran xwirand. Dêma keçikê rakişiya, qerçûmek ketine rûyê wê û xeyalşikestî lîstik

domand; Xurşîdî nihêrî ku hevrika wî ji berê zêdetir biryardar e û ji her aliyî ve şer dike, kevirên wê ji mirinê zêdetir ji kuştinê re amade ne. Lewre gotinek avête ber Fatmeyê ku tevgera dev û dêmên wê ji nêz ve bibîne:

-Hevala Fatme, dema tu rûniştî te bi destekî porê xwe daweşand û bi destê din baweşînk hejand; min got ku ev keçikê zû zora min bibe. Dinêrim ku dilê te biryar daye têkbirinê.

-Belê kekê Xurşîd, dema ez rûniştim û min por ji ser rûyê xwe avêt kel û germahiyeke enerjiya te dida min; min qe nedixwest kenê rûyê te bibirim; lê min nihêrî ku piştî çend keviran destekî te çû lîstikê û yek çû simbêlê, paşê yekî bi keviran û yekî bi navranê lîst; lewre min biryar da ku te ji pêş xwe rakim.

Xurşîd soromoro bû, wekî ku ji ber xewan di kendalekî de bigindire bersiveke kurt û mizomizo da:

-Xwişkê, destên min destê te dişopînin; sûcdar bim jî sûcdarê wê şopê me.

Fatmeyê bersiva wî eynî nehanî, jinanî lêva xwar kir û lîstik berdewam kir. Piştî ku fîleke wî ya zer danî kêlekê jê pirsî:

-Kekê Xurşîd, bi texmîna min ev cara pêşîn e ku bi keçekê re dilîzî û yan jî wiha bipirsim tu keçikan rind nas dikî?

-Ez keçikan rind nas nakim, lê jineke di çîroka diya xwe de baş nas dikim, -got û enîşekeke berk li newqa xist-. Xurşîdî bi vê gotina xwe xwest ku zedeyê li keçîniya wê bixe û tevgera wê ji şûnê bileqîne; lê Fatmeyê bi pirsekê dîsa bala wî belav kir:

-De ka çîrokê ji min re jî vebêje ku hêvîdar im tê de ev gotina pêşiyan jî derbas be “goştê her çivîkê nayê xwarin”.

Xurşîdî mehdeyê xwe xera nekir û fêm kir ku siyasetmedarek bi peyvan têk naçe; lê dîsa jî bi devekî ken bersiv da:

-Na, ew gotin derbas nabe; lê mijar hema hema li dora “meriv mecbûr bimîne goştê kewan jî dixwe” yan jî “da dû bîna kebaba û rastî daxkirina keran hat”.

Fatmeyê peyakek jî hêdîka danî tehêlê û got:

-Bi Xwedê, meriv li mala mêvanan xwarinê nabijêre; de ka vebêje.

Xurşîdî dest ji lîstikê berda, serê xwe bilind kir û got:

-Ez ê vebêjim û cardin neaxivim; tikaya min ji te hema em lîstika xwe bilîzin. Lîstika mêr û jinan bi şer naqede; were û em vê rêbazê biguherînin bi rastî jî şerekî bikin, yekî me zora yekî bibe û her yek here riya xwe.

Fatmeyê bi “hay hay”ekê pejirand ku piştî çîrokê cidî bilîze û Xurşîdî jî dest pê kir:

-Li welatekî korek hebûye ku bi jineke bedew re zewiciye; dê-bavên keçikê feqîr bûne û ji xwe re gotine: qe nebe ev î kor e, rizqê xwe ji par-pûrsê dide hev û keça me birçî namîne. Ev parsekê kor gelekî bizêhn bûye û her roja ku hatiye parsê bi xwe re qurmekî daran ê biçûk, hebanek ceh û tevşoyekî biçûk jî aniye. Ji aliyekî ve kumê xwe derxistiye û daniye erdê, dua li xelqê kiriye ku çend qurişan biavêjinê; ji aliyê din ve hebeke cêh daniye ser darikê li pêşiya xwe û bi derbekê ew ceh ji navê de kiriye du parçeyan. Ev zêhn û baldariya wî ewqasî navdar bûye ku mîrê welêt jî pê hesiyaye. Rojekê mîr dişîne pey û tîne qesra xwe, jê dipirse bê ka çawa dikare bê dîtin û bînahî hebeka cêh di navê de bibire. Parsek bi gotineke sade bersivê didê ku xemeke wî tuneye zêhna wî şêlî bike û şukra Xwedê dike. Mîr diyariyekê didê û dişîne; lê jineke kone cem jina wî ku mêrê xwe yê kor bihêle û here bigihêje wî, di qesra wî de xanimtiyê bike; lê divê navê mîr xera nebe û pêşiyê xwe bide berdan. Pîrejina kone rarûyî jina wî dikeve, heta ku ji rê derdixe. Rojekê dema koro tê malê jinik xwarinê dereng çêdike, rojekê bi ser de diqîre û rojekê jî dibêjê: “korê heram tu jî bi merivan qayîl nabî”. Di vê navberê de sîxurên mîr jî rojane salixên koro û tevgera wî didin. Li gorî gotina sîxuran rojekê nikaribûye di navê de lêxe, rojekê nikaribûye heba cêh bibîne û roja paşîn hatiye hinekî rûniştiye; lê nikaribûye devê tevşoyê xwe li qurm bixîne; lewre hêrsa wî hatiye û vegeriyaye mala xwe. Mîr dîsa gazî wî dike ku çima êdî nikare hebên cêh bibire. Korê parsek dibêjê ku zêhn û bala wî şêlî bûye. Mîr dipirse bê ka çi qewimiye û çîroka wî dibihîze. Paşê gazî jina wî dike û her duyan jî xelat dike û dişîne; lê dibêje koro ku wî bi zanatî ew ceribandiye bê ka zêhna wî çawa belawela dibe, helaliyê jê dixwaze. Li ser vê yekê koro xelata wî û jinê dihêle û diçe; lê jê re

wiha jî dibêje: Jina ku ji bo hopek nan mêran biguherîne û mîrê ku ji bo hînbûnê malan birûxîne heman teşqele ne. Lewre jinê li wir berdide, destê zarokan digire û berê xwe dide dîwana Xwedê ya ku tê de xap tunene.

Fatme mehtel ma ku tiştekî bibêje; lê dizanibû ku bi çi mehneyê gotiye; ango “hûn jin wiha ne, bawerî bi we nabe”. Vê çîrokê hêzeke xurt da wê ku biryareke lezgîn bide û di dilê xwe de got: “Tu here, xwe qurbana wê dayîkê bike ku bi vê çîrokê tu hînî fendên jinan kirî. Ez ê jî te bikim qurbana van tilî-pêçiyên xwe ku careke din neheqiyekê li jineke nenas nekî, camêr camêrane bimeşî û dev ji vê lîstika xwe ya qirêj berdî, ji qeşmeriyê towbe bikî!”

Fatmeyê bi çend êrişan qira kevirên wî anî û dest neda peyakan; pêşiya wan girt ku neçine wezîrtiyê; wekî ku tinaze û qerfên xwe pê bike ji wî aliyî ve şah, ji aliyê din ve wezîr kişandê; lê qilç û mat nekir. Di dawiyê de wekî ku bêhna wê teng bibe axivî:

-Kekocan, koro destê zarokan girt û berê xwe da dîwana Xwedê û rehma Xwedê zehf e. Îcar te jî destê peyakên xwe girtiye û fêlan dikî ku wan derxî meqama wezîrtiyê. Lê bizanibe ku rehma min tuneye; divê lîstik li gorî rêbazên lîstikê were lîstin, berpirs werin û wêneyê têkçûna yekî me bikêşin.

Li ser vê gotina wê Xurşîdî ji dil xwest ku Fatme wî têk bibe; lê wê wekî roviyan çûvek li wî aliyî û yek li wî aliyî dixist, ew mat nedikir. Xurşîdî jî fêm kir ku çend caran êrişên gêjane kiribin jî Fatmeyê ew têk nebiriye; êdî bi şeref û anora wî ya lîstikvaniyê re dilîze. Lewre bi devekî ken ku dişibihiya daxwaza lêborînê got:

-Tu şareza yî, te heq kir ku min têk bibî; lê bi zanatî têk nalîstikê dirêj dikî. Wîsan e, yan tu dixwazî derseke mehkem bidî min, yan dixwazî min bidî axaftin û bi têra dilê xwe qerfan li min bikî, yan jî dixwazî kapê min bidî destê min, ez bi xwe biavêjim stûyê xwe û xwe daliqînim.

Fatmeyê soz dabû xwe ku lê neyê rehmê; lewre bijarteya sêyem wekî biryareke dadwerane dît û got:

-Gotina te ya dawîn beraqil e, berdewam bike.

-Îcar çawa berdewam bikim ku nizanim çawa xwe têk bibim?

-Baş e, wisan e ez hînî te bikim: Qedera leşkêr e ku gava dorpêçkirî be xwe biparêze û şer bike; herwiha dema ku tu hêviyeke wî tunebe û riyeke din a rizgariyê jî nizanibe divê êriş bike. Bêyî zanîna planên hevrikan, hevkarî ne mumkin e. Bêyî zanîna çiya û daristanan, newal û kêrtan, herêma avzêm û hezekan hîç artêşek nikare bi pêş ve here. Bêyî alîkariya rêzanên herêmî, mirov nikare ji îmkanên eraziyê sûdê wergire. Heke tu van pênc rêzikên lîstikê nizanibî karê te rast naçe.

-Îcar çi? Tu ketî felsefeya lîstikê; bibêje ka ez ê çawa xwe sernigûn bikim?

-Gava te êrişî welatekî mezin kir, divê bi qaydeyekî wisa be ku dijmin nikaribe artêşa xwe seferber bike, dema ku tirs avête nav refên dijminî, ew êdî nikare hevkarên xwe komî ser hev bike; heke gazî bike jî gaziya wî tenê qareqar e. Gava tu ji bo bidestxistina hevkarî, alîkarî û ava serweriyê têkoşînê nedî, divê tu ji dek û dolabên xwe bawer bî. Bi vî awayî tirs dikeve nav dijminî. Bi vî awayî bircên dijminî têne wergirtin û welatê wî tê pirçiqandin.

-Tu hê li ser serê min forsê dikî, binêre ez ê bi kefa destê xwe textikê lîstikê belawela bikim.

-Wisan e, tu dê dîskalifiye bibî; ev tevgera te dê bê tomarkirin û tu dê nikaribî careke din têkevî pêşbaziyên fermî.

-Îcar, li benda tolhildana te me; ji kerema xwe bê îşkence dawiyê li vê lîstikê bîne.

-Haşa, ne layiqî min e ku îşkenceyê li bendeyên Xwedê bikim; em xwişk û bira ne. Lêbelê divê bizanibî ku ez bêyî girêdana peymanekê, xelat û fermanê bide leşkerên xwe; lewre ew yek leşkerî tevdigerin. Peywirê didim leşkerên xwe û bi wan re naaxivim. Bi xelatan wêrekiyê peyda dikim, bêyî ku qala ziyan-zererê bikim. Wan dişînim mirinê; lê ew hînî kuştinê dibin û têk naçin. Wan radiweşînim nava bela û bobelatan; lê zindî vedigerin. Êêê, tu dizanî gava mirov gava pêrgî karesatan tên, êdî ji bo rizgarî û serfiraziyê têdikoşin. Tiliya leşkerekî jêhatî didime ser nebza dijminî.

-Ji kerema xwe êdî dev ji forsan berde û niyêta xwe ya rastîn bibêje.

-Armanca tevgereke leşkerî qaşo avadanî, aramî û rakirina aloziyan e; ne wisan? Na, heke te

hişê xwe bi temamî dabe ser dijminê xwe, ew hezar kîlomêtroyî jî li dûrî te be, tu dikarî serleşker û fermandarên wî bikujî. Serkeftina hêjayî pesnê ev e keko!

-Xwişkê, roja ku şer hate ragihandin, sînor û gumrik têne girtin û hemî pasaport têne betalkirin. Herwiha rê li sûcdarên siyasî, leşkerî û balyozan tên girtin. Ka ji kerema xwe re amadekariyên xwe bigihîne qesra birakê xwe û li benda hûrguliyan be.

-Baqê keziyan bi xweziyan nakeve destan, bilive û bilîze; dem teng e û derî teng e.

-Te rasterast xwe kir dijmin; lê divê deriyê hêzên dijminî vebin ku tavilê bikevime hundir.

-Pêşiyê fêm bike bê ka çi dixwazin, dixwazin çi bikin. Ji bo ku çarenûsa şer diyar bikî dijmin rind raçav bike. Bila bala te li wî be ka daxwaz û pêwistiyên wî çi çi ne. Destpêkê wekî keçeke şermoke be, bila dijmin deriyê xwe ji te re veke. Paşê mîna kerguhekî gêj wisa bi lez lêxe ku dijmin nikaribe xwe biparêze.

-Xwişkê qey te Xwedê ji bîr kiriye? Gotin û daxwaza wî bi ser her gotinê re ye?

-Na, di bîra min de ye. Dibêjin merivek rastî gundiyekî xwe hatiye ku ji deştê, ji nava zeviyan tê. Mêrikî hatî dibêjê ku Xwedê hez bike zeviya wî dê baş gênim bide. Mêrikê li gund sekinî jî dibêjê ku Xwedê bixwaze jî nexwaze jî zeviya wî dê baş gênim bide, êdî similan girtiye. Mêrikê hatî dibêjê ku wisa bi zora Xwedê diçe, towbe bike; lê ez xwe dide erdê û xebera wî nake. Wê rojê taviyek dide nava bestê û teyrok-zîpik tenê li zeviya wî dixin, bi erdê re dikin xesîl. Ez hay ji xwe heme.

-Tu bidî xatirê Xwedê, rast bibêje dilê te heye ku xwe dîskalîfiye bikim?

-Na welleh, dixwazim vê yekê ji te re bibêjim: Mala felekê xera be ku Xwedê simbêl daye ber devê hinekên mîna te û hinekên mîna min jî wekî Qere Fatmeyê ji dêl ve şer dikin û diçin Stenbolan. Na welleh ez navê jina kurd xera nakim û ji ber tevgera te navê mêrê kurd jî xera nakim. Tu here Stenbolê ku bila bibêjin mêrekî kurd hatiye vir û bi me re dilîze; bila nebêjin ku keçeke kurd hatiye vir û em çawa tiştekî bînin serê wê.

Fatmeyê dest pê kir, jê re fend û fûtên lîstikê vegotin; xwe egle kir û lîstik anî ser şahmatekê û sekinî. Gava hekem bihata Xurşîdî dê bi kevirekî ew mat kira; lê bi vê bihaneyê Fatmeyê ew dihêvot û şîret dikir:

-Xurşîdê bira, gava tu çûyî vegirtina Stenbolê bajarên li pêşiya xwe mîna Tîmûçîn rûnexîne; lê ava bike. Bal û rikê xwe bide roma reş; gava te bajar dorpêç kir tenê rêvebiran siza bike, gava te vegirt dadwer û wêrek be.

Di wê navberê de hekem digeriya û Fatmeyê xwe da têkbirin û Xurşîd ma fînalê; lê fînala fînalîstan piştî hefteyekê bû û yekemînê wê dê biçûya Enqere û Stenbolê. Di nava axaftinê de Fatmeyê soz dabûyê ku perwerdehiyeke baş bide wî û derxe pêşberî bavê xwe ku heta niha kêm caran têk çûye.

Bi qasî pênc rojan Fatme û Xurşîdî li kantîna zanîngehê sedreng lîstin û baş hev du nas kir. Herwiha êdî Xurşîdî heq dikir ku derkeve pêşberî bavê wê; lê di lîstika wî ya pêşîn fiyasko û skandal bû ku di navbera çend deqeyan de têk çûbû. Fatmeyê ew hêvot ku dev jê bernede û dîsa bilîze; zarok bi çalepîka dest bi revê dikin; lewma Xurşîdî dîsa hewl da û vê carê ji cara yekem hinekî derengtir têk çû. Êdî bawerî hatibû wî ku ew dê rojekê bi ser bikeve; têkçûna wî ya li hember vî camêrî nayê wê wateyê ku hemû lîstikvan mîna wî şareza û pispor in.

Roja yekşemê balafira danê sibehê diçû Îzmîrê ku nîvro pêşbaziyê dest pê dikir. Fatme heta balafirgehê pê re hat û bi rê kir. Beriya derbasbûna perona rêwiyan Xurşîdî bi zimanekî şermoke gote Fatmeyê:

-Gelek ked û zehmetê te li ser min heye; ez dê nikaribim ji bin vî barî rabim.

-Gava tu serkeftî vegeriyayî, hesîbanî te deynê xwe digel xelatan ve daye.

-Nizanim çima, lê giyanê min wisa kal bûye ku tu dibêjî di temenê Nuh eleyhiselam de me.

-Ji vî karî re temendirêjî pêwist e; divê tu hay ji bayê felekê hebî ku bikaribî tiştekî bi dest bixînî.

-Tirsa min êdî ne ji têkçûnê ye; tirsa min ew tirs e ku tu kilama “Genc Xelîl” biavêjî ser min.

-Xwedê neke lo, bêhna xwe fireh bigire.

-Tu dizanî, ereban nikaribû Amedê vegirin û wê hingê seroka kurdên Amedê jinek bû. Wê jinê her sibeh li bejn-bala siwarekî çeleng dinêrî û bûbû aşiqê wî. Li gorî dîroka ereban wê jinê bajar radestî artêşa Xalid kiriye.

-Te şaş xwendiye. Keleha Amedê pir xurt bûye û artêşa Xalidî nikaribûye vegire. Rojekê Xalid dinêre ku segekî birçî tê û dikeve nava sergoyên artêşê. Mêrikî fehma bûye û seg daye şopandin; nihêrîne ku ji quleke Bedenên Amedê re derdikeve û tê hinda wan. A wê şevê fermanê dide ku komeke leşkerên çeleng têkevin kelehê û dergeha vekin. Bi vî awayî bajar tê vegirtin; lê tu arxayîn be, ku em ê tu carî bajarên xwe radestî biyaniyan nekin.

Xurşîd demekê fikirî û got:

-Erê welleh, Xwedê simbêl dane ber devên me û hûn ji me hêjatir in; ma we Şêx Seîd radestî neyaran kir, ma we...

-Bes e, kela xwe tijî neke. Xwedê alîkarê te be, bi xêr û xweşî herî, serberz vegerî.

Bi vê xatirxwestinê êdî dildariya wan eşkere bûbû û di vegerê de divê êdî bi hev re bizewiciyana. Her duyan jî nizanibû bê ka ev rojên dûrahiyê dê çawa derbas bibûna. Ji ber ku pêvajoya fînala navneteweyî li Stenbolê bû û beriya wê jî Enqere hebû. Xurşîd bi hêviya ku li Stenbolê beşdarî şampiyonayê bibe, digel Kasparovê rûsî wêneyekî bikêşe û li binê wêneyî binivîse “du lehengên sedrengê yên cîhanî”. Ji bo vê yekê gelekî xebitîbû; hem bi Fatmeyê re hem jî bi bavê wê re. Her çiqas bavê Fatmeyê mizgînî dabûyê ku ew dê qezenc bike jî, ji xwe re digot: “Ew jî mîna min kurê bavê xwe ne; destê wan jî mêjiyê wan jî dixebite”; lê zêdehiyeke wî hebû: bi salan li ser felsefeya sedrengê, dek û dolabên wê, lehengên wê, jiyanên lehengan xwendibû. Di dawiya dawîn de rastî dildareke hêja hatibû ku hem exlaqê lehengiyê dabûyê, hem tevahiya hunerên xwe radestî wî kiribû, hem jî li ber destê bavê xwe ji ezmûnekê re derbas kiribû.

Xurşîd li Îzmirê gelekî hêsa bûbû yekem û di telefonê de ji bavê Fatmeyê re serpêhatiya xwe vegotibû. Roja çarşemê dema ku çûbû Enqereyê û sibetirê bikeve pêşbirkê, dîsa telefon kiribû û hinek rêbaz û teknîkên nû hîn bûbû; lê dilê wî pirtepirt bû. Ji ber ku Enqere paytext e, piraniya şêniyên wê karmendên dewletê ne û zarokên wî bajarî hem perwerdehiyeke baş dibînin hem jî rewşa wan a aborî baş e; lewre derfetên wan ên lîstik û ceribandinê zêdetir in. Ji nişkê ve serpêhatiyeke li gundê wî hate bîrê: Mamosteyê gund kurê xwe û zarokekî gundî berdabûne hev ku gulaş bigirin. Gundiyî kurê wî bilind kiribû û hing li erdê xistibû û li ser vê yekê mamosteyî gotibû: “Kurê min, tu bi biskêvît û gofretan mezin bûyî; ew jî bi nan û toraqê mezin bûye. Helbet ew dê te biavêje erdê, îcar tu dua bike ku pişta neşkestiye.” Ji bin lêvan ve keniyabû û gotineke Ibn Xeldûn anîbû bîra xwe: “Civakên têr-tijî piştî demekê digihêjin têrahiyê û li ser rûyê erdê fisq-fesadê dikin; lewre gundî û şêniyên çolteran dest bi tevgerekê dikin û bajarvaniya wan têk dibin. Paşê ew jî bi domana demê re dikevin rewşa hevrikên xwe yên berê û dîsa li hemberî wan jî şoreş pêk tên ku bi xwe jî ji holê radibin. Bi vî awayî civak desthilatdariyê ji hev werdigirin; hinek zû ji rastiyê werdigerin û hinek jî dereng. Kîjan pir li ser dadweriyê raweste û gelê xwe ji nebaşiyan biparêze, serweriya wî zêdetir dikşîne.”

Xurşîd li Enqereyê jî bi ser ketibû û êvara roja pêncşemê gihiştibû Stenbolê. Cihê şampiyonayê Zanîngeha Stenbolê bû; lewre gera xwe ya li hundirê Sûra Stenbolê hiştibû roja şemiyê ku piştî pêşbaziyê lê bigere. Îcar sibehê în bû û ji gelek welatan beşdar hebûn. Li otêla xwe kombersa xwe vekir, înterneta wê ya bêqablo saz kir û lîstikeke sedrengê ya ser xetê xebitan; lê hevrikê wî gelekî dereng dilîst. Ji ber vê yekê kete şikê ku ev lîstikvan hevrikekî wî yê sibehê be, yan jî mamoste û hîndekarê yekî be; lewre nasnavekî nû yê bi tîpên rûsî ji xwe re çêkir, di malpereke din de kete lîstikeke ser xetê û destekî lîst; hevrikê xwe têk bir. Lêbelê dîsa jî qanî nebû û fikirî ku bi nasnavekî din ê bi tîpên erebî têkeve malpereke din. Her ji çi sedemê be, hindik mabû ku wî têk bibe hevrik ji lîstikê derket û kêfa wî reviya. Derkete balkonê, xêleke xurt li bajêr temaşe kir û dîsa vegeriya jûra xwe. Vê carê bi nasnavekî bi tîpên çînî kete lîstikê; lê diyar bû ku hevrikê wî bi tiştekî re mijûl e û bala wî ne li ser serkeftinê ye. Îcar bi tîpên gurcî, ermenkî, ibranî û hindî ceribandin; dema ku alarma telefona wî lêxist saet yazdehê şevê bû û ev jî dihate wateya razanê.

Sibetirê saet heftan rabû, aveke şîrogermî li xwe kir, taştêyeke sivik xwar û berê xwe da qada lîstikê.

Berêvarê êdî wêneyên Xurşîdî li ser hemû ekran û malperan bû; pêwist nedikir ku qehremanê nû yê sedrengê bi xwe wêneyan pareve bike; lê dîsa jî gelek wêneyên yadigariyê wergirtin.

**Gumgumok û margîse**

Li gorî salixa salixdaran dema ku welatiyên dewleta Komageneyê çûne seyranê, cenabê Brahîm eleyhiselam pûtên heyama Nemrûtî şkandine û bivirê xwe di stûyê pûtê mezin de hilawestiye. Dema ku welatî vegeriyane ser warên xwe, nihêrîne ku xwedawendokên wan gişt serpelixî ne û tenê yê mezin silamet maye. Lêgerîn û lêkolînek dest pê dike ku gelo kê ev yeka han aniye serê pûtan. Di dawiya dawîn de digihêjin zanyariyekê ku ciwanekî bi navê Brahîm neyarê pûtan e û gazî Xwedayê Cîhanê dike. Hêzên ewlehiya qesra Nemrûtî diçin û wî digirin; hildidine rapirsînê û raporê didin Nemrûtî ku terorîst hatiye girtinê.

Di navbera Brahîm eleyhiselam û Nemrûtî de axaftinek, lecek derbas dibe:

-Li gorî rapora pêşkêşkirî te xwedawend şkandine; ne wisan e?

-Bihîstina ku min bihîstiye, pûtê mezin silamet e û bivirê şkandinê, ango amûra sûc di destê wî de bûye; mineta xwe ji kesî negirtiye û berpirsiyariya tawanê li ser xwe ragirtiye.

-Tu dizanî ku xwedawend heykel in û nikarin tevbigerin; ka bibêje armanca te ya şkandinê çi ye?

-Madem heykel li şûna xwe nalivin, naxwin-venaxwin, ranazin û narîn hûn çima jê re ibadetê dikin?

-Li vî welatî xwedayê mezin û yekane ez im; lê min ew heykel ji bo rêzgirtina xwe danîne. Kê ji wan re hurmetê nîşan bide hesîbanî ji min re ibadet kiriye. Ma tu xwedatiya min nas nakî? Tu li ber min serî rakî û danexwî ez ê sizayekî hêjayî xwedatiya xwe bidim te.

Brahîm eleyhiselam hinekî bi hêrs dibe; lê kîna xwe bi pirsekê derdibe û dibêjê:

-Mafê jiyandin û mirandinê di destê Rebê Alemê de ye; ew kengê bixwaze giyanan dide û distîne.

Nemrût gazî du kolemendan dike, yekî dikuje û yekî jî azad dike û berê xwe dide Brahîm eleyhiselamî û dibêjê:

-Te dît ku min jî yek kuşt û jiyana yekî bexişandê.

Brahîm eleyhiselamî nihêrî ku Nemrût nayê rê û di înkara xwe de har bûye; li ser vê yekê pêşniyareke wiha lê kir:

-Xwedayê min rojê ji rojhilatê hiltîne û li rojavayê jî difirîne; heke tu ji wî bihêztir bî, tu jî ji rohilatê derxîne û roavayê de bibe ava.

Devê Nemrûtî kete hev, ziman aliqî, xwiha sekeratê bi ser re avêt û li şûna xwe qerimî. Paşê Brahîm eleyhiselam ji dîwanê derxist û şande zindanê. Di vê navberê de ji şêwirmendên xwe xwest ku sizayekî wisa ibretî ji Brahîm eleyhiselamî re bibînin ku heta hetayê li ser zar û zimanan bimîne. Gelek pêşniyar hatin; lê pêşniyara gundiyekî ew gelekî kêfxweş kir. Li gorî pêşniyara vî gundiyî cenabê Brahîm eleyhiselam dê bi êgir bihata şewitandin û her kesî dê temaşe bikira.

***

Gelek darên ziwa yên şewateyê hatibûn berhevkirin û Brahîm eleyhiselam bi mencenîqê avêtine navê; lê Xwedê bangî êgir ku wî neşewitîne û li şûna wî agirî gul-sosin hêşîn bûn. Di vê bûyerê de li cîhana ajalan jî liv û tevgereke balkêş hebû. Gumgumokê aliyê Nemrûtî digirt û pifî êgir dikir û Margîseyê jî aliyê Brahîm eleyhiselam digirt û bi devê xwe yê biçûçik av li êgir direşand. Gumgumokê ji Margîseyê pirsî:

-Ajala Xwedê, tu bi vî devê xwe yê biçûk avê dikşînî ser vî agirê geşbûyî; ka bibêje armanca te çi ye?

Margîseyê ava devê dîsa rijande ser êgir û jê pirsî:

Ajala Xwedê, tu jî bi devê xwe yê biçûk pifî vî agirê geş dikî, bibêje ka mebesta te çi ye?

Dema ku Gumgumokê got ku bila dijminatiya wê xuya û eşkere bibe, Margîseyê jî bersiv dayê.

-Madem ku tu bi ser xatirê vî kalê han ê kurkure agirê ji bo şewitandina pêxemberê Xwedê geş dikî, dixwazî avkêşana min asteng bikî û dibêjî bila dijminatiya min xuya û eşkere bibe; wisan e ez ê ji berê zêdetir hewl bidim ku avê bikêşim ser vî agirî; da ku Xwedê di deftera min a qenciyan

de tomar bike û navê min jî têkeve lîsteya alîgirên Brahîm eleyhiselamî.

Dema ku çîrok qediya yekî ji çîrokbêjî pirsî:

-Apê hêja dibêjin ku Brahîm eleyhiselam jî Nemrût jî kurd bûne, heta ew gundî jî destyarekî Nemrûtî yî gundî bûye; lê ne ji xanedana qesrê bûye. Gelo ev zanyarî rast in?

Çîrokbêjî milê xwe hinekî rakirin, bi wateya “ez çi dizanim qijikê Xwedê” tevgerek nîşan da û li ciwanekî jê re digotin Şêx Google nihêrî, çav kire xwediyê pirsê ku ji w bipirse. Dema ku xwediyê pirsê berê xwe dayê û pirsa xwe jê re dubare kir, Şêx Google bi devekî ken û rûyekî cidî got:

-Belê qismen rast in. Li gorî riwayeta ku Şêx Şeftalî di tefsîra Quranê de gotiye ev agehî rast e. Îcar hûn dizanin mirov çima Brahîm eleyhiselam bi êgir hatiye sizakirin?

Gundiyekî li cimaetê rûniştî ku bi bejn-bala xwe ya dirêj wekî sipingdarekê li jor ve li xelqê dinêrî bersiv da:

-Agir amûreke leşkerî ye: pêşiyê êgir berdidin konên leşkerên dijmin, paşê berdidine depoyên xurekên wan; pişt re navgîn û alavan dişewitînin û di dawiyê de jî embar, çek û cebilxaneyan.

Kalemêrekî ku li cimaetê guhdarî dikir, rûyê xwe yê pîr û qerçûmekî xwirand û jê pirsî:

-Ma ji bo şewatê bingehek, bihaneyek pêwista nake? Gelo kîjan amûr û heyam ji bo agirekî geş pêwist in?

Gundiyî jixweberê got:

-Helbet ji bo şewatê demine guncaw hene, mîna gava ba hebe an jî erd ziwa be. Ma ji bo agirberdanê pêwist e ku bibêjim heste an jî kirbûtek têrê dike?

Kalemêrî dîsa bi dek û dolebeke ku şik kire hundirê gundiyî pirsî:

-Dibe ku tu ji leşkeriyê rind hîn bûyî, gava meriv êgir berdide koka dijmin divê çi bê kirin?

Gundiyî fêm kir ku ev pirs ne badilhewa ne; lê eynî xwe neanî û wekî ku tiştek nebûye bersiv da:

-Dema şewat li kampa dijminî dest pê kir divê mirov tavilê ji derve ve êriş bikê; lê heke bi şewatê re artêşa dijminî aram be, wê hingê divê meriv êriş nekê, raweste. Dema şewat belav bibe, heke mumkin be, divê meriv bikê. Heke meriv bikaribe ji derve ve êgir berde kampê, divê li bendî şewata li nav biryargehê nemîne. Divê meriv hertim li bendî dema minasib be ku bikaribe êgir berdê.

-Wisan e, divê heyama bayê xurt agir bê berdanê; herwiha divê li aliyê êgir nesekine û derbasî aliyê bayî be. Îcar bayên şevê demkurt in û yên nava rojê demdirêj in; herwiha agirberdana şevê hêsan e û ya rojê xeternak e? Di vê mijarê de fikra te çi ye?

Gundiyî wisa bawer kir ku kalemêr bi dilsaxî pirsan jê dike; lewre mijara agirberdanê hinekê rave kir:

-Divê artêş bizanibe ku pênc cure êrişên şewatê hene û li gorî wê yekê hesabê xwe bike. Kesê ku êgir wekî amûreke êrişê bi kar tîne şareza ye; herwiha kesê ku dikare êgir bi avê dadimirîne jî pispor û xurt e. Ji ber ku di şewatê de agir dijmin e û av dikare pêşiyê li dijminî bistîne; lê gava agir bi merivan bikeve agir êgir nakuje, tenê av dikare êgir bikuje.

Kalemêrî dil kir û armanca xwe ya ji van pirs û şîroveyan hêdî hêdî derxe derve:

-Kesê şer kiriye û bi ser ketî ye, piştî êrişê xenîmet bi dest xistiye, divê xelatan bide leşkerên xwe. Heke wisan neke dê bextewar nebe; herwiha pêşketin û serfiraziya wî jî dê domdar nebe. Loma tê gotin: Mîrê şareza rewşê amade dike; lê fermandarê şareza derhata dewletê zêde dike. Gava di karekî leşkerî de qezenc tunebe leşker tev nagere; qezenc bi xwe re liv û tevgerê tîne; jixwe xetere-bela tunebe şer nabe. Çênabe mîr ji ber hêrsbûnê artêşê seferber bike; herwiha ne durist e ku qurebûna rêberên leşkerî bibe sedema şerekî.

Gundiyî nizanibû kalemêr dê gotina xwe bigihîne kê derê; lewre li ser gotina wî temam kir:

-Bi faydeyê re lihevkirî be, mirov tevdigere; heke na mirov xwe radigire û jê difizire. Apo te got hêrs, îcar hate bîra min. Hêrs tiştekî wisan e ku dikare rewşê veguheze bextewariyê; herwiha tûrebûn û qurebûn tiştekî wisan e ku dikare rewşê biguhêze kêfxweşiyê jî; lê welatekî jidestçûyî û kesên mirî nayêne vejandin. Mîrê zana divê baldar be, serfermandarê artêşekê divê hertim di

amadebaşiyê de be. Rêbaza welatekî aram û aştbûyî ev e.

Kalemêrê ku keysa lêxistinê dîtibû berê xwe da gundiyê kone û dengê xwe bilind kir:

-Te rast got, de ka bibêje, ew kesên ku di şerê Agiriyê de hatin kuştin, ew welat û serweriya kurdan a ku li qûntara her du çiyayan hate çalkirin dê bê vejandin?

-Nexêr apo, ne mumkin e, -got Hamoyê Têmir û xwest ku bi bihaneya destnimêj girtinê rabe û here-. Lê kalemêrî dizanibû ku destnimêj bihane ye; ew dê bireve û xwe ji pirsan rizgar bike; lewre bi lez pirsî:

-Kalikê te da pêşiya Salih Paşayê romî, ji aliyê Qoziliyê re derbasî pişta kirê Agiriyê kir û kurd qir kirin; serweriya wan li qûntara çiyayî çal kir, jin û zarên wan kirin malê xenîmetê. De bibêje Salih Paşayî çi xelat da kalikê te yî gorbigor?

Hamoyê Têmir ziman di dêv de bû kulav, serê xwe berjêr kir, kelogirî bû; lê kalemêrî pirseke din jî jê kir:

-Salih Paşayî rêx neda kalikê te, lê bavê te kir misîngirê xwe; gava diçû destavê bavê te jî misîn jê re dibir. Paşê tu jî rabûyî bûyî xedeme, te nêzîkî sî-çil salî gûyê karmendên dewletê paqij kir û teqawid bûyî. Îcar taximek kinc li xwe kiriye, bêhneke xweş li xwe reşandiye û hatiyî nav camêran.

Gundiyî lavayî li kalemêrî kir:

-Apo rûyê min li ber piyê te be, şermê nede serê min belengazî. Îcar ez dikarim çi bikim? Ma ez kalikê xwe ji gorê derxim, yan ji bavê xwe yî mirî pirsan bikim? Tu çi ji min belengazî dixwazî?

-Tenê tiştekî ji te dixwazim: li nava cimaetan rûnene û mîna camêran neaxive. Vegere gundê xwe û heta mirinê ji bav û kalikê xwe re bide çêran. Şîretê li zarokên xwe jî bike ew jî bidin ser şopa te û dijûnan li pey wan rêz bikin.

Hamoyê Têmir bi erdê ve bû qerqeşûn û nikaribû bilipitiya û kalemêrî got:

-Te digot ku destnimêja te teng e, de here û cardin venegere.

Hamo rabû piyan, bê silav û xatirxwestin ji cimaetê qetiya. Cimaeta hazir piştî çûyîna wî matmayî li kalemêrî nihêrîn û tiştek negotin. Ma dê çi bigotana li hemberî vê gotina rast, durist û wêrek?

Rûniştî êpecekê bêdeng man û piştî kurtepistan dîsa axaftinek dest pê bû. Ciwanekî ji Şêx Google pirsî:

-Hinek dibêjin ku navê Nemrûtî bi rastî “nemir” bûye. Gelo ev yeka han rast e?

Şêx Google ku mîna Mele Nasredîn bersivên wî amade bûn bi şîroveyeke bersiv da:

-Na, ne rast e bi min. Ji ber ku çavkaniyên ereban ên kevn dibêjin “Nîmrûz”. Dibe ku ji Newrozê hatibe yan jî ji Nîvrojê. “Nîm” di kurdiya kevn û farsî de nîv e. Îcar pirsa vê derê ev e: Dema ku Nemrût kurd be, Brahîm eleyhiselam jî kurd e.

Yekî ji cimaetê kete nava axaftinê û tenê got:

-Wisan e, Mihemed eleyhiselam jî kurdekî di nava ereban de bişaftî ye.

Şêx Google serê xwe wekî “na” hejand û got:

-Quran dibêje “pêxemberê erebî” kutabû û çû. Wisan e gelek hezar sal derbas bin mirov nikare reha teze li ser dara kevn bihesibîne. Gava meriv vê gotina te qebûl bike du şaşî peyda dibin: Yek, wisan e Nûh eleyhiselm jî kurd e û em kurd bavê mirovahiyê ne. Didu, ev gelên niha heyî divê bi navê wan ê hevdem neyên gazîkirin; ji ber ku koka wan digihêje bavên kevntir.

Piştî çend deqeyan banga nimêja berêvarê hate dayîn; ê ku destnimêja wî tunebû beziya destnimêjê û yê ku destnimêja wî hebû amadehiya sinetan kir. Di vê navberê de ciwanekî ku şerm dikir pirsan bike ji ciwanekî li kêleka xwe pirsî:

-Çima ji vî re dibêjin Şêx Google û ew Şêx Şeftaliyê ku qala wî kir kî ye?

Ciwan keniya û got:

-Ka em herine sefa pêşîn, nimêja xwe ya sinet bikin. Mesele hinekî tevlihevî ye, tu dê hîn bibî Xwedê mezin e.

Ciwanî bi israr dîsa jê pirsî û muxatabê wî got:

-Temam, piştî nimêjê.

Qamet hate xwendin û nimêja ferz hate edakirin; tesbîhat jî hate xwendin û cimaet êdî belav bû. Ciwanê ku soz dabû mijarê şîrove bike li benda hevalê xwe bû. Bi dest kujiyekî mizgeftê nîşan da ku rûnin. Dema ku her du ciwan rûniştin axaftinê dest pê kir:

-Ew kesê jê re dibêjin Şêx Google gelekî înternetê bi kar tîne û hemû çavkaniyên axaftina xwe ji wir peyda dike. Gava hinek jê dipirsin ku li ber destê kê xwendiye bersiva wî amade ye: “Şêx Google”. Lewre milet jê re wisa dibêje. Îcar mijara Şêx Şeftalî jî wiha ye: Şêxekî romiyan heye ku navê wî Bûrsewî ye, ango xelqê Bûrsayê ye. Vî şêxî di tefsîra xwe de nivîsiye ku kurdekî li Nemrûtî nîşan daye ku Brahîm eleyhiselam bi mencenîqê biavêjin êgir; paşê gelek tiştên nebaş derheqa miletê kurd de gotiye. Gotiye ji erdê wan re derbas nebin, jinan nedin wan û ji wan jinan neyînin; bi qencê wan re jî hevaltiyê nekin û her tim kîn-buxzê li dijî kurdan biajon. Ji ber ku li Bûrsayê şeftalî digihêjin Şêx Google jê re dibêje Şêx Şeftalî.

-Îcar şeftalî tê wateya nêremokan jî.

-Rast e, lêbelê Şêx Google ji nijadperestiya wî nefret dike û ew nav lê kiriye.

-Wisan e nijadperestiya tirkan ji wî dest pê kiriye; xwezila romiyan xebera wî bikirana dev ji me berdana, ji erdê me re derbas bûna û bi herî qencê me re jî hevaltî nekirana; bi rastî Xwedê ew ji ser me biqirandana, em li mala xwe û ew li mala xwe.

Ciwanê ku bersiva pirsa xwe hildabû gelekî kêfxweş bû. Ji ber ku rastî cimaeteke xweş hatibû, danê nîvro heta nimêja berêvarê li mizgeftê diaxivîn û piştî nimêjê asoya beşdaran vedibû; lê jiyana kar nedihîşt ku her roj beşdarî van suhbetên rind bibe. Lewre bi hesretekê ber bi kargeha xwe meşiya; lê hişê wî di wan mijarên rengrengî, xwezayî, merdane û durist ve aliqî mabû.

**Koremişk**

Cangîr li xozana xwe dinêrî û navkutî dibû. Kurê xwedî mirê koremişkan xozan kêrtkêrtî kiribûn û nedihîştin ku bibe mêrg. Li dora her kunê bi qasî nasirgeyek xwelî diavêtin derve, serê xwe mîna kundê şevê derdixistin derve, li doraliyê dinêrîn û dîsa diketin hundir. Te dinihêrî kormeşkek ji wî serî baz dide wî serî û dikeve kunekê; te digot gişt bi hev re peymandar in û qet li hev naxin, hev nagirin, ji hev naxeyidin û rikeberiya hev nakin. Na, carinan li hev jî dixistin, li nava xozanê mîna du kangurûyan radibûne şek, hev didane ber gezan û xwîn bi ser hev de berdidan; lê dîsa jî dev ji pîşeyê xwe yê kunvedanê, erdkolanê û zevîxerakirinê bernedidan.

Rojekê êşê da serê Cangîr, çû bajêr, bi pereyekî giran bi qasî du-sê kîloyan DDT kirî, ser êvarê vegerî gund û wê şevê bi sondesond raza ku sibehê qira wan dayne. Bi banga melayê sibehê re rabû, destnimêjek girt, nimêja xwe kir û bi dua-lavahiyan ji Xwedê xwest binaşeya van koremişkan biqelîne ku rizqê zarokan bi ro de berdidin.

Piştî nimêjê xuriniyeke wisa sivik ku ji sê hopan derbas nebû kir, cixareyek pêxist û torbikê dermên hilda, de gidiyo bazde. Dema ku xwe gihande ber serê xozanê hê tarîban venekişiyabû; te digot koremişk hê derneketine xurînî yan jî taştiyê. Bi leza bayê şerq û xerbê lepikên plastîk kirine destên xwe, bere bere yek kevçî DDT berda devê qulikan û bi zerekiyên tavê re tevahiya kunan derman kir. Paşê derbasî devê newalê bû, lepik derxistin, bêrek li erdê xist, lepik li erdê vedayî çal kirin, destên xwe û kevçî bi heriyê şûştin û derkete ser qûçekî nava zeviyê.

Li ser qûçî cixareyek pêxist, bû kuxtekuxta wî û belxema xwe avête derve, carekê diduyan jî tû kir. Piştî vê kuxikê hinekî tirsiya û fikirî ku jehrdadayî bûbe; lewre vegeriya malê, tasek şîr vexwar û jinikê re got ku hay jê hebe, ew dê hinekî serê xwe dayne.

Nêzikî nîvro ji xewê rabû, taştiyeke xurt xwar, bêr da ser milê xwe û çû nava xozanê. Li serê xozanê kêliyekî sekinî, hêvî kir ku liv-tevgera koremişkan êdî nebîne; lê şaş bû dîsa çend koremişk ji wî aliyî bazdidane wî aliyî, tu dibêjî DDT neketibû kunan û ardê gênim rijiyabûyê. Bi mereqeke nedîtî çû ser devê kunan, nihêrî ku malmîratê koremişkan derman bêhn kirine, paşê xwelî avêtine ser û dîsa jiyana xwe ya rojane domandine.

Agirê heqê dermên û zehmetê wî serî lê şewitand, vegeriya malê du vîdonên mezin hildan, çû bajêr, tijî benzîn kir û berêvarê vegeriya gund. Dîsa bi sondesond raza, bi berbangê re rabû, piştî nimêjê taştiyeke xurt xwar û bi vekişîna tarîbanê re vîdonên bênzînê li hespê kirin, berê xwe da xozanê.

Dema ku gihişte ber serê xozanê hesp tewiland, bi inteint her du vîdon peya kirin, bêhnekê sekinî û cixareyek kişand. Paşê fenanî gurekî har rahişte vîdonan yek şerbik berda devê kunan, agir berdayê û bêr di dêst de li ser re sekinî ku koremişkek derkeve, ew jî bi bêran ser-guhan bimerisîne. Belê zîwezîwek di hundirê kunan de pêk dihat; lê piştî hewariyekê te digot pergala agirkujiyê dixebitî û deng diqiriyan. Gelo koremişk gişt di hundir de ji heşî bûn an jî şewitîbûn? Na, nexêr, tiştekî wisa jî nebû. Malmîratê koremişkan tivdîra wê jî girtibûn; bi rastî ji bo baran û avê tivdîreke sosret girtibûn. Kun hinekî nizim dibirin, paşê biqasî bihustekê çalek vedidan, di dawiyê de dîsa ber bi hevraz dikolan û lanên xwe çêdikirin. Gava malbat giran bûya tivdîrên bêhtir dihatine girtin.

Cangîr piştî kutakirina bênzînê û negirtina koremişkan, bi baldarî kunek veda û ev yeka han dît; her çiqas hebek du heb wisa kuştin jî dilê wî rehet nebû, ne mumkin bû tevahiya zeviyê kun bi kun bikole; lewre divê li çareyeke din bigeriya. Di wê tasewasê de hate ber hespê, tewil rakir, gem avête dêv, milekî xwe ji nava gemê re derbas kir û vîdon bi terkiyê ve girêdan. Bi qasî sed mêtroyî hesp destkêş kir û cixareya wî ya sotandî qediya. Ji ber ku bêr di dêst de bû hesp disilikî û rê nedidayê lê siwar bibe; lewre hate ber kevirekî û xirp bazda ser, qemçikek rakişandê û ber bi malê bezand.

Devî devî nîvro dikir ku Cangîr gihişte nava gund ku dengê Apê Elî dihate bihîstin:

-Kuro kotanê Eysa pêxember li koka we bikeve, hûn çima ketine bêx? We xwar û di ber xwe

de kir zeherman, îcar hûn çima çiqilan dişkênin? Weylê jehra marê serzer li ber we ketî!
Bû terpeterpa piyên zarokan û ber bi devê çêm reviyan û wê nifirê lampeyeke gelêrî di hişê wî de pêxist: Kotanê Eysa pêxember.

Bi sondesond û kerba pisîka têjika xwe xwarî li benda roja înê ma ku li mizgeftê danezanekê li nava gund belav bike. Pereyê DDTyê, bênzînê, rêpiya çûyîn-hatina bajêr, mesrefa li bajêr, sê-çar rojên beytu çûyî... gişt ji bêrîka wî çûbûn; lê roja înê hat, ew îna ku bêsebr li bendê bû hat û çirkeçirka diranên wî ya ji kerban nesekinî. Piştî nimêja xutbeyê, bi dengekî bilind di nava cimaetê axivî, wekî kelogirî bibe tika-lavayî li dost-pismaman kir ku sibehê kûçikan bidine dû zarokên xwe û bişînine ber xozana wî ya li bestê. Herwiha soz da ku ji zarokan re hinek totik-motikan bistîne û zikê kûçikan jî bi koremişkan têr bike. Gundiyan jê pirsîn ku xêr e, mesele çi ye? Bersiveke kurt da û xatir xwest:

-Êdî bûye meseleya namûsê birano, min nêzikî sed-sed pêncî panotî mesref lê kir nebû tu tiştî. Sibêhê ez ê kotanê Eysa pêxember berdime kokê.

Vegeriya malê, kincên xwe yên axatiyê ji xwe xistin, firavînek xar, kincên xwe yên rêncberiyê li xwe kirin û berê xwe da mala xwediyê traktorê. Hêvî jê kir ku sibehê were ber serê xozana wî; lê xwediyê traktorê got ku sozê wî ji yekî re heye. Li ser vê yekê telefona xwe derxist, li xwediyê daxwazê geriya, meseleya xwe jê re got û lê zêde kir:

-Şemsî ez qurban, min gazî zarokan kiriye ku sibê bi kûçikan werin ber serê xozanê. Hem bila dilên wan ji min nemîne, qedrê mezinan neşkê hem jî rojên din dibistan heye ku zarok dê neyên. Bla gedeyê te jî kûçik, dêlik û tûleyên xwe hilde-were, ez ê dilê wî ji giştan zêdetir şa bikim.

Şemsî pê keniya û pejirand ku dorê bide wî.

Sibetirê nêzikî saet nehan zarok digel kûçikên xwe li ber serê xozanê amade bûn; Cangîr destê xwe ji çavên xwe re kir sih û li aliyê gund nihêrî, deng-hes ji gund tunebû. Cixareyek sotand û zarokan re got:

-Segan berdine qulikan bila hinekî bînê hilkin, heta ku traktor hat.

Piştî deh-panzdeh deqeyan bû kurekura motorê, Cangîr dîsa destê xwe şewqekî da ser çavên xwe û li aliyê dêng nihêrî, traktor dihat. Binikê cixareyê avête erdê, pêpest kir û berê xwe da zarokan:

-A niha dilê kûçikan dê rihet bibe.

Zarokekî ku ji giştan mezintir e keniya û got:

-Apê Cangîr bi texmîna min hema dilê te dê zêdetir rihet bibe; ev çend roj in keribiyî.

-Erê welleh xorto, keribîme û çawa jî keribîme, -got û ber bi aliyekî xozanê çû-.

Dema ku traktor gihişte hindê nerazîbûnek û bêsebriyek nîşan da:

-Mal ava, kûçikan hev du xwarin û bi ser de diranên min hev du xwarin; min got Xwedê neke tiştek hatibe serê motorê, filan-bêvan.

-Na heyran, kul dê li motorê bixe; ez îşev hinekî dereng razam û dereng jî rabûm.

-De ez qurbana te û traktorê bibim; gîsn rind daxîne erdê.

-Welleh gava gîsn lap daxim zor bi motorê dikeve û biha jî radibe.

-Bila rabe, em ê panotekî zêde bidin.

Traktor kete nava xozanê, gîsn lap daxist û dest bi şovê kir. Piştî gerek diduyan koremişkan digel têjikan dest bi revê kir, kûçikan ji aliyekî ve û meriyan ji aliyekî ve bi şiv, bêr û pehînan ketine nava mişkan. Cangîr qêriya ser zarokan:

-Nehêlin bila kûçik mişkan nexwin, gava têr bixwin dê êdî negirin, ez ê paşê para wan bidim, -got û beşereke xweş hate rûyan.

Xwediyê traktorê gava nêzikî kunekê dibû gîsn heta dawiyê dadixist û hawara komkujiyê dixiste nava koremişkan. Di navbera du saetan de hemû kunên koremişkan hatine hatine vedan, hêlîn li wan hate talankirin û bûne xurê kûçikan. Îcar bi şeneyê koremişk kom kirin, ji hev cihê bi qasî hejmara kûçikan qûç çêkirin, gote zarokan:

-De bila noşî canê wan be.

Zarokan li wî û wî li zarokan nihêrî, zarokê ji giştan mezintir got:

-Lê apo em, ka para me?

-Apê we qe we ji bîr dike, -Cangîrî got û serê wan pênc panotek dayê ku ji bo zarokên gundî

ev pereyekî gelekî biqîmet bû-.

Destê xwe ji xwediyê traktorê re hejand ku “were” û mêrikî heta hindê hat, motor rawestand:

-Xêr e apê Cangîr, çi bû?

-Ez heyrana te û motorê bim, niha têkeve ser xeta pêşîn, bi gîsnê şovan serdanpê xozanê rake, tapanekî ser bixe û were ber derê apê xwe. Bi Xwedê ez ê xwarineke xweş pismamê xwe re amade bikim, pereyê wî bidimê, ew sax û ez û xozan silamet.

***

Êvarê Cangîr li ber televîzyonê rûniştî ji xew re çûye û jinikê betaniyek avêtiye ser. Nîvê şevê bi xwe hesiyaye, derketiye destavê, nimêja xwe ya şevê û yeka şukrê jî kiriye, çûye ser nivîna xwe û paşê razaye.

Sibetirê bi kêfeke mezin cil û bergên xwe yên axatiyê li xwe kirine; derketiye ser kêrtê li fêza malê, li xozana xwelîsor nihêriye, hemda Xwedê re şukr kiriye û çûye bajêr.

De bajar e; siyaset, hilbijartin, bazirganî, rêveberî, geştyarî, nizanim çi quzilqurt gişt li ba hev in. Tirsa kesî ji koremişkan tuneye, kesekî Cangîr behsa “komkujiya koremişkan” jê re bike jî tuneye. Çavê xwe li gundiyekî xwe gerand ku wî kesî bide rûniştandin, qala serpêhatiya xwe bike; lê hate bîrê ku ji gund heta bajêr serê milet kiriye dew û êdî şerm e ku careke din vê mijarê veke.

A baş ew bû ku Cangîr heta nîvro ji xwe re li qehweyan rûne, dost-nasan bibîne û kel-melên xwe amade bike, dayne dikaneke nasekî xwe û li benda çûyîna erebeya gund bisekine. Serê sibehê li qehweyek rûnişt, çayek jê re hat ku bala xwe da nûçeyên saet nehên sibehê. Di nûçeyan de qaneleke kurdan rexneyeke analîstekî kurd li ser daxuyaniyên berpirseke welatekî biyanî pêşkêş dikir. Li gorî nûçeyê serokwezîrê tevahiya kurdan dikire tayekî teraziyê û bi terorîstiyê tawanbar dikir. Cangîrê gundî bi hişê xwe yê gundîtiyê di dilê xwe de got: “Xwedê bizanibe welatê te çi bertîl girtiye ku tu van daxuyaniyan didî. Her kes destê mezinan radimûse û heke kurdan bêrika te tijî bikira te dê heft teqle biavêtana teresa me ya teresbav”. Paşê rabû heqê çayê da û hinekî geriya, çend kes dîtin û xwarina nîvro xwar. Piştî xwarinê nimêja xwe ya nîvro kirî, hinek mêwe-sewze û pêwistiyên din ên malê da hev.

Berêvarê erebeya gund bi rê diket; lewre Cangîr kel-melê xwe bire ber erebeyê ku mamosteyê gund jî tê de bû. Eşyayê xwe avête barxaca erebeyê, silav û rûnişt; nihêrî ku milet komkujiya wî ya koremişkan kiriye benîşt û dicû, mamoste jî bi milet re dikene. Mamoste got Cangîr:

-Apê Cangîr dibêjin te mala dijminên xozanê çol kiriye, ne wisan?

-Erê welleh, hema wisa; lê bi zehmet û bihayekî giran. Hişê kurmênc di dawiyê de tê sêrî; heke Apê Elî nifir li zarokan nekira û negota “kotanê Eysa pêxember lo koka we bikeve” ev çareserî nedihate ber hişê min.

Mamosteyê ertûşî ku wê salê hatibû gundê wan bi kurmanciyeke fesîh jê re got û li dora xwe nihêrî:

-De hesab bike ku xozana te welatê me ye; îcar koremişk çiqasî ziyanê didinê. Ji bilî ziyanê çiqas mesref li van koremişkan tê kirin ku ziyanê bidine welêt. Wekî ku mirov zîloyan berde laşê xwe.

Cangîrî derfeteke axaftinê dît ku ji vê sibehê neaxivîbû:

-Belê mamoste, mesrefa seferberiya sed hezar sîxurî û rêkirina wan a ji bo hezar kîlomêtroyî yan jî zêdetir hem seba xelqê hem jî seba dewletê rojane hezar zêrî dike. Li paytextê û derveyî wê ev tişt dibe sebebê qirqilînê. Heft sed hezar malbat ji debara xwe bêpar dimînin.

Merivekî bi ken gote rûniştiyan:

-Cangîr qîma xwe bi dolar û euroyan nayîne, çav berdaye zêrê zer. Ew jî dizane doxîna lîreyî sist bûye.

Milet êpecekî keniya û Cangîrî gotina xwe berdewam kir:

-Mirov bi salan xwe amade dike ku roja şer û aştiyê serfiraz be. Heke mirov ji bo agahdariyên derheqê dijminî de xwe ji mesrefê bide aliyekî ev tiştekî ne mirovane ye. Yekî wisa ne rêberê xelqê ye, bi kêrî dewletê nayê û serfiraz jî nabe. Welleh min duh rêbertiyeke xweş ji malbata xwe re kir; çareseriya herî bikêrhatî bi kar anî. Ji berê ve em dibihîzin: a ku ji bo rêvebirên şareza û serfermendarekî jîr serfiraziyên nedîtî amade dike, pêşagahdarî ne.

Mamoste gelekî ji nirxandina wî hez kir; nihêrî ku mijara ziyana koremişkan û jiyana roojane baş bi hev ve girêdide. Lewre xwest ku vê axaftinê nebire û geş bike:

-Mirov bi rêya xeyalet û ruhan, an jî bi berawirdkirin û hesabê, nikare îstîxbarat wergire apê Cangîr; lê mirov dikare ji kesên ku rewşa dijminî nas dike îstîxbaratê wergire. Te ji Apê Eliyî ew gotin nebihîsta te yê bîr nebira kotanê Eysa pêxember.

Cangîr bi bihîstina peyva “îstixbarat”ê hinekî veciniqî; ji ber ku heta niha derheqa rê û rêbazên îstixbarata kurdan de tiştek nebihîstibû û nizanibû kîjan saziya kurdan bi vî karî radibe. Lewre dengê xwe birî û mijara îstixbaratê û sîxuran di hişê xwe de gerand: “Gelek cureyên sîxuran hene: sîxurên deverî, sîxurên hundirîn, sîxurên dualî, sîxurên mirî û yên zindî. Îcar gava ev her pênc sîxur gişk jî li ser kar bin kes êdî nikare metodrê û rêbaza wan bizanibe; ji serokê dewletê re dibin xêra Xwedê û karine nedîtî dikarin bikin ku ruhê kesî pê nahese. Wan rojên han mijara sîxurên dualî parzemîna ewropayê û Rûsya rakirine qirika hev.” Piştî kêliyeke nirxandina hundirîn, Cangîr ji nişkê ve pirsî:

-Mamoste, te behsa îstixbaratê kir, ew sîxurên dualî yên ingilîz-rûs çawa bûn?

Mamoste jî bi bihîstina peyva “sîxur”ê veciniqî; lê wekî ku jê nesilikîbe û bêyî ku vê tirsa xwe nîşan bide bersiv da:

-Sîxurên xelqê parzemînan kerkerî dikin, dewletan ava dikin û hildiweşînin û yên kurdan heys-behs jê tune. Mal ava, ew sîxur dualî ne û ewqas qirevir li ser çêdibe; de êdî tu hesab bike ku ew sîxurên ku tenê Xwedê bîs-raza wan dizane çi dikin? Di vê navberê de vê yekê jî bibêjim ku sîxurên deverî hene ji nav xelqê deverekê tên bijartin û yên hundirîn hene ji nav karmendên dijminî tên têkûzkirin. Îcar yên dualî yên çawa ne gelo? Bi texmîna min ew jî ji sîxurên dijminî bi xwe têne peydekirin; lewma ewqas olan dide. De ji berê ve gotine: “Dizan ji dizan dizî, erd-esman lerizî”

Kambaxa mijara sîxuran û sîxuriyê tiştekî wisan e ku hem hundirê merivan dikoje hem jî hişê merivan. Carinan tu dinihêrî ji tirsa sîxur û qerawilan mirov newêre her ser destavê jî; di navrana xwe de berdan beraqiltir xuya dike. Helbet ev rewş ji bo welat û deverên sitemkar wisan e û ji bo welatên pêşketî sîxur dikevine tayê mirinê gava derdikevine ser kar.

Cangîrî û rêwiyên din carinan bi kurtepistan carinan bi dengekî nizim diaxivîn. Ji rêza paşîn a mînîbusê yekî ji hevalê xwe re digot:

-Kuro hinek sîxurên mirî hene ku Xwedê hifza mirovî ji wan bike; agahdariyên çewt didin sîxurên dijminî, tevgerên serhildêr bi zanyariyên şaş didine meşandin.

Muxatabê wî jî xeleqek li ser zincîra agehiyên wî ve dikir û digot:

-Her çi sîxurên zindî ne, ew jî bobelata Xwedê ne; agahdariyên ewqasî girîng berhev dikin ku ji bombeya hîdrojenê xurttir in. Loma di nav artêşan de ji sîxuran bêhtir bi kesî re miamele nayê kirin. Tu kes bi qasî wan xelatan wernagire. Tu kar ji karê sîxuriyê veşartîtir nîn e.

Ajovanê mînîbusê gelekî bêdeng bû, bala wî li pêşiya wî û guhên wî li axaftinan bûn. Cangîr ji vê tevgera wî acizbûyî dixwest tiştekî bibêje û ji xwe re got: “Divê meriv nekeve gunehên xelqê, her kes ji bo rizqê zar-zêçê xwe dixebite; ev mijareke wisan e ku ziravê merivan diqetîne. Dibe ku mêrikî mafdar be ku jê naaxive; ne serê xwe diêşîne ne jî bendan didê û girêdide.”

Mamosteyî ji bo dil xweşkirinê bi dengekî hinekî bilind got:

-Gelî rêwiyan kesên nefehma û nezan, kesên nehestiyar û ji hîsên zirav bêpar nikarin sîxuran bi kar bînin. Bê dek û dolaban mirov nikare rastiyê hîn bibe. Ev babeteke girîng e; sîxur li hemî deveran agahdariyên girîng peyda dikin, destên wan dirêj in, tor ên wan mezin in, piştên wan arxayîn e.

Zarokekî çardeh-panzdeh salî jî di erebeyê de bû ku bê axaftin guhên wî li ser tevahiya axaftinan bû; çi mijareke efsûnî bû ji bo wî hey gidî! Fîlmên sîxuriyê yên amerîkî-rûsî anîne bîra xwe: gava  planek beriya bicihanînê eşkere bibûya, saziya şopandinê sîxur û kesên bihîstî, weşandî,

navbeynkar gişt dikuştin. Ji ber ku kes nizane êdî kîjanî xayîntî kiriye û gişt dikevin qirika hev; li pey hev digerin û qira hev datînin. Îcar hinek welatên xwe diguherînin, heta hinek reng-rûçikên xwe diguherînin.

Helbet li welatên sitemkar sîxurî bi şewazên gelekî qirêj tên meşandin; tê de mafên mirovan, mafê jiyana azad, mafên malbatî û kesane tên binpêkirin; lêbelê li welatên şefaf û pêşketî ev pîşeyekî gelekî bi rûmet û bi exlaq e. Sîxur tenê li pey nebaşiyê dikeve, di nava lêgerîna xwe de qanûnan binpê nake, welatiyan ji belayan diparêze; bi rastî dibe ku sîxur mirovên herî biexlaq ên civakê ne ku bi zanyarî û hestyariya xwe nebaşî, xetere, çewtî û dijminahiyan hê di pêş de hildikin; wan asteng dikin, wekî xeneqûtkekê dikin gewriya dijminên welatekî.

Kalekî ku guh dida axaftinan, wekî ku ji dewrana dinyayê baş fêm kiribe got:

-Dibêjin dema Îsmet Înonu serokkomar bûye li Gurcîbilaxê bûyerek qewimiye. Hinek dizan biryar daye ku depoyê gumrikê biqelêşin; gazî heval-hogirên xwe kirine, roj-dem diyar kirine. Hevalekî wan î diz ku berê tev dizî kirine wiha gotiye: Kuro, hûn berê xwe nadine mal, gom û tewleya filan-bêvan kesî; hûn berê xwe didine gumrika hevalê Ataturkî, guhên erdê jî hene dibe ku Îsko bibihîze û me bi dar ve bike, yan jî di zindanan de birizîne. Hevalên wî dijinê ku qeleşiyê neke û were em herin; Îsko dê ji hîn bibe, te çima di teşikên xwe de berdaye? Dibêjin ku ev meriv beşdarî vê talanê nebûye û hevalên wî çûne diziyê. Piştî ku gumrikê diqelêşin û bi hev re pareve dikin, gişt tên girtin. Ev merivê beşdarnebûyî rojekê telgrafekê werdigire ku here qereqola Gurcîbilaxê. Radibe, bi tirsetirs diçe wir. Fermandarê qereqolê dibêjê: Serokkomar pê hesiyaye ku te wiha wiha gotiye; ev jî xelata te ye. Dibêjin li gorî wî zemanî xelatek baş dayê. Mêrikî fehm kiriye ku di nav wê şebekeyê de sîxurên Îsmet hebûne.

Muxtarê gund ku heta niha di bin şika sîxuriyê de bû, derfeta axaftinê ji xwe re dît û got:

-Dema bixwazî êrişî saziyeke dewletê yan jî artêşekê bikî, yan dorê li bajarekî bipêçî, yan jî yekî bikujî, divê pêşiyê bizanibî ka fermandarên ku bajêr diparêzin kî ne, cîgirên wan kî ne, serwerên wan kî ne, dergevanên wan kî ne, berdestên wan kî ne. Nexwe divê sîxur van agahdariyan ji te re peyde bikin.

Merivan giştan dengên xwe birîn hev re hev re gotin:

-Muxtar, muxtar guhên erdê û dîwaran hene; qe nebe di bêrikên me de telefonên pêşketî hene. Tu çi dikî? Qala kuştin, girtin û zeftkirinan dikî; tu dibêjî ku li pey xelata dewletê ketiyî?

Muxtêr bi kenekî sosret gote kesên li der û dora xwe:

-Madem qûna we ne qûna vê hêkê ye hûn çima serê xwe diêşînin? Vê sibehê de we ruhê me xwar; ha sîxur ha nizanim Îsmetê kerr. Varikên duhî rabûne û hêkên sor dikin, de were nehele!

Zarokê ku beşdar temaşe dikirin û carekê li devê û carekê li devê ewê han dinêrî hê di nava ramanên xwe de bû: “Divê mirov hinek sîxurên wisa peyda bike ku ji aliyê dijmin ve hatine şandin, xelatê bide wan, ji bo ku bi mirovî re bimînin wan bixapîne. Bi vî awayî mirov dikare wan weke sîxurên dualî bi kar bîne. Bi agahdariyên wan mirov dikare sîxurên li devera xwe û yên li nava xwe diyar bike, agehdariyên ku bi riya wan bi dest bixîne jî bi riya sîxurên mirî ji dijminî re bişîne. Bila sîxurên mirovî jî bi agehdariyên berdest karê xwe bikin. Divê serokê îstixbaratê yan jî fermandar miheqeq van pênc cure sîxuriyan baş bizanibe û bi kar bîne; û ev hemî agehdarî xwe dispêrin sîxurên dualî. Loma divê mirov bi sîxurên dualî re miameleyeke baş bike. Serokê şareza û fermandarê jîr dikare sîxurên herî biaqil bi kar bîne û ji serfiraziya xwe bawer bibe. Ji bo şerekî serkeftî herî zêde jî seba artêşê re gelekî pêwist e.”

Zarok bi rawestina erebeyê, peyabûna rêwiyan û komkirina rêpiyan bi jiyana rastîn hesiya. Çend qurişên ku di bêrika xwe de veşartibûn da ajovanî, çenteyê xwe avête milê xwe, berê xwe da malê û de gidiyo banzde. Zarokî li bajêr di dibistaneke belaş a dewletê de dixwend, sibê heta êvarê dê çawa bibe welatiyekî baş şîretên mamosteyan dibihîst, ezmûn nêzik bûn, ji bo şevekê tenê hatibû malê û divê sibehê dîsa biçûya dibistanê.

Di riya xwe de bi lez û bez gotinên mezinên xwe di ber hişê xwe re derbas dikirin: “gundiyan bi Apê Cangîr dest bi axaftinê kir, tinazeyan derfet da mamoste, mamosteyê gund zanatiya xwe nîşan da, çend gundiyan bi dizîkan qala sîxuriyan kir, kalemêrî qala mijareke sîxuriyê

kir, muxtarê gund dewletparêziya xwe eşkere kir û tevahiya gundiyan ji vê mijarê aciz bûn; lê kesek bi nêrînên min nehesiya, kesî ji min pirsek nekir, kes ji min nekete şikê. Weylê mala we xera bûyî! We qe mezinatiyeke baş ji min re nekir, hinekên mîna we pêşiya me digirin û beriya ku em werin dinyayê hebûna ser rûyê erdê pareve dikin. Peh divê ez bibim siyasetmedar, yan jî parêzer. Na lo dinya xweş e; lê kêfa xwe binêre!"

-Hesen te xêr e lawo? Tu çima êvara înê nehatî û îro hatî ku sibehê divê herî?

-Dayê jina xedemeyê dibistanê miriye, kesî nizanibû sîstemê bixebitîne; hinek çûne malên xwe û hinekan jî gotin em vê hefteyê serê xwe neşon jî dibe; lê min da hişê xwe û hatim.